# LI SER JENOSÎDA KURD: HELEBÇE

*Abdusamet Yîgît*

Weşanên SORAN

.
.
.
.

*Li ser jenosîda kurd: helebçe*
*@Abdusamet yigit*
SORAN-Lêkolîn
.
Belin- 2015
.
email: han-grafik@hotmail.de
.
Çap û Grêdan : Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
.
ISBN 978-3-945956-01-4

.

**LI SER JENOSÎDA KUDAN; HELEBÇÊ**

Dema ku mirov li ser helebçê dihizirê, mirov gelek tiştên ku mirov divê ku werêne ser ziman dibînê. Jenosîda helebçê, ku di nava kurdan de weke ”komkujîya Helebçê” jî tê bi navkirin, komkujiyeka ku bi armanca jenosîdkirina civate kurd rejima demê a baasê ku hanîya serê kurdan a. Ev komkuji, di her salvegerên wê de jî bê, hinek mirovên bi wijdan ku li ser wê dihizirin, dinivîsênin û dihênina rojevê dibê. Ev tenê ji aliyê hizirkirina li ser wê ve ya. Lê weke êşeka ku di mejiyê kurdan de cih û war girtîya, bûya birîneka deronî jî bi hemû kurdan re. Di aslê xwe de, dema ku mirov bi ancamên wê re komkujiya helebçê fahm bikin, emê bi wê re komkujiya zilanê jî û komkujiya dersimê jî ku bi heman armancê hatina hanîn serê civate kurd mirov wê wan jî bi deronîya wan re fahm bike.

Em li vir di serî de divê ku werênina ser ziman ku emê gotina komkujiyê ku hemû kurd bi wê aşîna na û bikardihênin, di wateya ´jenosîdê´ de bikarbênin. Ev jî, sedemeka wê heya. Di serî de em ji bo du sedeman vê yekê emê bikin. Yek, ji ber ku ev komkujî hê di mejî kurdan de pirr giran a û bi gotina ´jenosîdê´ re em wê giranîya wê hê girantir nekin. Sedema din jî, ew a ku kurd, hertimî dema ku wê bi bîr dikin, wê weke navê wê gotina ´tûfana hatî serê kurdan´ û ankû gotina ´komkujiyê´ bikarbênin. Ev jî, ji ber vê yekê û di vê çerçoveyê de emê vê gotinê ji destpêka nivîsê û heta dawiya nivîsê bikarbênin. Her wusa, bi vê lêkolîn û nivîsandina me, armanca me ew a ku bi teorîkî çerçoveya zihniyeta ku bi wê komkujiya helebçê hatîkirin bi hebûna komkujiya helebçê ku hatî serê civate kurd re were fahm kirin. Ev jî, wê weke aliyekî giring bê. Di sedsale 21´ê de ev komkuji hat serê civate kurd. Di dewama wê de piştî wê bi 26 salan re komkujiyên mazin ku di wan de bi deh hezaran kurd hatina qatilkirin ên weke ´komkujiya kobanê´ û ´komkujiya şengalê´ kirin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov hinekî jî li ser vê komkujiyê bi teybetî bisekinê. Emê, hewl bidin ku vê komkujiyê baş fahm bikin. Min, weke di çerçoveya birhanîna vê komkujiyê de di roja ku ev komkuji hat kirin de bidest nivîsandina vê nivîsê li ser jenosîda helebçê kir. Piştre jî, min domand. Min dikarî ku berî roja bûyîna komkujiyê 16´ê adarê binivîsênim û bigihênim. Lê min xwest ku pêşî bi wê deronîya wê ya di wê rojê de dest pê bikin û piştre wê bênima ser ziman. Ya rastî jî ew a ku mirov dema ku tiştekî werêne ser ziman, tenê bi zanînên wê re, her wusa

bi deronîya wê re jî êdî fahm bike û werêne ser ziman. Ev jî, wê tiştekî bi xwe ji me re werêne ser ziman.

Di vê çerçoveyê de divê ku di serî de werênima ser ziman ku komkujiya helebçê, weke bîrînaka ku weke ku ti carî nakewê ya di laşê civate kurd de ya. Her wusa, êşa ji wê, hertimî dihê hîskirin. Tevî ku heta vê sale ku em di wê de ku bi ser 27 sal buhurîna jî, em bi tememî nikarin bibêjim ku birina ji komkujiya helebçê a di mejî û laşê kurdan de kewîya ya. Hê ew bîrîn xwûn ji wê diharikê. Her ku xwûn diharikê jî, bi xwe re hê bêhtirî sor dike û bi xwe re êşê jî maztir dike.

Li vir, ez vê yekê divê ku ez bibêjim ku di serî de ev mijar, weke mijaraka ku li ser wê bi sadan pirtûkên ji aliyê deronî û civaknasiyê ve ku werina nivîsandina. Ev nivîsandina pirtûkên deonîyê, ne ji bo ku weke mijarakê ku ew werê ser ziman. Bo ku ev mijar di serî de were fahmkirin. Çendî ku mejiyê kurd, ew baş fahmkir, wê ewçendî jî bi ser ve herê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov hûr û kûr li ser wê bisekinê.

Komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de dema ku mirov li ser wê dihizirê, divê ku mirov werêne ser ziman ku gelek aliyên wê ku di reşîyê de na, ku divê ku mirov werêne ser ziman hena. Her wusa, bo vê jî, bêgûman, lêkolînna mazin ênn bi sazî pêwîstî bi wan heya ku werina kirin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman û bibêje ku komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de divê ku were nivîsandin û ser ziman. Li vir, divê ku ez vê yekê werênima ser ziman, heta ku mirov çerçoveya pirsgirêka kurd fahm neke, mirov wê nikaribê, tenê komkujiya helebçê jî fahm bike. Divê ku mirov li vir, di serî de werêne ser ziman ku komkujiya helebçê, weke komkujiyeka ku di dewama komkujiya zilanê, komkujiya dersimê, komkujiya mihabadê û hwd de ku hatîya kirin a. Berî komkujiya helebçê, bi dehan komkujiyên mazin ên ku hatina serê civate kurd bûna. Piştî wê jî, bi dehan komkujiyên ku hatina serê civate kurd ên ku bûna hena. Ev hemû jî, di çerçoveyê de di dewamên hevdû de bûna. Komkujiya helebçê, dema ku mirov di vê çerçoveyê de li wê dihizirê, her wusa divê ku mirov werêne ser ziman ku weke komkujiyeka ku di çerçoveya jenosîdkirina civate kurd de ku hatîya kirin a. Piştî wê re jî, pêvajoya jenosîdkirina civate kurd, bi gelek rêbazên ku rejimên herêmê kifşkiirna re hatîya dayîn domandin.

Li vir, divê ku ez vê yekê di serî de werênima ser ziman ku komkujiya helepçê, her wusa weke komkujiyaka ku mirov wê gelek tiştan ji wê fahm bike ya. Komkujiya helebçê, weke komkujiyên din ku hatina serê kurdan ên weke komkujiya zilanê, komkujiya dersimê û hwd

a, ku di derbarê wan de dada navnetewî ne hatîya bierkirin û bikarhanîn. Her wusa, dada navnetewî, ev mijarên bi armanca jenosîdê, ne hildana rojava xwe. Li ser wan ti lêkolîn û bierkirin nekirîya. Ji xwe, ji ber ku ev ne hatîya kirin, piştî komkujiya Helebçê re, komkujiyên din, ên bi deh hezaran kurd û kurdistanî ku di wan de hatina qatilkirin hatina serê civate kurd. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku komkujiya helebçê, ji xwe weke komkujiyekê jî ne hatîya nasîn.. Di van waran de, dema ku di nava kurdan de bahse ne naskirina wê ya di qada navnetewî de dihêkirin de bahse ne karkirina bi wê re dihêkirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de bahse ne nasîna wê dihê kirin. Lê ji wê zêdetirî, em nikarin tenê ne nasîna wê di qada navnetewî de bi sedemên ne nasînî re werênina ser ziman. Ji wê zêdetirî, divê ku mirov bi gelek sedemên politikî û hwd re jî werêne ser ziman. Minaq, komkujiya Ermanîyan, ku bi ser ve 100 sal di buhurê, hê ew jî ne hatîya nasîn. Ev komkuji, ji ber ku hatinakirin korbanê hin politikayên serwerîyê û kontrolkirinê û hwd, êdî bi vî rengî weke xwe mana. Ev jî, êdî bûya sedema dûyîna komkujiyên din ên li dûv wê. Her wusa, di sale 2015´an de ku komna weke DAÎŞ´î ên terorîstî werina derxistin li holê ku bi destê wan bi deh hezaran mirov, bi jin û zaroyan re werina qatilkirin, ma mirov çawa dikarê fahm bike û werêninê ser ziman? Em mijar, dema ku em ji aliyê politikî û hwd ve lê binerin, her wusa divê ku mirov di çerçoveyekê de hilde li dest û werêne ser ziman.

Komkujiya helebçê, divê ku mirov rastîya wê baş fahm bike. Komkujiya helebçê, heta roja me ev 27 salin ku bi ser ve buhurîna. Lê ez nikarim bibêjim ku hê bi tememî û başî ji aliyê kurdan bixwe ve jî baş hatîya fahmkirin. Li ser wê, nebûna ti lêkolînên hûr û kûr û nebûna bidokumentkirina vê komkujiyê û hwd, her wusa weke nîşanaka vê rastîyê ya bi êş a. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov rastîya wê komkujiyê baş hilde li dest û werêne ser ziman. Em li vir, divê ku vê yekê weke rastîyekê baş fahm bikin ku komkujiya helebçê, weke ku me hinekî li jor jî got ku baş were fahmkirin, wê di derbarê komkujiyên ku hatina serê vê civatê wê têgîneka baş bide me. Di vê çerçoveyê de, em vê yekê jî bibêjin ku em kîjan komkujiyê hildina li dest, her wusa, weke êşeka mazin derdikeve li ber me. Çendî ku em li ser wan dihizirin û dikin ku wan baş fahm bikin, em hin bi hin rastîya van komkujiyan, gelek rastiyên din jî bi xwe re bi me dide fahmkirin.

Î ro, em bi ser vê komkujiyê re ev 27 salin ku buhurîna. Lê hê weke ku dûhû bûyî di mejiyê kurdan de bicih û şîn a. Her wusa, her ku dem têv

diçê jî, weke ku êşa wê zêdetirî dihê hîskirin. Li vir, bi vir ve girêdayî, ez vê yekê jî bibêjim ku weke ku dema ku bi demê re zanîn di derbarê wê de çê dibe, wê êşa wê zêdetirî were hîskirin. Lê ev, wê bike ku kurd karibin, wê deroniya komkujiyê jî ji ser xwe biavêjin. Di bin deroniya vê komkujiyê de kurd bi civatî dijîn. Rejimên herêmê ên weke rejima tirk û rejima îranê jî, hertimî bi zanebûnî di nava kiryar û kirinên ku wê deroniya komkujiyê ku li ser kurdan bi civatî heya ku girantir bikin. Bo vê yekê, di rojên cejnan de hertimî rewşeka bi êş didina kirin. Komkujiyên din dihênina serê civate kurd. Piştî komkujiya helebçê, bi sahan komkujiyên nû hatina serê civate kurd. Di vê çerçoveyê de, ev deroniya giran a komkujiyê jî, weke aliyekî ku dibe weke zincîra zantkirinê a di cih de jî. Tenê ku bo vê yekê jî bê, divê ku mirov li ser vê komkujiyê bihizirêê û wê fahm bike. Ji ber ku ji vê aliyê ve ev deroniya wê, li pêşîya pêşketina civatî jî, her wusa weke bendekê ku nahêle ku ji wê were buhurîn. Ev jî, êdî ji gelek aliyan ve b bandûrên wê re mirov di bin xwe de dihêle.Em ku ji kîjan aliyê ve lê binerin, em vê yekê dibînin.Herwusa, em dema ku ji kîjan aliyê ve lê binerin, em vê rastiyê kifş dikin. Komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibêje ku pêşî divê ku ji aliyê kurdan ve were fahmkirin.

Ez divê ku vê yekê jî bibêjim ku komkujiya helebçê, heta roja me jî, bi giraniya xwe re didomê. Her wusa, em vê yekê ji aliyê deroniyê ve dibêjin. Lê ku em ji aliyê zihniyeta ku ew komkuji kirî ve jî, lê binerin, em divê ku bibêjin ku komkujiya helebçê, hê jî weke xwe didomê. Ew zihniyet, hê di dewama wê komkujiyê de komkujiyan dike. Heta roja me jî, ev yek didomê. Her wusa li başûrê kurdistanê û şengalê û li rojavayê kurdistanê û kobanê û hwd, tenê çend minaqên ku em dikarin binxat bikin û werênina ser ziman in.

Em vê yekê jî divê ku werênina ser ziman ku têgîna civate kurd, bi dîroka wê re pirr kevn a. Ev komkuji, her wusa pêşîya wê jî digrin ku karibin bi deroniyek zaxm û baş ku li wê jî bihizirin. Her wusa, em vê yekê jî divê ku binxat biikin û werênina ser ziman. Komkujiyya ku hatî serê civate kurd, divê çerçoveyê de divê ku mirov ji gelek aliyan ve wê hilde li dest û werêne ser ziman. Giraniya deroniya jenosîdê, her wusa pirr giran a. Mirov dibin xwe de dihêle. Kurd, vê yekê baştir hîs dikin. Ji komkujiya helebçê bê û ankû ji komkujiya dersimê û hwd bê, mirov vê yekê pirr baş fahm dike Her wusa, mirovê ku bi civate xwe re rastî komkujiyê hatî, deroniya wî jî, ne bi tendûrist a. Her wusa dema ku mirov li mirovê kurd dinerê, mirov vê yekê pirr baş dibînê. Her wusa, ev

deroni, pirr zêde dike ku mirov ji rastîya civate xwe û ji rastîya xwe bixwe jî biravê. Her wusa, civateka ku herî zêde îranê û tirkiya komkuji hanîna serê wan û ku tenê ev civat bi zimanê van rejiman ê fermî ku xwe bijî, ma ku mirov bi vê rewşê re neyêne ser ziman, mirov wê biçi werêne ser ziman?

Em li vir, divê ku hinekî li ser vê deroniya mirovê ji civate ku rastî komkujiyê hatî bisekinê. Ev, bi serê xwe weke mijaraka deroniyê ya pirr kûr a ku divê ku mirov li ser wê bisekinê. Ezê li vir, hûr û kûr ji aliyê deroni ve li ser wê nesekiim. Tenê di çerçoveya mijara xwe de, ezê hinekî li vir li ser wê bisekinim. Lê bêgûman, divê ku ez bê bibêjim ku divê ku pirr zêde ji vê aliyê ve jî li ser wê bisekinê. Heta ku ev alî, ji aliyê mejiyê mirovê ji civate ku rastî komkujiyê hatî ve ku newê fahmkirin, wê ew ravîna wî ya ji rastîya wî û ji rastîya civate wî û nirxên wê civatê bi zimanê re wê bidomê. Ev jî, weke aliyekî giring ku di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê ya. Mejiyê ku ev alî baş fahmkirina, wê nikaribê bi ser wê ve jî herê. Her wusa, wê nikaribê, xwe bibînê û li ser rastîya civatîya xwe xwedî derkeve. Mejiyê mirovê ji civate ku komkuji hatî serê wî, bi gelek ancaman re xwe dijî. Ji hebûna civatê fihêtkirin, jê ravîn, xwe ji wê nedîtin, xwe bi wê re piçûk dîtin, her wusa xwe bi wê re û bi navê wê re kêm û piçûk dîtin û hwd, bi vî rengî bi gelek ancaman re wê xwe bijî. Ev jî, dibe temenê keseyetîyekê ku ji her rengê pêşketina dervî civate xwe re ku vekirî. Di roja me de, mirovê kurd, ku em li rengê pêşketina wî dihizirin, her wusa, ji vê aliyê ve weke andamên ciavte kurd, mirov di cihanê de û di serdema me de bi ti andamên civatên din re nabînê ku wilqasî ji rastya civate xwe diravin. Di aslê xwe de di rewşa ku herî zêde dibêjin ku ”em li rastîya civate xwe bi nirxên wê re lê xwedî derdikevin” jî, di bin vê rewşê û gotinê û rastîyê re ravînneka keseyetîyê ya pirr mazin heya. Di vê çerçoveyê de ev keseyet, her pêşketina ku bi dijî, nikarê têkiliya wê bi civaknasî, dîrok, felsefe û deronîya civate xwe re dêne. Yan jî, naxwezê ku wê têkiliyê bide danîn. Ev aliyên weke mijarên deronî na, wê di temenê hemû rewşên bi xirabûna keseyetîyê re de bin.

Em li vir divê ku vê yekê bi teybetî binxat bikin û werênina ser ziman ku keseyetîya civate kurd, bi dîroka civate wê re xwediyê dîrokek bi hezaran salan ku heta serdemên sûmerîyan diçê ya. Lê kîj kurd, dikarê vê yekê, baş werêne ser ziman? Di roja me de, tenê bersiva wê pirsê jî, wê rewşa xirab ya keseyetîya civate kurd raxe li berçav.

Em li vir, divê u vê yekê baş werênina ser ziman ku keseyetî, xwe weke wê civatê nabînê. Her wusa aliyê mejiyê xwe yê ´ser´ ku bi hiş a, wê weke ku bi wê re dijî wê bijî. Lê bi aliyê mejiyê xwe yê ´bin´ ku ne hiş û farqê de ya, bi wê re weke sûwarê haspê boz wê ji rastîya bi bazê bi ravê û herê. Î ro jî, rastîya mirovê kurd, ji vê ne cudatira. Di vê çerçoveyê de bandûra komkujiyên ku hatina serê civate kurd, li ser keseyetîya wê, pirr zêde hena. Di vê çerçoveyê de fahmkirina keseyetîyê, dema ku mirov dike ku bike, bi wê re mirov rastî vê rastîyê bi êş tê. Her wusa, mirov bi vê keseyetîyê re pirr zêde vê yekê kifş dike. Keseyetîya kurd, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku di mejiyê xwe de, li şûna ku bixwezê ku ji wê civate xwe ya ku rastî komkujiyê hatibê, dixwezê ku weke andamakî wê civate serdest ku rejima wê ew komkuji kirî bê. Di vê çerçoveyê de xwe weke yekî ji wê dibînê. Di vê çerçoveyê de, di roja me de, minaq, herî zêde mirovê kurd ê ku ji devera kurdistanê ê weke dersimê ku herî zêde rastî komkujiyê hatî ku li vir, dixwezê ku xwe nêzî rejimê bike, divê ku mirov bi vê deroniyê re werêne ser ziman.

Di aslê xwe de mejiyê vê keseyetîyê, wê deroniyê ji gelek aliyên ku ew bixwe nikarê ji xwe bixwe re jî werêne ser ziman, hîs dike û jîn dike. Divê çerçoveyê de bi wê re dijî. Lê teybetîya sereka ya vê keseyetîyê ew a ku nikarê ji xwe re werêne ser ziman a. ´Îtîrafa´ ji xwe re kirin, weke mijaraka herî zor ya vê keseyetîyê ya. Mirina xwe wê bide berçavê xwe lê wê îtîrafê bi xwe bixwe re jî nekê. Keseyetîya mirovê ku ji civate ku komkuji hatina serê wê, hinekî jî, van aliyan bi dijwartir dijî.

Bi teybetî, dema ku mirov li herêmên kurdistanê ên ku rastî van komkujiyên mazin hatina, em dibînin ku di çerçoveya keseyetîyê de jî xwedîyê teybetîyên bi vî rengî na. Nikarin xwe pêşde bibin. Nikarin xwe bi çand û zimanê xwe re bibînin û werênina ser ziman. Ji wan re giran tê. Bo vê yekê, weke rêyeka pirr bihesan, li serdestê xwe êdî xwe digrin û dikin ku xwe bikiina weke wî. Ev jî, weke rêyaka ku di wê de dikin ku xwe ”xilas” bikin a. Lê ev, weke rewşa ku ”di bahrê de xwe li mêr bipêçê” ya bo mirovê kurd. Ev çi dide nîşandin? Ev wê dide nîşandin ku keseyetîya civate ku rastî komkujiyê hatî û bi wê deroniyê dem buhurandî, mirovê vaca xwe ya civatî û her wussa keseyetî winda dike. Ya ku mirov di serî de li vir kifş dike jî ew a. Weke ancamaka komkujiyên ku hatina serê civate kurd, bi keseyetîya mirovê kurd re, mirov vê rastîyê pirr zêde kifş dike.

Ev keseyetî, xwediyê wê deroniyê ya, çendî ku komkujiya ku li wê herêma ku ew jê ya ku bi wê bi êş a. Bi heman rengî, piştre ji herêmên

din ku nûçeya komkujiyê digihijê mejiyê wî, êdî bi heman rengî dibe sedema ku ew xwe bi vîna xwe re berde û li berxwe nedê. Her wusa, ev jî, weke aliyekî din ê ku mirov divê ku bi teybetî li ser wê bisekinê ya. Pirsgirêka di hundurê de xwe ji xwe bixwe re hanîna ser ziman jî, hinekî jî, di vê çerçoveyê de bi keseyetîyê ve girêdayî ya. Î ro ku weke dersimî ku ser kurdên zaza ku ser 3 milyonan re ku hebin û zimanê wan bixwe jî di lîsteya UNESCO ya di zimanên di bin xaterîyê de bin ku ji dîrokê herin bin, divê ku mirov vê rewşê, hinekî jî bi vir ve bi vê deroniyê ve girê bide. Ji ber ku ev keseyet, weke ku bixwezê ku ew ji dîrokê herê, lê xwedî dernekeve. Vê, bi deroniya ku wê, bi wê ji dîrokê çûyina wê zimanê re ji wê deroni û keseyetîyê xilas bibe dike. Ku vê ji xwe re îtîraf jî nekê, di mejiyê xwe de vê yekê dijî. Ev, bo hemû kurdan wusa ya. Î ro ku er 40 milyonî re kurd bijîn û zimanê wan di bin xaterîyek bi vî rengî de bê, divê ku mirov bi vê deroniyê û têgîna windayî ya keseyetîyê re werênina ser ziman. Her wusa, ji ber ku dixwezê ku xwe bike weke serdestê xwe ku ew serdest qatilê wî jî bê. Bi wê re dixwezê ku wê deroniya wê komkujiyê ji xwe biavêje. Lê wê ti carî, bi wê rengê jî ji ser xwe neavêje. Ev jî, wê êdî hertimî wê keseyetiyê bi pirsgirêk bide jîyandin.

Ev keseyetîyek windayî ya. Bi wê re jî, têkçûyî ya. Her wusa, ev keseyet, wê nikaribê tiştekî xilas bike. Bo ku xilas bike, divê ku pêşî xwe kifş bike û ji wê deroniyê derxe û xwe xilas bike. Ya ku di serî de divê ku mirov wê werêne ser ziman di serî de ev a. Ew rewş, bo fahmkirina keseyetîya kurd ya rastî komkujiyê hatî, wê hinekî baştir rewşê bide fahmkirin. Ji ber çi li vir, dema ku em li ser komkujiya helebçê bihizirin, pêwîstî bi wê dibînin ku li ser keseyetîyê bi vî rengî hinekî jî bideroniyê li ser bisekin in? Ji ber ku ev meji, çendî ku dijî, bi nifşên pişt xwe re weke mejiyê ku lê komkuji hatîkirin, wê xwe bide domandin. Bo vê yekê jî, pêşî bo fahmkirina wê rewşê, divê ku mirov ji vê aliyê ve li ser wê bisekinê ku wê werêne ser ziman. Ev jî, wê weke aliyekî giring ê fahmkirina wê rewşê bê. Di serî de, heka ku bi vê nivîsê re em armanc bikin ku ev keseyet wê deroniyê ji xwe re biavêje û nehêle ku li pêşîya pêşketina xwe bike astang, divê ku em ji vê aliyê ve jî fahmkirinekê bi wê re bidina çêkirin. Î ro ku zimanê kurdî, ne weke zimanê perwerdeyê bê, sedemeka wê jî ev keseyet a. Ji ber ku ev keseyet, hertimî, li bendê ya weke pitika ku ye were bidiyê û ankû mama wê bi devê wê ve bike ya. Hertimî bi deroniyekê hêvî dike. Di xwe de wê karinê û qûdretê nabînê ku biafirêne û çê bike. Her wusa, ji ber vê yekê ya ku hertimî li şûna ku li

zimanê xwe xwedî derkeve û wê pêş bixe, badike û dibêje ”zimanê min, qadaxa ya” û ”zimanê min, qadaxa ya.”

Em dema ku di vê çerçoveyê de hizirin, em gelek tiştên ku bi keseyetîyê re werênina ser ziman em dibînin. Her wusa di vê çerçoveyê de, divê ku jî werina ser ziman. Lê li vir, biserekeyî, divê ku miirov li ser rewşa komkujiya helebçe bisekinê. Mijara keseyetîyê û fahmkirina wê, bila ji xabata din re bimêne.

Komkujiya helebçê, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov dikeve bin deroniyek pirr giran de. Her wusa, nexasim ve vêca ku ev yekî kurd bê. Di zane min de, weke ku ez bi xwe re hîs dikim, bandûra wê zêdetir dibê. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov li wê dihziirê, mirov wê hîs dike.

Komkujiya helebçê, weke komkujiyaka ku di çerçoveya ´pirsgirêka kurd´ de ku hatîya hanîn li serê civate kurd, weke hemû komkujiyên din ên weke komkujiya zilanê û komkujiya dersimê û hwd. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov dihizirê, ew têgîn di serê mirov de diafirê ku mirov çerçoveya pirsgirêka kurd, bi gotinî weke çerçoveya jenosîda kurd ku di nava wê de komkujiyên ku dihên serê civate kurd ku dibin a. Di vê çerçoveyê de mirov wê çerçoveyê kifş dike. Kurdistan, piştî ku li Lozanê di nava çar dewletên ku hatina avakirin ên weke îraq, îran, sûrî û tirkiya de hat beşkirin û qatkirin û pê de, êdî ji wê demê û pê de şerê wê bi kurdan û civate kurd re hat dayîn destpêkirin. Piştre jî, wê êdî di vê çerçoveyê de pêvajo bi pêvajo wê komkuji werina hanîn li serê civate kurd. Civate kurd, dema ku mirov di vê çerçoveyê de li rastîya wê dihizirê, rastîya wê kifş dike. Pêvajoyên komkujiyan ku hatina serê wê, dem bi dem bûna. Lê ev komkujiyên ku hatina serê civate kurd, ne hatina rojevê û li ser wan axiftin û lêkolîn ne hatina kirin. Ev jî, bûya sedema ku piştre êdî di dewama her komkujiya ku hatî kirin de piştre komkujiyên din werina kirin. Her wusa minaqe vê jî, ew a ku ji ber ku rastîyên di temenê kirina komkujiya helebçê de hatina vêşarî hiştin û ne hatina hanîn li ser ziman, êdî piştre di dema wê de komkujiyên li başûrê kurdistanê û şengalê û piştre li rojavayê kurdistanê û kobanê û hwd hatina serê civate kurd. Her wusa, ji li rojhilatê kurdistanê komkujiyên ku rejima îranê a îslamî ku hanîna serê kurdan û rejima tirk ku hanîna serê kurdan, ew ji xwe hîç bahse wan ne hatîya kirin. Ji ber çi komkujiyên ku rejima tirk hanîna serê kurdan ne hatina rojevê. Sedemeka wê, ew a ku ji ber ku tirkiya andamê NATO bû. Her wusa, weke ´hevkarê rojava´ bû. Ev rengê politika, her wusa, di her demê de derketîya ber kurdan. Bo vê yekê, hewceyî bi wê heya ku mirov divê ku hinekî li ser wê jî serî biwastêne.

Em heman rengî di dema rejima baasê a ku komkujiya helebçê hanî serê kurdan de jî dibînin. Her wusa, Saddam, weke serokê baasê, di destpêkê weke tirkiya, ew jî ´hevkarekî rojava´ bû. Her wusa, ew lewbratuarên ku di wan de lêkolînên biolojikî dihatina çêkirin jî, wê welatên rojava werina îraqê û çê bikin. Herî zêde Emerika, Îspanya, Almanya, Hollanda, Îngilistan, Japonya û hwd, wê çend ji wan welatên ku di vê warê de lebratuwaran ku li îraqê çê dikin bin. Ew jî, piştre, weke ku levkirina, weke welatekî andamê NATO´, wê lli ser tirkiya re ´madayên kimyewî´ wê bibina Îraqê. Li wir, wê di wan de bicih bikin. Her wusa, ev madeyên kimyewî ku di wan lebratuwaran de ku dihatina bicihkirin û lêkolînkirin, wê piştre ew bin ku li dijî kurdan wê werina bikarhanîn. Di wê dema ku Saddam, ew madaayên kimyewî ji wî re dihat şandin de, weke ´hevkarekî rojavayî´ bû. Her wusa, di dema ku wî ew komkuji dikir de jî, di destpêkê de wusa zêde li ser wê ne hatibû sekinin. Ji xwe welatên rojhilat ên misilman, yek jî ji wan, ew komkuji ne hildabûbûna rojava xwe. Roja 16´ adara 1988´an de ew komkuji dema ku bû û piştre, di 19´ê adare 1988´an de, yanî piştî komkujiyê bi sê rojan, wê civîna ´konfaranse rêxistina welatên misilman´ ku tirkiya jî tevli dibe wê were li darxistin. Lê tenê bi gotinekê jî ew komkuji di wê de ne hatibû ser ziman. Her wusa, bi heman rengî, wê rewş, piştre jî, xwe bide domandin. Piştre jî, hêrîşên ku li hemberê kurdan bi komkuji dibin, wê di nava wan de newina rojevê. Wê kurd, tenê bi wê komkujiya ku jînkirina re wê bimênin. Her wusa ên ku komkuji kirina jî, wê di wê çerçoveyê de bahse wan newê kirin.

Ev rewşa li ber komkujiyên ku hatina serê xalkên li rojhilat ku bi bêdeng mayînê re xwe bi welatên li rojhilat û welatên rojava û hwd de dide nîşandin, wê piştre temenê komkujiyên din ên ku wê werina serê xalkên herêmê jî bê. Her wusa, bi heman rengî, mirov dikarê bo komkujiya helebçê werêne ser ziman. Bêdengîya neteweyên yekbûyî li hemberê komkujiyê, mirov dikarê bi heta roja me, weke komkujiyekê ku hatîna serê wê civatê ne naskirinê re mirov werêne ser ziman. Ev rewş, wê di temenê komkujiyên din ên ku wê piştre werênina serê civate kurd bin. Her wusa, bêdengîya li hemberê komkujiyê, divê ku mirov ji aliyê sîyeseta ku dikin ve werêne ser ziman.

Komkujiya helebçê, wê di çerçoveyeka berfireh de were kirin. Têkiliyên demê ên bi rejima baasê re, divê ku mirov di çerçoveya danûstandin û hwd re de wê werêne ser ziman. Her wusa, madeyên kimyewî ku rejima saddam ku ji wan digirtin, weke ku li ser kurdan

biceribêne, wê bikarbêne. Di vê çerçoveyê de wê bi deh hezaran kurdan bikujê, ji ber ku kurd in. Komkujiya Helebçê, divê ku mirov ji van aliyan ve jî li ser wê bihizirê û wê werêne ser ziman. Komkujiya helebçê, weke komkujiyaka ku heta roja me jî, ji aliyê ´cihane hemdem´ ve ku hê ne hatîya naskirin a jî.

Ji ber ku ew komkuji ne hatiya naskirin, piştî roja ku di wê de komkujiya helebçê bû û pê de, bi 27 salan piştre wê komkujiyên nû ên ji wê maztir wê werina serê civate kurd. Divê çerçoveyê de divê ku mirov di dewamîya wê kirina wê komkujiyê de bibêje û werêne ser ziman. Komkujiya helebçê, divê ku mirov di vê çerçoveyê de jî li wê bihizirê û hewl bide ku wê baş fahm bike û werêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê, bibêje ku komkujiya helebçê, bi têkili û hêzên li piştê ku bi hevdû re têkiliya wan hebû re weke «qotîya pandora» ma ya. Hê jî, ew qotî ne hatîya vekirin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî, baş werêne ser ziman. Di destpêka pêvajoya şerê kendavê ê duyemin de nîqaşên li ser «ji îraqê derxistina çekên kimyewî ji aliyê rejima saddam» ve jî, hinekî jî, bûna nîqaşên ku ji gelek aliyan ve ser gelek rastiyên ku li piştî vê komkujiyê û hwd in, ku girtîya û ser wan nûxûmandîya. Her wusa, divê ku miriov vê yekê jî di serî de werêne ser ziman ku çendî ku bahse ´çekên kimyewî ên saddam´ dihat kirin jî, lê kifş bû ku kê çek dane wî û w hammadê bo çêkiirna wan çêkan ku ji kê girtina. Her wusa, ev jî, weke aliyna ku heta roja me jî, ku li ser wan vêşarî mana na.

Em dema ku bahse wan nîqaşên ´ji îraqê derxistina çekên kimyewî ên saddam´ bikin, divê ku em vê yekê jî bibêjin ku weke nîqaşna ku di destpêkê de bûmna sedema mudahaleya dûyemin a li îraqê û li kendavê jî. Lê piştre, weke mijaraka ku hertimî di bin nepeniyê de maya ku ew çekên kimyewî tij ji wan hatîya. Di wê pêvajoyê de li ser wan çekên kimyewî ên saddam nîqaşên bi rojan di çapameniya navnetewî de hatina kirin. Lê ew nîqaş tenê weke hin nîqaşna ku li ser raporna ku ji saziya îstihbarî a emerika ku hatina weşandin û tenê mana. Ji wê ne buhurî na. Mijara çekên kimyewî, weke mijaraka ku di vê çerçoveyê de bi komkujiya helebçê re ku divê ku mirov li ser wê pirr zêde bisekinê ya. Piştre jî, gelek lêkolînên ku li herêmê hatina kirin rengê çekên kimyewî ên ku hatina bikarhanîn jî, kifşkirina û hatina kirin weke rapor û radestî rêveberên neteweyên yekbûyî jî hatina kirin. Lê ew rapor, li ser wan ti ti tişte ne hatîya kirin. Her wusa, li ser wan re ti dadîya navnetewî ne ketîya dewrê de ku rastîya wê komkujiyê bi wan derxe li holê û piştre pêşîya

komkujiyên ku wê piştre bênkirin di wê şopa wê komkujiyê de ku bigrê. Ji ber ku ev nebû û ne hat kirin piştre, êdî ew komkuji domîyan. Di aslê xwe de, piştî ketina emerika a îraqê de ku her roj li îraqê bomba dihatina taqandin, mirov dikarê wan bombayên ku dihatina taqandin jî, weke wê nîqaşa li ser çekên saddam ên kimyewî û hwd, divê ku mirov hilde rojevê û bi teybetî li ser wan taqînan jî bisekinê. Ji ber kuew taqîn, dema ku em ji aliyê komkujiya helebçê ve li wan dihizirê, wê sê ancamên giring ji wan hebin. Yek, wê di temenê weke komkujiyaka ji rêzê danasîna komkujiya helebçe û piştre domandina temenê komkujiyên nû ên di wê de bê. Ya duyemin jî, wê di çerçoveya domandina pirsgirêka kurd re a bi wê re bê. Her wusa, wê pirsgirêka kurd, piştre jî, bê domandin. Çend ku piştî mudahaleya li Îraqê re weke ku kurd li başûrê kurdistanê bigihijina rêveberîyek kurdistanî jî, wê bi wan taqînan û zihniyeta di temenê wan de ew rêveberî were dorpêçkirin. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê ew taqîn weynekê bileyizin. Pêvajoya komkujiyan a ji dema helebeçê û kiirna komkujiya wê û piştre heta komkujiyên weke komkujiya şengalê û komkujiya kobanê û hwd, wê li ser wan taqînan re bi zihniyetî û hwd, bê dayîn domandin.

Pêvajoya komkujiya helebçê, her wusa wê di vê çerçoveyê de weke pêvajoyekê were û bibe. Em dema ku bahse komkujiya helebçê dikin, em divê ku werênina ser ziman ku em bahse pêvajoyeka komkujiyê dikin. Her wusa, em divê ku tenê weke komkujiyeka ku di rojekê de hatî kirin û piştre êdî pêvajoyî bi dawî bûyî lê ne nerin. Her wusa, divê ku mirov di serî de rastîya komkujiya helebçê, di serî de di vê çerçoveyê de ji du aliyan ve hilde li dest. Yek, ji aliyê komkujiyên demê ku di wê demê de hatina hanîn serê civate kurd a. Aliyê duyemin jî, ew a ku bi demê re domandina wê xate komkujiyê ya ku li ser serê civate kurd a. Di vê çerçoveyê de dema ku em li vê xatê dihizirin jî, em di çerçoveya zihniyetê de rastî wê tên. Em divê ku di çerçoveyeka zihniyetê de wê hildina li dest û werênina ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku aliyên komkujiya hellebçê ku di reşîyê de mana, yek ji wan jî ew a ku di wê dema ku komkuji dihat hanîn serê civate kurd, bi deh hezaran mêrên kurd dihatina kuştin. Lê keç zaroyên kurd, ji aliyên rayadarên rejimê ve hatina berhevkirin û birina şandin, li welatên din ên arab. Ev, ji xwe weke mijaraka ku hê ti kesekî bahse wê jî ne kirîya. Yanî, bi tememî di reşîyê de maya. Ev rêbaza birina keçzaroyan li welatên ên arab, rêbazaka ku rejimên din ên ku pirsgirêka wan ya kurd heya jî, ceribandina. MInaq,

rejima tirk, dema ku li komkuji li dersimê dikir, heman rêbaz dikir. Wê pîr û mêran bikujê. Lê zarok berhev dikirin û dikirina kamyonên leşkerî de û di birina rojavaayê tirkiya. Ew zaro jî, heta roja me, ti zanîn ji wan ne hatîya standin. Weke mijaraka sergirtî maya di nava rûpelên dîrokê de. ..

Di vê çerçoveyê de dema ku mirov li komkujiya helebçê dinerê, her wusa mirov dibînê ku heman rêbaz rejima baasê a saddam bikarhanîya li dijî kurdan Piştî ku rejima saddam hat rûxandin jî, ew dokumentên ku rastîya wan kêçên kurd, werênina derxina li holê, ne hatina derxistin li holê. Ew vêşarî mana. Di vê çerçoveyê de ev weke aliyekî mijarê ê dîrokî ku vê
Vêşarî maya, weke aliyê hêzên ku lebratuwar ku ji rejima saddam re ava dikirin û piştre ku piştî ku mudahale li rejima saddam bû û pê de, ku navê wan ne hat rojevê û hwd.

Komkujiya helebçê, divê ku mirov weke komkujiyaka ji rêzê ne hasibêne. Her wusa, dema ku mirov hewl dide ku rastîya komkujiyê fahm bike û werêne ser ziman, mirov gelek teybetîyên bi komkujiyên din ên kurdan re ku berî wê û piştî wê jî ku hatina hanîn li serê kurdan, bi wê re xwe didina dîyarkirin. Bo vê yekê, ev komkuji, dema ku mirov li ser teybetîyên wê dihizirê, her wusa mirov hinekî jî teybetîya komkujiyên din ên ku hatina serê civate kurd jî bi wê re ji gelek aliyan ve kifş dike.

Komkujiya helebeçê, dema ku mirov hewl bide ku wê fahm bike, divê ku mirov wê di du çerçoveyan de yek bi yek hilde li dest û fahm bike. Çerçoveya pêşî, çerçoveya navnetewî ya. Ev jî, bi têkiliyên bi rejima saddam re ku dihê ser ziman a. Her wusa, li ser wan têkiliyan re çekên kimyewî ku hatina dayîn li rejimê û lebratuwar ku li îraqê hatina avakirin û hwd a. Ev mijar, weke mijaraka ku ji sadî sadê wê hê vêşarî di bin perdeyê de maya ya. Aliyê din ê duyemin jî, di çerçoveya rojhilat de bi welatên ku prisgirêka wan ya kurd heya re divê ku mirov wê hilde li dest û werrêne ser ziman a. Her wusa ev jî, weke aliyekî giring ê bi çerçoveyî ku wê çerçoveyeka giştî li rojhilat bi hêzê li pişt perdeyê ku heta roja me, komkujiyan li dijî civate kurd didomênin re wê werêne ser ziman. Her wusa, ev çerçova, weke çerçoveyeka ku mirov dikarê bbi teybetî bi dîrokê re jî wê hilde li dest a. Çerçoveya vê çerçoveya duyemin, bi dîrokê re mirov dikarê bi wê re heta «şerê çardiranê» û hwd herê. Çerçoveya duyemin a bi komkujiya helebçê re dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, mirov bi wê re gelek rastiyên di çerçoveya pêşketinên bi pirsgirêka kurd re bi wan re kifş dike. Weke hêzên ku pirsgirêka kurd

dana afirandin û domandin, divê ku mirov wan hilde li dest. Her wusa, di vê çerçoveyê de jî, ew komkuji kirina. Her wusa, gelek komkujiyên ku bi dîroka wan re hena û hatina hanîn li serrê civata kurd, hena.

Em di vê çerçoveyê de divê ku werênina ser ziman ku tenê hema bêja ji dema ku di wê de komkujiya helebçê bû û pê de, li bakûrê kurdistanê rejima tirk sê û ankû çar qatî mirovên kurd ên ku di komkujiya helebçê de hatina qatilkirin, bi awayekî li demê belavkirî qatilkirina. Her wusa, ev pêvajoya wê ya qatilkirinê û hwd, bi kirina kurdan a zindanan û her wusa bi rengên din re didomê. Îran jî, her wusa bi heman rengî û ji wê zêdetir jî bi politikayên «bidervekirinê» û hwd re, wê di nava sînorê rejima xwe de li rojhilatê kurdistanê dide domandin. Di vê çerçoveyê de pêvajoya komkujiyan ku bidemê re hatîya domandin, divê ku mirov bi wê re pêvajoya komkujiyên ên ku piştî komkujiya helebçê û hwd, fahm bikin û werênina ser ziman.

Pêvajoya helebçê, divê ku mirov werêne ser ziman ku piştre jî bi vî rengî doma. Her wusa, divê çerçoveyê de divê ku têkiliyekê di çerçoveya wê domandina wê pêvajoya komkujiyê de biwan bombayên ku li îraqê dihatina taqandin re jî dêne. Ji ber ku ew hinekî jî, çerçoveyeka wan ya di vê çerçoveyê de jî hebû. Bêgûman, dema ku dema ku em bahse wan taqandinên bombayan bikin, em divê ku weke du û ankû sê dîmenî, bahse wê bikin. Weke gelek politikayên desthilatdarî û hwd, ku hatina tevlîkirin û bi wê re ew hatina domandin. Divê çerçoveyê de divê ku mirov bi teybetî werêne ser ziman. Çerçoveya taqîna wan bombayên li îraqê, wê piştî komkujiya helebçê, pêvajoya komkujiyan werêne heta dema derxistina li holê a DAÎŞ´ê ku êdî ew pêvajo bi wê re û li ser wê re were dayîn domandin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov pêvajoyê bi hevdû ve girêdayî di ahengekê de bi sîyesetê û zihniyetê re hilde li dest û werêne ser ziman.

Pêvajoya komkujiyên helebçê, di vê çerçoveyê divê ku miriov werêne ser ziman ku wê piştre her wusa werina domandin. Piştre, bi wan taqînan, weke ku rojav, ji deverekê hat birin li ser devereka din. Piştî an taqînan re, êdî ti kesekî bahse wan hêzên ku çekên kiimyewî ku hanîna îraqê û piştre ku çawa çekên kimyewî piştî mudahaleyê ji îraqê hatina derxistin û birin, ew êdî weke mijaraka ku nayê zanîn ma. Heta roja me jî, ew weke mijaraka ku nayê zanîn ma. Çend ku di wê demê de li ser wê re gelek nîqaş hatina kirin jî, ew nîqaş, tenê bûna alikar ku weke ku li ser vê rastîyê û pêvajoyê bigrê mana. Ew nîqaş, weke hin nqaşên ku oparasyonên têgihê ku li mejiyê mirov dikin man û hwd.

Piştre jî, wê ev pêvajoya nîqaşan, weke ku bi taqîna bombayan û hwd re wê bidomê. Ev jî, wê piştre, li ser pêşxistin û sorkirina mezhebitiyê re were pêşxistin. Her wusa, hem li hemberê hevdû sorkirina mezheban û hem jî sorkirina mezheban li hemberê bawerî û komên din ên kêmnetewî û ankû etnîkî û hwd, wê weke pêvajoyên ku piştre pêş dikevin bin. DAÎŞ, weke rêxistinaka ku ancma hinek rewşên bi vî rengî ya ku piştî mudahaleya li Sûrî û hwd, ku hat derxistin li dika dîrokê û li ser serê gelên herêmê hatkiirn weke bela.

Komkujiyên ku vê rêxistina kujar ku kirina, her wusa, di vê ku mirov ji du aliyan ve hilde li dest Aliyê pêşî ê bi kirina komkujiyên bi destê wê re ya. Aliyê duyemin bi rengê domandina pêvajoya komkujiyan a li ser taqîna bombayan a li îraqê û hwd re ya. Divê çerçoveyê de pêvajoya ku hatî domandin û radestî DAÎŞ´ê hatîkirin, î ro ew wê pêvajoyê dide domandin. Di vê çerçoveyê de li herêmê, weke ku ji nû ve dîzaynek hat kirin Mijara DAÎŞ´ê, armancên di temenê derxistina wê û hwd, bi serê xwe weke mijarekê divê ku mirov wê hilde li dest. Ev mijar, wê bi xwe re gelek rastiyên desthilatdarî ên herêmê û navnetewî bi hevdû re û di nava hevdû de bime di çerçoveya sîyesete herêmê de bide fahmkirin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê yekê jî werêne ser ziman ku komkujiya helebçê, dema ku mirov ji van aliyan ve lê dinerê, her wusa, weke komkujiyaka ku di karê bi rengê kirin û politikayên demê û her wusa politikayên rejimên herêmê ên ku di çerçoveya kirina wê de ku dihên dîtin de, dikarê van rewşan bi gelek rewşên din re bi me bide fahmkirin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov rastîya wê baş werêne ser ziman. Komkujiya helebçê, di dema ku mudahalaye li îraqê ku di nava çapemeniya navnetewî de ku hat kirin rojevê de jî, ew aliyê ku hatkirin çapameniyê de jî, teneê weke aliyekî ku bi wê dihat xwestin ku di temenê wê kom mudahaleya li îraqê were çêkirin ma.. Ji wê û pê de, bi pêşde neçû. Sedemên kirina komkujiya helebçê û rengê kirina wê bi politikayên ku di temenê kirina wê komkujiyê de na, ew ne hatina ser ziman. Ji ber ku ev bivî rengî ma, êdî piştre pêşîya komkujiyên nû ên ku hatina serê civate kurd ne hat girtin.. Her wusa, ji ber ku ew zihniyet, ne hat derxistin li holê û ne hat ser ziman ku were ´teşîrkirin´ û hwd, êdî piştre komkujiyên nû bi pêvajoyî, piştî komkujiya helebçê re domîyan. Komkujiya şengalê û komkujiya kobanê, her wusa tenê du ji wan komkujiyên ku bûna na. Ji komkujiya helebçê heta van komkujiyan, wê gelek komkujiyên piçûûk û mazin werina kirin. Her wusa, komkujiya ku hatî serê kurdên feylî, komkujiya ku hatî serê kurdên şebekî, komkujiya

ku hatî serê kurdên êzîdî û hwd, wê tenê çend ji wan komkujiyên ku bi pêvajoyê wê piştî komkujiya helebçê jî ku wê werênina dayîn domandin bin.

Ev pêvajoyên komkujiyan, dema ku mirov li wan dihizirê, mirov biwan re pêvajoyeka hatî domandî dibînê û kifş dike. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke mijaraka teybet ku divê ku çerçoveya vê mijarê de werênina ser ziman, wê li ser olê re temenê domandina van ppêvajoyan were afirandin û domandin. Ev jî, wê temenê wê bê ku êdî şerekî bênavber ku were domandin bê. Her wusa, wê piştî komkujiya helebçê re, qatilên DAÎŞ´î di bin navê ”tundrewîya olê” de wê werina hanîn ser ziman. Yanî, wê tundrewîya olê weke maske ji wan re were bikarhanîn bo ku ew wan komkujiyên xwe bidina domandin.

Ev mijara bikarhanîna olê di temenê kirina komkujiyan de divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê. Her wusa, salixkirina pirsgirêkan li ser gotinên olî û hwd re, wê weke rengekî domandina wan bê. Ev, wê hem li hemberî komên kêmnetew wusa bê û hem jî wê li hemberî komên bawerî ên cuda wê wusa bê. Ev jî, wê di çerçoveya têgîneka rejimî û desthilatdarî a herêmê de ku herêmê bi wê dixwezin ku dizayn bikin de wê bibe. Tenê ku ppêvajoyên dîrokî heta sedsala 20´an hildina li dest, emê vê rastiyê baştir bibînin. Bi hezaran salan, wê heta sadsala 20an, wê komên kêmnetewî û bawerî, wê hebûna xwe bidina domandin. Lê ji vê demê û pê de, wê êdî ew kom, bi carekê re wwerina dayîn nîşandin weke ”dijmin” li ser olê re û wê êdî hêrîş li hebûna wan were kirin. Hêrîşên bi komkuji ku li ermenîyan, asûrîyan û kurdan dihên kirin, divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Piştre jî, wê di vê çerçoveyê de ew werina domandin. Ev rewşa ku bi vî rengî, di sedsala 20´an de hat pêşxistin li ser olê re, wê êdî piştre jî, were domandin. Di roja me de, bi dest û zihniyeta rejimên herêmê didomê bi destê DAÎŞ´ê û hwd.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman ku komkujiya helebçê, di vê çerçoveyyê de weke neynikeka ku divê ku mirov bi teybet li wê binerê ya. Her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku ppêvajoya komkujiyên helepçe de wê komkujiyên ”enfalê” hebin. Navê ´enfalê´, weke weke nav sûrekî kuran´ê ya ku hatîya bikarhanîn. Yanî, bi vî rengî, çawa ol, weke maske û amûr û bîrdozîyya şer dihê bikarhanîn, ji vê aliyê ve komkujiya helebçê, fêr û dersna mazin dide me. Di pêvajoyên komkujiya şengalê û kobanê de, wê her wua heman kevneşopîya bi zihniyetî wê were domandin. Her wusa, wê pêşî

hebûna kurdan bê kirin weke armanc, Ev jî, wê li ser olê re hebûna kurd, were kirin armanc. Wê ”fetwa” were derxistin û bi wê vê bê gotin ku ”kuştina kurdan ´helal´ a” û ”destavtêina can, mal û namusa wan ´halal´ a”.. Ev, gotinên bi vî rengî, ji rengê bikarhanîna olê di dema komkujiya helebçê de ku bi wê navê ´anfalê´ û hwd dihat bikarhanîn û hwd, dihê derhanîn. Komkujiya helebçê, wê weke komkujiya ku di vê çerçoveyê de karibê têgînekê bide me bê. Her wusa dema ku mirov li wê dihizirê, di vê çerçoveyê de mirov rastîya wê pirr bi başî kifş dike û dibînê. Komkujiya helebçê, dema ku em ji aliyê zihniyetî û hêzên piretikî ku li pişt wê kirina wê ya ji aliyê rejima baasê ve na ku li wan dihizirê, mirov kifş dike ku hema bêja temenê rastiyên di temenê komkujiya helebçeê de na, vêşarî mana. Di dema mudahaleya li îraqê de ku bahse komkujiyên helebçê dihatkirin de jî, komkuji, tenê bi hinek kirinên pretikî hatîya kifşkirin û hatîya hanîn li ser ziman. Her wusa, weke komkujiyeka jenosîdî di qada navnetewî de heta roja me ne nasîna wê jî, nîşanak, birhan û minaqa vê rastîyê radixe li berçav a.

, .

**Çerçoveya navnetewî a hîmî ya komkujiya Helebçê**.

Komkujiya helebçê, ji gelek aliyan ve divê ku mirov wê fahm bike. Her wusa dema ku mirov li wê dihizirê, aliyê wê weke çerçoveya navnetewî, ku bi çend gotinan jî bê li ser têkiliyên bi rejima demê a baasê ku hena re jî, mirov divê ku werêne ser ziman.

Her rejim, têkiliyê bi her rejimê re didêne. Lê ev têkilî û piştgirîya ji wê distêne ku bi armancaka bi vî rengî bi kirina komkujiyan bikarbêne, hingî berpirsîyarîya wê rejimê jî ji wê têkilî û alikarîya wê ya bi wê rejimê re heya. Divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku êdî weke ku rejima demê a baasê a Saddam bê û weke ku î ro di roja me de bê ku rejima T. Ardogan a tirk û hwd bê, bi komkujiyên ku dikin re, ew têkilî û alikariyên ku di bin navê hewkariyê de dihên dayîn li wê jî, çerçoveyeka berpirsîyarî ya ahlaqî, wijdanî û kirinî û hwd bi xwe re diafirênê. Ji wê zêdetirî jî, gûnah û sûcên ku ew rejim bikin, ku bi wê alikariya wan bê, ew jî bi heman awayê weke ku wan rejimên ku ew komkuji kirina berpirsîyarîya wan derdikeve li holê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman ku di sedsale me ya î ro de her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku bahse têgîna maf û azadiyê û her wusa mafê mirovan û demokrasiyê û hwd dihê kirin. Ev têgîn û nirx, weke têgîn û nirxna ku di ancama zanîn û hişmendîya mirovatiyê a bi sedsalan de ku afirîna na. Ji

ber vê yekê, em nikarin, van nirxên bi vî rengî, pêşketina wan, tenê bi demekê û deverekê ve girêbidin û werênina ser ziman. Dema ku mirov wê bike, mirov wê hinekî nehaqî û bêmafîyekê li giştîya mirovatiyê bike di gotina xwe de.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku, pêşketina mirov her wusa di vê çerçoveyê de xwediyê wate û têgînîyeka giring a dîrokî ya. Mirov, bi maf û azadîya xwe re heya. Her wusa, mafê jîyanê, weke mafekî bingihînî ê mirovî, ahlaqî û wijdanî ya ku mirov divê ku bi rêz û hûrmet hertimî, dayimî û demê pêşwazî bike û werêne ser ziman. Di serdemên berê de jî, dema ku bahse mirov dihatkirin, bahse nêzîkatîya wan ya biqûdret a li hevdû û bi hevdû re dihê kirin. Li ser wê re biwatekirin û hanîna li ser ziman dihêkirin. Ew gotinên ku di wê çerçoveyê de hanîna ser ziman, li navaroka wan û zanîna di wan de li wê dihê lêgerin û dihê hanîn li ser ziman. Ev jî, weke aliyekî giring ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Têgîna maf û azadiyê, weke têgîneka mirovî a gerdûnî divê ku mirov wê hilde li dest û werêne ser ziman. Divê çerçoveyê de divê ku mirov bahse wê bike û wê werêne ser ziman. Têgîna maf û azadiyê, dema ku mirov di çerçoveya wê de bahse mirov û jîyane mirov bike, her wusa divê ku mirov werêne ser ziman ku weke ku Zerdeşt jî hanîya ser ziman, «mafê jîyanê pîroz a» û « ti kesek, mafê wî tûna ya ku dest li jîyane yekî din bide.» Kuştin, bi vî rengî qadaxa kirîya û hatîya «haram» kirin. Mafê jîyanê, weke gotinaka ku di vê çerçoveyê de di nava bawerîyan de jî bi rengna ji hevdû cûda ku hatîya şîrovekirina hatîya bicihkirin û hatîya hanîn li ser ziman. Dema ku ol hatina pêşxistin, ji aliyê pêxemberê wan ve, hatîya hanîn ser ziman ku jîyane mirov baştir bikin û biparêzên. Têgîna parazvaniya jîyane mirov, weke parazvaniya jîyane ku «xwûdê dayî» û mirov nikarê destlêbide hanîna ser ziman. Di vê çerçoveyê de jî, hema bêja ku di hemû bawerîyan de bi awayên cuda heya gotina «mafê jîyanê ji xwûdê ya» û «tenê ew dide û ew dikarê bistêne» ya. Dema ku bi vî rengî hat ser ziman, êdî bi awayekî standina jîyane mirov û ankû kuştina mirovan ji aliyê mirovan ve dihê qadaxakirin. Di vê çerçoveyê de êdî ´kuştin´ dihê qadaxa kirin. Di nava bawerîyan de di vê çerçoveyê de, têgîneka ku mirov dikarê wê salix bike û werêne ser ziman heya. Em divê çerçoveyê de divê ku werênina ser ziman ku mafê jîyanê weke mafekî pîroz a. Her wusa, mirov wê çawa bijî jî, weke mafekî pîroz a. Ji ber ku ev wusa ya, têgîna rastteqîniyê bi têgînî bi mirov re pêşketîya. Herwusa têgîna rastteqîniyê

di vê çerçoveyê de divê ku mirov wwerêne ser ziman. Têgîna rastteqîniyê, weke têgîneka ku li cewherê wê digerihê ya.

Ev rastî, her wusa, di çerçoveya têgînên gerdûnî ên bi jîyane mirov ve ku mirov dikarê wan werêne ser ziman in. Her wusa dema ku mirov bahse van têgîn û rastîyan dike jî, em divê ku werênina ser ziman ku herî zêde bahse rojhilat û şariştanîyên wê ên mesepotamikî dihê kirin ku bi van nirxên bi vî rengî bi sedsalan pêşketinên xwe çêkirina û mîreteyek ji mirovatiyê re hiştina li şûn xwe. Em dema ku bahse ´li şûn xwe hiştina´, li vir, em divê ku bi têgînî werênina ser ziman, ku em bahse dîrokekê û herîkina wê nakin. Ji ber ku ew maf ji wan şariştanîyan re ne hatîya hiştin. Hatin ji dîrokê birin. Î ro bahse bi sedan ziman, çand û civatên ku ji dîrokê çûna dihê kirin. Ew, bi dilê xwe ji dîrokê neçûna. Her wusa, divê ku miriov vê yekê werêne ser ziman ku car bi car dihê gotin ku ´ziman jî û çand jî zindî na´. Dema ku zindî bin, wê çaxê, divê ku mirov vê yekê jî li dûv wê bibêje ku biqasî ku mirov li jîyane xwe û domadina wê dihizirê, her wusa ew zindiya wan jî li wê dihizirê. Wê çaxê, divê ku mirov li vir kifş bike ku yek û ankû têgîneka ku wan ji dîrokê dibe, heya. Divê ku mirov êdî wê kifş bike û werêne ser ziman. Weke ku çawa ku li Helebçê, zilanê û dersimê û hwd bû, her wusa têgîneka ku mirov bi çand, ziman û civatîtîya wî dike ku ji dîrokê bibe heya.

Li vir, dema ku em bahse komkujiya helebçê bikin, divê ku em bahse van rastiyan jî bikin. Her wusa, tenê bi serê xwe wê ne bes ku em bahse wê komkujiyê bikin. Divê ku em di wê çerçoveyê de bahse wê zihniyet û têgîna ku di temenê wê komkujiyê de ku ew kirîya û ankû daya kirin jî, mirov wê kifş bike û werêne ser ziman. Ev, bi serê xwe biqasî, wê komkujiyê û hanîna wê ya li ser ziman giring a. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov ew zihniyet û têgîna ku wê jensîdê dibînê, êdî mirov wê karibê pêşîya wê jî bigrê. Di vê çerçoveyê de êdî ya rast û ne rast ku çi ya, mirov wê êdî wê kifş bike. Em dema ku bahse komkujiya helebçê bikin, divê ku em bahse wê zihniyeta ku ew komkuji kir û dakirin jî bikin. Divê çerçoveyê de divê ku mirov wê werêne ser ziman. Dema ku ev newê dîtin û ser ziman, wê çaxê, weke ku çawa ku piştî komkujiya helebçê, heta komkujiya şengalê û komkujiya kobanê hwd, ku di dewama komkujiya helebçê de bûna û weke wan bi dehan komkujîyên din hatîna hanîn li serê civatê, mirov wê nikaribê pêşîya wê jî bigrê. Piştî komkujiya helebçê, bi dehan komkujiyên mazin bûyîna wan li serê civate kurd û her wusa di dawiyê de di dewama komkujiya helebçê de bûyîna komkujiyên weke komkujiya şengalê û komkujiya kobanê û hwd jî, divê ku mirov di

vê çerçoveyê de bi pêvajoya komkujiya helebçê re werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de bi zihniyetê re çawa hevdû temem dikin, mirov divê ku bibînê û werêne ser ziman. Ev komkuji, bi vî rengî ji komkujiya helebçê û heta komkujiya şengalê û komkujiya kobanê û hwd, dema ku mirov di çerçoveya xatekê de li wê dihizirê, her wusa mirov bi zihniyeta wê re kifş dike. Êdî, ew têgîn bi mirov re çê dibe ku tenê xate komkujiya helebçê ku heta komkujiya şengalê û komkujiya kobanê û hwd, tenê weke kirineka wê têgîn, zihniyet û felsefeya ku ew komkuji daye kirin a. Em li vir, vê yekê di vê çerçoveyê de bi zihniyetê kifş dikin.

Pîrên me kurdan, gotinaka wan hebû. Digotin ku «carna gotinaka ku ji devê me derdikeve, dikarê rastîya me jî bi keseyetîya me re raxê li berçav.» Her wusa, di vê çerçoveyê de hem di dema komkujiya helebçê û bûyîna wê de û hem jî piştre nêzîkatîya di qada navnetewî de ku li wê hatîya kirin, bi heman rengî divê ku mirov bi zihniyet û politikaya wê zihniyetê re werêne ser ziman. Gelek mirov, dema ku li ser vê xalê bihizirin, wê aliyê wê wijdanî, ahlaqî û hwd jî bibînin û werênina ser ziman. Ev, weke aliyna nirxî ên ku mirov piştre jî dikarê wan kifş bike û werêne ser ziman. Wijdan û ahlaq, hinekî çerçoveya zanîn û keseyetîya mirov bi xwe re dihêne ser ziman. Komkujiya helebçê, dema ku mirov di vê çerçoveyê de lê bihizirê, mirov dikarê bibêje ku rastîya wijdan û ahlaqê mirov jî radixe li berçav. Her wusa, nêzîkatîya mirov a li wê, ku ev kurd bê û ne kurd bê, ku kî bê, bila bibe, wê di çerçoveyekê de nêzîkatîya wîya wijdan û ahlaqê wî bê. Her wusa, ku mirov ji vê gotinê gav biavêje û bibêje ku komkujiya helebçê, ku di destpêka sedsala 21´ê de di serdema ku bahse pêşketin û mirovatiyê û mirov û mafê mirov û azadî û mafan dihê kirin de, kirina wê, hinekî jî di vê çerçoveyê de zêdetirî bi hişmendî ji mirov dixwezê ku mirov wê werêne ser ziman. Çerçoveya têgîn û pêşketina mirov, vê yekê ji mirov dixwezê ku mirov zêdetir jî werêne ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku çerçoveya têgîna mirov di vê çerçoveyê de bi wijdan û ahlaqê mirov re dikeve berpirsînekê de jî.

Komkujiya helebçê aliyê wê bi çerçoveya navnetewî de her wusa divê ku mirov bi têkiliyên bi rejima demê a baasê a Saddam werêne ser ziman. Ew têkilî û alikarîya ku vê rejima baasê ku ji wan têkiliyên xwe yên rojava standîya bi wê ew komkuji kirîya. Di vê çerçoveyê de ew komkuji, xwediyê çerçoveyeka navnetewî ya. Teybetîya sereka bi vê yekê, ew a ku ew çekên kimyewî ku bi wan ew komkuji hatîya kirin a.

Her wusa di vê çerçoveyê de dema ku mirov li mijarê dihizirê, mirov weke aliyekî wê yê teybet vê yekê kifş dike ku divê ku werêne ser ziman.

Helebçê, weke herêmeka başûrê kurdistanê a bi dîrok û kevn a. Ev herêm, her wusa weke herêmeka ku ne dûrî ji ber çemê firatê jî ya. Hinek şaqên çemên firatê di ber wê re diharikin. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku helebçê, weke devereka ku li wê hertimî şînatî û zevî û fireze û hwd hen ana. Ji ber vê yekê, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku dem bi dem barîna baranê li ser wê arda wê ya sor, dike ku hertimî ew şîn bimêne. Di roja ku ew çekên kimyewî dihat bikarhanîn de jî, her wusa rojaka bi awr bû û piştre ne bi gelekî re ku baran barî bû. Ya ku pêşîya tevkujiyên di wê komkujiyê de ku bi milyonan girtibû jî, ew rewşa hewa ya bi barîna baranê re bû.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku bi çekên kimyewî, hewl hatibû dayîn ku bi tememî jîyan li wir were zûwakirin. Di vê çerçoveyê de bi armancaka kifşkirî û bi programaka ku hatî çêkirin re ew çekên kimyewî hatina bikarhanîn li helebçê.

Emê li jêr werênina ser ziman. Lê li vir, divê ku ez bi gotinekê jî bê bahse wê bikim ku di çerçoveya komkujiya helebçê de, heya hemû rejimên ku pirsgirêka wan ya kurd hebû, ji wê komkujiyê û kirina wê hebû. Bi hevdû re, hat ku danûstandin jî li ser awayê kirina komkujiyê kiribûn. Di vê çerçoveyê de, bi demê re çend ku rayadarên wan rejiman derdiketina bi berçapameniyan û diaxiftin, ew bi gotinên wan re dihat dîtin. Dema komkujiyê ku wê di wê de biheta kirin, ew jî, hatibû bi plankirin. Di demaka wusa de plana wê komkujiyê hatibû kirin, ku weke komkujiyeka ku di ancama wê şerê heftsalan ê di nava îran û îraqê de ku bûya de ku bûya wê biheta dayîn nîşandin. Ji ber vê yekê bû ku dema ku di wê de ew komkuji hatibû kirin jî, di vê çerçoveyê de weke demeka ku hatibû kifşkirin bû. Ev dem, her wusa weke demeka ku plankirî bû.

Komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de dema ku destpê dike, hêzên rejima Saddam, wê ji ber ava çemê firatê ji herêmên kerkûk û feylîyan dest bi komkujiyan bikin. Piştre ber bi herêmên şebekîyan de herê. Piştre werina ber bi herêma berzan ve. Di vê çerçoveyê de gav bi gav û herêm bi herêm bi kirina komkujiyê de pêde diçûn. Mirovên ku xwe ji komkujiyê xilas dikirin, diavêtên dervî sînoran. Her wusa, di sedsala me de, ku evqasî, teknik pêşketîya, me galo derfeta xwe xilaskirinê zêde hebû ji wê hêrîşa bi çekên kimyewî?

Bêgûman, dema ku mirov di vê çerçoveyê de li wê dihizirê, mirov gelek hûrgilên ku mirov divê ku wan werêne ser ziman û rastîya

komkujiyê zêdetir hin bi hin mazintir didina nîşandin, derdikevina li holê. Di vê çerçoveyê de pêvajoya jenosîda helebçê, ku bi oparasyonên rejima baasê ên ku navê ”enfalê” li wan hatîya kirin re wê destpê bike. Her wusa di vê çerçoveyê de wê êdî were berfireh kirin. Armanc, ne tenê kuştina çend mirovan û ankû çend mirovên ku rastîya rejimê herê nekirin bû. Ji wê zêdetirî, armanc, hebûna civatî bû. Bo vê yekê bû ku mêr û mazin di kuştin û keçzarok û hwd, berhev dikirin û dikirina kamyonên leşkerî de û di birina welatên din ên araban û hwd, di firotin. Welatên, weke Tunis, Urdin, Misir, Siudî arabistan û hwd, çend ji wan welatên arab ku ew keçzarokên kurd bi hezaran hatibûbûna birin li wan welatan û hatibûbûna firotin. Li herêmên din jî, ew hatina birîn. Piştî komkujiyê jî, çend ku dem bi ser komkujiyê ve diçû, hêzên ku li piştî wê komkujiyê bûn, dixwestin ku ew rastiyên bi komkujiya helebçê re ku bûna, werina”jibîrkirin.”Di vê çerçoveyê de hewl didan ji mejiyan bidina dûrkirin. Ev hewldana dayîna jibîrkirinê, hewldanaka ku bi armanca domandina wê pêvajoya jenosîdê a li ser serê civate kurd bû. Dema ku di dema xwe de di dema ku ew komkuji bû ku bi hemû aliyên wê li ser wê biheta sekin in û ew biheta lêkolîn û hemû rastiyên biheta derxistin li holê, wê pêşîya domandina wê pêvajoya jenosîdê a li ser serê civatê jî biheta girtin. Bo vê yekê bû ku hêzên ku ew komkuji bi hevdû re kiribûn, di xwestin ku wê pêvajoyê bidina domandin.

Emê piştre, vê rastîyê bi pêvajoyên piştre pirr zêde û baştir bibînin. Piştî, komkujiya helebçê, hem bo ku ser vê komkujiyê û rastiyên wê ên bi vî rengî were girtin û hem jî bo ku ew xate wê ya bi armanca jenosîdê bê domandin, piştre jî, wê bi piçûkatî û mazinahîya xwe re gelek komkuji li dûv hevdû werina kirin. Her wusa, piştî ketina hêzên Emerika li Îraqê de, bi weke ”hêncet” nîşandina taqîna wan bombayên ku dihatina taqandin, tenê weke xapandina ku li ser çapameniyê re ku di mejiyan de bidina çêkirin bû. Ev jî, ji kûderê dihê fahmkirin? Ev yek ji wê pêvajoya komkujiyê ku piştî komkujiya helebçê, ku piştî wê re bi 27 salan re ku bi komkujiyên weke komkujiya şengalê û komkujiya kobanê re ku didomê. Di roja me de, di van rojên ku ez van rêzan dinivîsênim, hê êşa komkujiya şengalê jî û ya komkujiya kobanê jî zindî ya. Wê piştî van komkujiya ev hêzên ku li piştî komkujiya helebçê bûn û î ro ev komkujiyên weke komkujiya şengalê û komkujiya kobanê kirina, wê piştî vê re jî, hewl bidin ku pêvajoya komkujiyan ji vê demê jî bidina domandin ber bi pêşarojê ve. Ji ber vê yekê ya ku tenê kirina van komkujiyan weke karê çend çeteyên ku bi rêxistin kirina bi navê DAÎŞ´ê

dihênin ser ziman. Tenê, ev rewş jî, dide nîşandin ku dixwezin ku ev xate komkujiyê bidina domandin. Bo vê yekê ya, ku êdî pirr giring û jîyanî ya ku em rastîya komkujiya helebçê lê bikolîn û wê baş fahm bikin.. Her wusa rastîya komkujiya helebçê, wê me bi xwe re bigihêne gelek rastiyên vêşarî ên li piştî kirina komkujiya şengalê û komkujiya kobanê jî.

Bo vê yekê giringa ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê û hewl bide ku wê baş fahm bike û werêne ser ziman. Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman ku rastîyên vêşarî ên li piştperdeyê di komkujiya helebçê de, wê di çerçoveya hebûna civate kurd de, rastîyên li pişt perdeyê ên bi armanca domandina ´pirsgirêka kurd´ jî werêne ser ziman. Wê rastiyên li piştî komkujiyên weke komkujiya şengalê û komkujiya kobanê jî raxê li berçav. Herwusa, rastîya li piştî komkujiyên din ên ku li başûrê kurdistanê, li rojavayê kurdistanê, li bakûrê kurdistanê û li rojhilatê kurdistanê jî raxê li berçav. Li bakûrê kurdistanê, î ro bi deh hezaran kurd, di zindanan de na. Zimanê kurdî li kurdan hatîya qadaxakirin. Oparasyonên qirkirina sîyesî li ser serê kurdan dimeşênin. Ev rewş hemû, têgîna di temenê wan de, divê ku mirov di çerçoveya têgîn û zihniyeta ku bi wê komkujiya helebçê û piştre komkujiya şengalê û komkujiya kobanê re werêne ser ziman. Her wusa, divê ku mirov li rejima îranê ku li rojhilatê kurdistanê jî qadaxa li ser zimanê kurdî bi dervekirinên ciwanên kurd ku ew dike re werêne ser ziman. Ev jî, weke aliyekî din ê vê çerçoveyê na ku divê ku mirov bi teybetî li ser wan bisekinê û hewl bide ku bi rastî fahm bike û werêne ser ziman. Komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov rast fahm bike û werêne ser ziman. Divê ku mirov pêşî di vê çerçoveyê de weke ku me li hinekî li jor hanî ser ziman, divê ku mirov bi zihniyeta di temenê wê de ku ew daye kirin re wê werênina ser ziman. Dema ku em wê zihniyetê fahm nekin û neyênina ser ziman, hingî wê komkujiya helebçe, tenê weke komkujiyeka ji rêzê ku di ancama hinek politikayên demî de ku hatîya kirin wê bê dîtin. Rast a, ku aliyekî vê komkujiyê bi politikayên demî re jî heya. Lê ev di temenê wê de bi zihniyetekê hatîya kirin. Rastîyeka rengê vê zihniyet û têgîna rejimê a di temenê kirina vê komkujiya helebçê de ew a ku di dema komkujiyê de ku bi hezaran keçzaroyên kurd dihatina berhevkirin û birina welatêna arab û hatina firotin û heta vê rojê jî ku ji wan ti agahî ne hatîya standin a. Ev rewşa ku bi berhevkirina keçzaroyên kurd û birina welatên arab û firotina wan, rewşeka ku me di dema komkujiya dersimê de ku bi kirina rejima tirk re jî dîtibû bû. Saddsam huseyin, dema ferman zilamên xwe ên weke Alî el-

mecid ku kurd weke ”alî kimyewî” bi nav dikin û dema ku ew komkujiya helebçê da kirin, hingî dibê ku wî ev kirinên tirkiya pirr lêkolîn kiribûn. Yan jî, li rex wî, dibê ku çend mirovên ku tirk ku bi wê aqilê dihizirin ku aqil didan dibê ku amede bûn. Ev rewş, hemû jî, weke rewşna ku divê ku mirov di vê çerçoveyê de li wan bihizirê û wan werêne ser ziman in. Komkujiya helebçê, bi kirina wê re weke ancama van kiryar û kirina hemûyan a.

Li vir, divê ku em vê aliyê bi teybetî li ser wê bisekin in. Komkujiya helebçê, aliyê wê navnetewî ku bi aliyê welatên arab a bi vî rengî ku er firotina li wan a keçzaroyên kurd re, weke aliyekî vêşarî maya. Her wusa, ji wê zêdetirî jî, di temenê vê têkiliyê de heya. Ji ber çi ev welatên arab, naxwezin ku ev rastî derkeve li holê û ser wê nûxûmandî dihêlin? Ji ber ku bi vê rastîyê ve girêdayî gelek rastiyên din ên ku wê bên dîtin hena. Ji wê zêdetirî, çerçoveyaka bi vî rengî ku wê bi komkujiya helebçê re were dîtin heya.

Dema ku ev aliyê komkujiyê ê bi firotina keçzaroyên kurd re mirov li wê dihizirê, weke bûyaraka ku tenê rejima Saddam bi wê dixwezê ku civate kurd ji hevdû belav bike. Di vê çerçoveyê de ev kirin dihê kirin. Ya bi wê re jî, ew a ku heya van welatên arab ji wê heya û di vê çerçoveyê de alikariyek wan ji wê kirina Saddam re heya. Ev tenê weke aliyeka ku naxwezn ku were dîtin û kifşkirin a. Ji ber vê yekê ya ku bi isrerî dixwezin ku ser wê rastîya firotina keçzaroyên kurd bigrin. Tenê ku mirov di çerçoveya dewlata misrê de bihizirê, wezereta karê derve û ya hundurîn û her wusa ya serokwezirtiyê di van waran de xwediyê gelek belge û dokumentên ku ew bixwe jî naxwezê ku wan ji rayagiştî re vekê di destê wê de hena. Her wusa, dixwezê ku vêşarî bihêle û ser wan vêşarî were girtin Di vê çerçoveyê de bo vê yekê, heta ku ji wê tê, dixwezê ku yan înkar bike û yan jî bi rêbazên din ên dane jibîrkirinê û hwd, wê ji hişê rayagiştî bide dûrkirin.

Di vê çerçoveyê de em dikarin bi dewletên din re jî werênina ser ziman. Çend ku rejima Saddam a baasê hat rûxandin jî, lê ew zihniyeta wê ji holê ranebû. Piştre jî, hebûna xwe domand. Malikî ku piştî Saddam re hat dewsa wî, politikayên wî ji yên Saddam ne cûdatir bûn. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku hertimî, li pişt perdeyê rejima îraqê, ya baasê weke xwe li desthilatdarîyê ma. Mirov, vê yekê ji kû fahm dike? Mirov vê yekê ji rengê kirina politikayan, nîşandina bertek û hwd fahm dike. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku piştî rejima Baasê weke ku ”hat rûxandin”

jî, wê piştre biawayekî li demê belavkirî, wê komkujiyên kurdan ên ku dihênin serê civate kurd wê bên dayîn domandin. Ev rewş, wê heta dema derxistina li holê a DAÎŞ´ê û hwd wê bidomê. Piştî ku DAÎŞ, bi aliya welatên ku pirsgirêka wan ya kurd heya ku hat derxistin li holê û pê de, êdî di çerçoveya wê nêzîkatiyê de weke ku hewldanaka nû ya weke ya dema Saddam a bi komkujiya helebçê re biheman rengî bi DAÎŞ´ê re li hemberê kurdan hat dayîn nîşandin. Di vê çerçoveyê de pêvajoya komkujiyê ya Helebçê, ku hatibû kirin, weke ku hat xwestin ku were dûbara kirin li ser serê civate kurd. Divê çerçoveyê de êdî çûna bi ser kurdan de. Li gorî demê, temenê wê rêxistin û komkujiyên ku li ser serê civate kurd bike jî, heta ku li ser olê re jî hatibû çêkirin. Minaq, gotinên weke ”kuştina kurdan ´helal´ a” û ”destavêtina mal, can û namusa wan helal´ a”, bi heman rengî û zihniyetê mirov dikarê werêne ser ziman. Vêcarê, rêbazên jenosîdê ku rjeima Saddam li hemberî kurdan bikardihanîn, kiribûbûna bin perde û maskeya olê de bi navê ”fetwa”yê û hwd.

Pêvajoya komkujiya helebçê jî, her wusa di hema rengê de bo ku bidina nîşandin, ol bikarhanî bûn. Minaq, navê ”enfalê” ji kuran´ê ya û li oparasyona jenosîdkirina kurdan hatibû kirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de dihat gotin ”enfal kirina kurdan”. Ev gotin, di vê çerçoveyê de hatina bikarhanîn. Di aslê xwe de gotina ”enfal kirina kurdan”, weke gotinaka ku mirov divê ku pirr li ser wê bisekinê ya. Piştî komkujiya kurdan, di nava kurdan de û di çapameniya kurdan de jî hat ser ziman weke navê wê komkujiya helebçê. Di aslê xwe de, ev nav, bi zanebûnî, weke navekî ku rejima baasê bijartibû bû. Hertimê, dema ku dihat gotin ku ”enfal kirina kurdan”, di mejiyê yekî misilman de, wê wateyê jî dide çêkirin ku ”yên ku ne misilman ku hatina anfalkirin” jî dihê fahmkirin.Yanî, li vir, lîstikeka ku li ser têgîn û gotinîyê re ku hê bi komkujiya helebçê bi xwe re jî heta roja me didomê heya. Di vê çerçoveyê de di mejiyan de ev gotina ”enfal kirina kurdan”, dibê weke oparasyonaka têgihê li mejiyê mirovan jî. Bi vê gotinê, mejiyê mirovan, weke ku rengê hizirkirina wê dihê dayîn kirin.

Ev rengê bi navkirina gotinê, mirov dikarê çawa wê fahm bike? Her wusa, aliyekî wê di çerçoveya ”dij-olî” nîşandanê de heya. Lê aliyekî wê yê din ku mirov divê ku bi hebûna deroniya civate kurd ve girêdayî jî ku werêne ser ziman heya. Ew jî, her wusa ew a ku di çerçoveya afirandina wateya vê gotinê de êdî dikina temenê ku mirov bi deronî li ser wê kirina komkujiyê re ku ji rastîya civatîya xwe dûr bikeve. Yanî, bi gotinaka din,

ku bi vê têgîna wê gotinê re ku bandûra wê komkujiya helebçê, ku bikina temenê ji hevdû felişandinaka din dimejiyê mirovê kurd de ji aliyekî din ve.

Di vê çerçoveyê de gelek aliyên vê komkujiyê ên ku li ser hanîna wê ya li ser ziman re jî ku ne hatina fahmkirin hena. Divê ku mirov bi teybetî li ser wan aliyan jî rawastihê û hewl bide ku wan fahm bike û werêne er ziman. Aliyê bi gotinî ê weke navlêkirina komkujiya helebçê weke ”enfal kirina kurdan” û hwd, dibê ku dema ku kurd wê di nava xwe de bikardihênin, bi nîyeteka baş ku bi wê dixwezin ku rastîya wê komkujiyê raxistina li berçav wê bi wê rengê dihênin ser ziman. Lê li vir, divê ku mirov di serî de vê yekê jî baş fahm bike û werêne ser ziman ku ev gotin ji kîjan gotinan pêk tê û ew gotin ji kîjan wateyan pêk tê. Yek bi yek, dema ku mirov gotinan li wan dihizirê, minaq, weke gotina ”anfalê” û hwd, bi wateya wê ya di kuran´ê de dihê dîtin û fahmkirin. Dema ku hewl dihê dayîn ku çerçoveya têgîna vê gotinê were fahmkirin jî, wê di wê çerçoveyê de hewl bêdayîn ku rastîya vê gotinê û têgîna wê were kifşkirin. Ev, bi serê xwe weke aliyekî din ê ku mirov divê ku ji aliyê deroni ve jî ku li wê bihizirê û hewl bide ku wê fahm bike û werêne ser ziman a.

Ji aliyê gotin û bi navkirinê ve jî, bandûra wê bi navkirinê di mejiyê mirovan de ji gelek aliyên ku di nava hevdû de hena ve mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa, aliyê pêşî weke ku bi gotinê re me hinekî li jor hanî ser ziman bi rengê têgînaka li ser olê re xwe dide dîyarkirin. Çendî ku em hewl bidin ku bi şîroveyekê rastîya vê komkujiyê baş jî werênina ser ziman, lê ku bi vî rengî bi gotinaka li ser olê re hat bi navkirin, ew gotina ku li ser olê re hatî bi navkirin, dikarê wê şîrove û rastîya ku komkujiyê ku hatî ser ziman, di mejiyan de berevajî wê bike. Her wusa, dikarê rastiyê berevajî rastîya wê bide nîşandin. Ev jî, weke aliyekî din ê ku divê ku mirov bi komkujiya helebçê re wê hilde li dest û werêne ser ziman a. ..

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov rastîya komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de hinekî li ser nav re jî şîrove bike û werêne ser ziman. Li vir, ez dixwezim ku hûrgilaka din di çerçoveya komkujiya helebçê ve werênima ser ziman. Piştî ku Saddam huseyin, komkujiya helebçê dike û bi de hezaran kurdan dide kuştin û piştre, diçê ”bi xwûna kûran´ê dide nivîsandn.” Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov van rastîya bi hevdû ve girêdayî werêne ser ziman. Yanî, bi rengekî din, armanca kirina wê komkujiyê û hemû kujariya xwe di bin maskeya olê de bi vê re bide

vêşartin. Ji wê zêdetirî jî, her wusa, li vir, hewldanaka ku li ser têgîna olî û gotinên wê re hanîna li ser ziman û bi wê re êdî di vê çerçoveyê de ”meşrû” dayîna nîşandina wê, hatîya dayîn nîşandin. Gotina anfalê, di çerçoveya komkujiya helebçê de, biqasî wê lîstika qirêj ya Saddam ku bi xwûna xwe kuran´ê bide nivîsandin, aliyekî vê zihniyetê ê qirêj û lewitî radixe li berçav. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov an aliyên ku di temenê kirina komkujiyan ên li herêmê de baş fahm bike û werêne ser ziman. Komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke komkujiyaka ku wê çawa li ser wê bi gotin û têgînê re were girtin jî, li wê jî weke ku hatîya hizirîn a. Her wusa, nîşanaka vê jî, bikarhanîna gotina ”anfalê” weke navê vê komkujiyê ya ku divê ku mirov bi teybetî wê hilde li dest û hewl bide ku bi rastîya kirina jenosîdê re fahm bike û werêne ser ziman a. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê jî bibêje ku carna nezanîya mirov jî, dibê temenê xwe ne haq derxistina mirov jî. Çend ku kurd, biawayekî rast bi haq û bi maf in jî, di vê çerçoveyê de bi gotinên li ser olê re her wusa, wê rewşa xwe ji gelek aliyan ve dikina zorê de. Di aslê xwe de, aliyekî ku di temenê wê şerê li hemberî wan ku heta roja me domîya ya, divê ku mirov bi vir ve girê bide. Di dema şerê DAÎŞ´ê ê bi kurdan re de, gelek ciwanên kurd ên ji Helebçê, ku di nava DAÎŞ´ê de hatina dîtin û kifşkirin, divê ku mirov bi vê rastiyê re werêne ser ziman. Li vir, di serî de dema ku mirov van aliyan bi rastî û bi başî fahm nekê û neyêne ser ziman, wê aliyekê komkujiyê ê mazin weke ku di bin perdeyê de vêşarî bimêne. Bi vê yekê, divê ku mirov hinekî din jî bi kûrahî li ser navê ´anfalê´ û hwd rawastihê û hwd bide ku wê baş fahm bike û werêne ser ziman.

Ez dema ku li vê rewşa komkujiya helebçê a li ser nav re lê dihzirim, rewşa komkujiya dersimê jî bi wê re dihê berbîra min. Mirovê ku ferman komkujiya Dersimê dayî M. Kemal Atatûrk, piştî komkujiyê re ku herî zêde navê wî ”kemal” li wê herêmê zêdetir were dîtin, divê ku mirov bi vê rewşê re werêne ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov têgîna bi navan û gotinan re di rewşên wan weha de weke aliyekî giring hilde li dest û werêne ser ziman. Ji ber ku gelek rastiyên ku di bin wan de dihên vêşartin hena. Minaq, li tirkiya oparasyona bi navê ”wergera li jîyanê” ku li zindanan kirin ku di wê de bi dehan kurd û girtîyên ji dozên din ji aliyê hêzên dewleta tirk ve hatina qatilkirin, navê ”´wergera li jîyanê” li wê kirin. Ev rengê navlêkirinê, di vê çerçerçoveyê de bi armanca rengekî ser komkujiyê nûxûmandinê ya. Di vê çerçoveyê de di komkujiyên kurdan de rejimên herêmê rejima tirk jî û ya îranê jî û

ya îraqê jî û ya Sûrî jî serî li rêbazên bi vî rengî ên li ser bi navkirinê re dana. Di bin wê bi navkirinê de hewldana ku komkujiyên ku kirina ser wan binûxûmênin.

Mijara bi navkirina komkujiyên kurdan, di vê çerçoveyê de weke mijaraka sernûxûmandinê hertimî derketîya li ber me. Her wusa, di komkujiya helebçê de jî bi heman rengî mijara binavkirinê, wê weke mijaraka ser nûxûmandinê wê xwe bide dîyarkirin li ber me. Di dema ku ez li ser komkujiya helebçê de dihizirim ku ez bi kîjan aliyê ve lê dihizirim, ez dibînim ku ev mijara bi navkirinê her wusa derdikeve ber min. Bo vê yekê, êdî ez dibînim ku weke pêwîstîya zarorî ku mirov divê ku hewl bide ku wê rastîya bi navkirinê ya komkujiyan ku hatina hanîn li serê civate  kurd hilde li dest. Her wusa, mijara bi navkirinê, weke mijaraka ”înkarkirinê” jî mirov dikarê werêne ser ziman. Rejima tirk û rejimên ên ku pirsgirêka wan ya kurd heya, di komkujiyên kurdan ên ku kirina de, rêbaza înkarê pirr zêde bikarhanîna. Pêşî komkuji kirina û piştre gotina ”me, ne kirîya” û hwd. Di vê çerçoveyê de, dema ku mirov bi awayekî rast, bi dîroka civate kurd re vê dîroka komkujiyan hilde li dest, mirov wê rastî rewşeka teybetî bi vî rengî ya li ser bi navkirinan re were. Ev bi navkirin, wê weke mijaraka giring ya ser nûxûmandinê ya komkujiyên kurdan bin. Bo vê yekê di serî de divê ku mirov vê yekê bi teybetî hilde li dest.

Di komkujiya helebçê de jî, em rastî wê rastî mijara binavkirinê a li ser komkujiya helebçê re tên. Her wusa, di vê çerçoveyê de têgîna bi gotina ´anfalê´ re ku dihê afirandin, weke aliyekî giring ku hem li ser komkujiyê di mejiyan de dinûxûmêne û hem jî ji aliyê deroniyê û hwd ve jî, mijarê dike bîrîneka civatî di nava civate kurd de. Em di vê çerçoveyê de her wusa divê ku vê aliyê komkujiya helebçê, baş fahm bikin. Ev aliyê komkujiya helebçê, wê di derbarê komkujiyên din ên kurdan û her wusa li ser bi navkirina wan re de ku çawa hewl hatîya dayîn ser wan were nûxûmandin û ankû hatîya nûxûmandin, wê biawayekî vekirî were dîtin. Ji vê yekê, dema ku mirov li ser bi navkirinê re lê dihizirin, her wusa mirov rastî rewşeka teybet ya komkujiyê tê. Li vir, ez divê ku vê yekê jî werênima ser ziman ku çendî ku kurd di mejiyê xwe de li gotina ”Enfal kirina kurdan” wateyeka cûda jî lê bikin jî, lê ev wate, wê wateya di mejiyê giştîya civatên dervî wan de nadê gûharandin. Her wusa, vajî, wê, ew watekirina dervî wan, wê êdî wê biwatekirina kurdan a di mejiyê wan de wê vala jî derbixe. Ev jî, êdî wê bê sebebê ku kurd, di vê çerçoveyê de bikevina deroniyeka hê xiratir de di rewşa wê komkujiyê de. Ya ku em

dibînin jî, di aslê xwe de ji vê rastîyê ne cûdatira. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku rastîya komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de ji gelek aliyan ve, dema ku gotina ´anfalê´ bixwe jî dihê bikarhanîn, gelek aliyên wê ên dijwar di mejiyan de ser dinûxûmêne û dide vêşartin Nahêle ku mejî, wê rastîyê bi tememî bibînê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî, her wusa bi teybetî binxat bikin û werênina ser ziman. Gotina komkujiyê, di vê çerçoveyê de di bin perdeya ´anfalê´ de hatî ser nûxûmandin û vêşartin a. Yanî ser wê hatîya perdekirin û girtin. Em dema ku di vê çerçoveyê de li komkujiyê dihizirin, her wusa di vê çerçoveyê de mirov vê rastiyê baştir dibînê. Heta roja me jî, rêxistinên tundrew ên weke Fethullahçîyan ku ji welatên afrîqa û hwd ku mirov berhevkirina û tevlî DAÎŞ´ û hwd kirina ku bi bi kurdan re şer bikin, hinekî jî li ser vê rewşê re pirr zêde karkirina Divê ku mirov vê rastîyê jî baş fahmbike. Di roja me de, dema ku em  li rewşa bi navkirinê dinerin, divê çerçoveyê de weke rewşa wê ”helal”kirina qatla kurdan, mirov rewşekê bi wê re dibînê. ..

Li vir, li dijî nirxên mirovatiyê bi awayekî pirr sinsî û xayînnana di vê çerçoveyê de li ser navan re komkuji li ser wan hatîya nûxûmandin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov di mijara komkujiyên ku hatina hanîn li ser civate kurd de binavkirinê, weke aliyekî pirr zêde giring hildina li dest û werênina ser zman. Ev, wê me bi xwe re bigihêne pirr rastîyên wê komkujiyê ên li pişt perdeyê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov rastîyê pirr zêde li wê bihizirê.

Weke ku çawa ku di hemû komkujiyên kurdan de em dibînin, binavkirin dihê bikarhanîn weke awayekî sernûxûmandinê, em di komkujiya helebçê de jî, vê rewşê bi awayekî vekirî pirr zêde dibînin. Di vê çerçoveyê de ya, ku dema ku bahse komkujiya helebçê, dihê kirin ku gelek meleyên bawerîya îslamê bêbertek dimênin, hinekî jî divê ku mirov ji vê gotina ´anfalê´ê ku weke navê wê dihê bikarhanîn dûr şîrove nekê. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov rastîyê bi hevdû re hilde li dest. Ew çerçoveya olî ku di komkujiya helebçê û kirina wê de hatîya bikarhanîn, di mejiyê mirovan de pêşîya dîtina rastîya wê dide girtin. Her wusa, mejiyê yekî misilman, li ser wê gotinê û çerçoveya olî re nikarê hîç wê rastîya komkujiya helebçê bibînê. Bi awa û rengê ku dibînê jî, di çerçoveya ”dij-ol” de dibînê. Heta ku di vê çerçoveyê de dikarê di mejiyê xwe de li ser wê çerçoveya olî re wê kirina komkujiya helebçê ”rast” jî bibînê û ”rast bide nîşandin.” Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî, binxat bike û werêne ser ziman. Mejiyekî ku dikarê de li ser wê çerçoveya olî re

wê kirina komkujiya helebçê ”rast” jî bibînê û ”rast bide nîşandin.”, ew meji, wê ti carî nikaribê rastîya komkujiya helebçê bibînê û bide nîşandin. Ji ber ku di vê çerçoveyê de bi wê çerçoveya ku ew dinerê de, ew komkuji hatîya kirin.

Ez bixwe jî bûma şahidê wê rastiyê ku gelek kurd, dema ku berfetaka xwe li ser komkujiya helebçê tênin ser ziman û wê kirina komkujiyê ´şermazar dikin, weke gazinekê ji dilê xwe dihênina ser ziman û dibêjim ku ”ne, em jî misilaman in, ji ber çi welatên misilman li hemberê komkujiyên ku tên serê kurdan bêdeng dimênin.” Temenê vê bêdengîya ku bi vê gotinê re bi navê cihan îslamê re dihê ser ziman, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Heta ku gelek oldarên kurd bixwe jî, li hemberê wê komkujiya ku hatîya serê civate xwe bêdeng mana. Ev jî, weke hûrgilekê divê ku mirov bin wê xatbike û werêne ser ziman.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê rastîya bêdengî û bêbertek mayîna cihan îslamê a li hemberê komkujiyên kurdan, ji aliyekî ve ji vê aliyê ve werêne ser ziman. Aliyê duyemin jî, bi welatên ku wê komkujiyê dikin ku weke ”misilman” didina nîşandin a. Aliyê sêyemin jî, ew a ku wê rastîyê di vê çerçoveyê de nabînin. Bi çavên xwe yên ku li dûnyê dinerin weke korên ku nabînin in. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê rastîya wan werêne ser ziman. Î ro, dema ku em ji vê aliyê ve li komkujiya kurdan dihizirin, em dibînin ku li ser nav û bi navkirinê re rewşeka çawaa hatîya afirandin. Her wusa, bandûra bi navkirinê, mirov bi vê rewşê re dibînê ku çendî di mejiyan de ji aliy deronî û her wusa nedîtinê ve heya.

Komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de dema ku bahse wê dihê kirin, ew nêzîkatîya kurdan a bi gazin ya bi rengê, çima cihana îslamê li ber wê kirina komkujiya helebçê ”bêdeng” dimêne û hwd jî, di vê çerçoveyê de rastîya wê hinekî dihê dîtin. Hêzên ku ew komkuji kirina, di vê çerçoveyê de li vê rewşê û rengê fahmkirinê û hwd jî hizirîna û piştre bidest komkujiyê kirina. Wê çawa kirina komkujiyê, bi rengekê ku karibin, wan têgîn û xosletên olî ên weke bi navê ”fetwa”yê û hwd bikarbênin û hwd, li wê jî pirr zêde û baş hizirîna. Bi xwûna xwe nivîsandina kuran´ê a ji aliyê Saddam ve, rêbazaka bi vî rengî ya li dijî nirxên mirovatiyê ya sînsî û xayînana ya. Ev rewş û rêbaz hemû, dema ku piştî komkujiya helebçê bi 27 salan di sala 2014 û 2015´an de ku komkujiyên mazin ên weke komkujiya şengalê û komkujiya kobanê hatina hanîn li serê civate kurd, dîsa ev rê û rêbazên sînsî û xayînana ên li dijî nirxên mirovatiyê hatina bikarhanîn. Her wusa, tenê, weke komên

tundrew nîşandana DAÎŞ´îyan bixwe jî, di vê çerçoveyê de weke sernûxûmandinakê ya. Ev mirovên ku qatil in û ti eleqeya wan bi olê û nirxên olê re tûna ya, bi navê olê hanîna wan li ser ziman, weke ku çawa ku du komkujiyên kurdan de bi navkirin weke sernûxûmandinekê dihê bikarhanîn, biheman rengî ew gotina tundrewîyê jî bo wan û kiryarên wan ên qirêj û komkujiyên ku ew dikin, dibê sernûxûmandinek mazin ya dîrokî.

Ev rêbaza sernûxûmandinê a bi ”binavkirinê” divê ku mirov hinekî din jî li ser wê bisekinê. Ji ber ku ev di welatên cihane îslamê de ev rêbaz pirr zêde hatîya bikarhanîn û di bin wê bi navkirinê de bi sedan komkujiyên ku hatina kirin vêşarî na. Rejimên ku weke misilman bi nav dikin, ew komkuji kirina. Lê ew komkujiyên xwe bi wê rengê bi navkirinê, kirina malê wê cihanê îslamê giştî jî. Her wusa, her çar dewletên weke îran, sûrî, tirkiya û îraq ku pirsgirêka wan ya kurd heya û weke ´dewletên misilman´ dihê bi navkirin, hertimî komkujiyên ku hanîna serê kurdan, di vê çerçoveyê de di çerçoveya bi navkirinê de sernûxûmandina.

Ez dema ku li vê bi navkirina weke ´anfalê´ ya li komkujiya helebçê dihizirim, ku ez di mejiyê xwe de diçina 100 û ankû 200 sal berê î ro û roja me, ji wê rojê weke mirovekî ku bawerîyê bi wê pirtûka ku ew gotina anfalê ji wê ya ku li wê rewşa komkujiya helebçê dihizirim, di wê çerçoveyê de dîmenê ku dihê li berçavê min, ew a ku ew komkuji weke komkujiyeka ku hatîya serê hinek mirovên ku hêrîşî nirxên olî kirina û ankû weke komkujiyeka ku hatîya serê hinek mirovên ku ne misilman in ku hatîya kirin a. Di vê çerçoveyê de di destpêkê de dîmenê wê komkujiyê di bin wê gotina ´anfalê´ de dihê vêşartin. Bi heman rengî li oparayona komkujiya rejima tirk a li zindanan ku navê ”wergera li jîyanê” lê kirîya, ku mirov li wê dihizirê, her wusa bi heman rengî mirov rastî dîmenekî tê ku weke ku ew raaydarên vê demê ên ku ew oparasyona komkujiyê kirina, weke ku dixwezin ”jîyane hinek mirovna xilas bikin” dihê li berçavê me. Lê ev herdû dîmen jî ne rast in. Her wusa ev herdû dîmen jî, di wê çerçoveyê de ser rastiyê dinûxûmênin.

Heman rewşê, mirov bi komkujiya helebçê re dibînê. Her wusa komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku komkujiya helebçê, weke komkujiyaka ku çerçoveya sernûxûmandina wê ya li demên pêşarojê jî bi gotinên olê li wê hatîya hizirîn a. Em mirovên ku di vê temenê de hizirîna, wilqasî ne mirovna biaqil in. Lê ji ber ku berê gotinan bi ber pêşîya wan de ya çendî ku di jîyanê de bin, ji wê rewşa gotinan ev feyz hatîya girtin û ew hatina bikarhanîn. Yanî, bi

gotinaka din, rewşeka bi dîmenî li ser gotinan re di vê çerçoveyê de bi awayekî xweza derketîya li holê.

Komkujiyên ku dihên kirin, dema ku mirov di vê çerçoveyê de li wan dihizirê, her wusa divê ku mirov li ser navan û binavkirina wan komkujiyan re pirr zêde kûr herê. Rêbaza îranê ya bi dervekirina ciwanên kurd jî, li vir, wê têgîneka pirr baş di vê çerçoveyê de bi xwezayî bide me. Mînaq, îran dema ku kurdekî digirê, nexwezê bêje ku ji ber ku ti kurdî ezê te bikujin. Li şûna wê, hênceteka din dide çêkirin. Ew jî, ew a ku li ser olê re dibêje ku ”li dijî navê xwûdê rabûya” û hwd. Di vê çerçoveyê wê hênceteka ku wê ciwanê kurd weke ”dij-ol” bide nîşandin, wê bike ku çê bike û bi wê hêncetê êdî wê rejima îranê wî ciwanê kurd biderve biike. Ev rêbaza rejima îranê, weke rêbaza Saddam ku di bin navê ´enfalê´ de oparasyonên jenosîda kurdan li darxist a. Her wusa di vê çerçoveyê de di jîyanê de weke ku ev herdû nêzîkatî hevdû temem dikin. Rejimên ku pirsgirêka wan ya kurd heya, di vê çerçoveyê de hertimî pêwîstî bi wê dîtina ku pirr zêde olê bikarbênin. Wilqasî zêde li olê xwe pêçana îranê, û bi rejima T. Ardogan re li tirkiya pêşxistina rêveberîya olî û hwd, hemû di vê çerçoveyê de bi pirsgirêka wan ya kurd ve girêdayî aliyên wê yên ku mirov hilde li dest hena. Ew rastîya olê ku weke maske bikardihênin, di bin wê de bi dehan komkujiyên ku van rejiman hanîna serê kurdan hena û vêşarî na. Di vê çerçoveyê de di serî de divê ku mirov bi kirin û politikayên wan re ji vê aliyê ve nêzîkatî û oldarîya van rejiman bike berlêpirsînê de. Ev rengê wê yê ku mirov wê bike berlêpirsînê de, wê ji aliyê politikî û hwd ve, wê gelek rastiyên vêşarî û sernûxûmandî raxê li berçav. Her wusa, rejimên herêmê ji ber çi di vê çerçoveyê de zêdeyî giraniyê didina pêşxistina rejimên olî. Çendî ku hewldanên demokratizekirina herêmê dibin, wê li wê hêtê van rejimên herêmê ku ev pirsgirêkên ên weke pirsgirêka kurd ku hena bikeve û bialiqê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman, ev mijara di bin navî de vêşarîna komkujiyan, weke rêbazaka jenosîdî a rejimên herêmê ya. Lê divê ku em mafê wê jî radest bikin, heta roja me, ev rêbaz bikarhanîna û her ku bikarhanîna jî gelek ancamên li gorî xwe jî bidest xistina. Di vê çerçoveyê de ew rêbazên jenosîdê ku bikarhanîna di bin maskeya olê de, bi wê heta roja me, gelek xalk û çand û ziman bi wê ji dîrokê birina. Minaq, her çar rejimên weke îran, tirkiya, sûrî û îraqê û hwd, zimanê kurdî qadaxakiribûn. Li tirkiya heta roja me jî qadaxaya ku bi zimanê kurdî xwe werênina ser ziman û vaazan bikin. Ji ber çi bi teybetî waazan qadaxa dikin, di vê zimanê kurdî de? Ji ber ku vê olê

bikardihênin û weke maske ji komkujiyan re bikardihênin. Dema ku di kurdî de ew waazkirin were kirin, wê weke ku temenê weke maske bikarhanîna olê wê ji destê wan herê. Ya ku mirov di serî de li vir bi wan re kifş dike jî ev a.

Komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de bi dîroka komkujiyên ku hatina hanîn li serê civatê kurdan re weke lebratuwarakê ya ku mirov dikarê ji wê gelek rastiyên bi vî rengî ên rejimên herêmê ji wê fahm bike ya. Ji ber vê yekê, komkujiya helebçê giring a ku mirov li ser wê bisekinê. Minaq, dema ku bahse komkujiya ermeniyan dikin, dikarin bi hêncetên weke ´dijberîya di nava du olan de" û hwd re werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de bi wê dijberîya olî dikarin li ser komkujiya ermeniyan binûxûmênin. Lê ev rewş bo komkujiya kurdan a helebçê, ne buhurê. Ya ku mijara fahmkirina komkujiya helebçê, giringtir dikê jî hinekî jî ev rastî na. Civate kurd, civateke ku pirranîya wê misilman a. Di nava wê de ji bawerîyên cuda jî hena. Lê pirraniya wê misilaman. Komkujiya helebçê, hatibû hanîn li serê misilmanên kurd. Ev jîî, weke rastîyaka giring ku mirov dikarê bi wê politikayên wan ên li ser olê re ku bi wê olê bikardihênin fahm bikin.

Di komkujiya şengalê û komkujiya kobanê de weke ku van rejimên herêmê ev alîyê rastîyê hinekî dîtibûn. Bo vê yekê, pêwîstî bi wê dîdtin ku ji şengalê bidest komkujiyê bikin û bikin ku pêşî weke mijaraka sansasyonal ku di çapameniya giştî a cihanê de cih bigrê. Ji ber ku kurdên êzîdî ne misilman in. Ew bawerîya cuda ya. Ev aliyê cudahîya bawerîyê di vê çerçoveyê de xwestibûn ku bikarbênin bi rengê weke ku "li dijî komeka ne misilman ev komên tundrew ev kirîya". Ev gotin, weke maskeyeka sernûxûmandinê ku di xwestin ku pêşî di ancama wê cihgirtina komkujiya şengalê di çapameniya cihanê de wê ancamê bidest bixin weke propaganda. Yanî, ev propaganda jî, aliyekî wê yê bikarhanînê weke maske hebû. Ji ber vê yekê û di çerçoveyê de, pêşî ji şengalê bidest komkujiyê kirin. Ji musilê destpêkirin. Herêmên asûrîyan rûxandin. Cihên dîrokî ên şariştanîya berê ya asûyîyan rûxandin. Ev, di vê çerçoveyê de weke propagandayên sansasyonal xwestibûn ku bikarbênin. Di vê çerçoveyê de di destpêkê de hêrîş ji şengalê li civate kurd dabûbûna destpêkirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de ew xesasîyetên olî ku pêşketina, xwestibûn bi awayekî ku weke sernûxûmandinê bikarbênin, xwestibûn, bikarbênin. Di aslê xwe de, hêrîşên ku piştre weke ku li Tunisê li muzaxaneya ´bodo´ û hwd ku dihatina kirin jî, bo ku di mejiyê mirovan de wê têgîna ´weke mirovên tundrew ên misilman ku

wê dikin´ bidina çêkirin ew kirin. Yanî, li vir, ew gotina ´tundrewiyê´ ya bi navê olê, bikardihênin. Wê çawa ji wê sûd bigrin û xwe di bin wê de vêşêrên û wê kujarîya xwe di bin wê de çawa vêşêrên, di wê çerçoveyê de ev kirina. Bo ku dûnya, wan qatilan weke ´tundrew´ nas bike, ew komkuji kirina. Ev, hemû di çerçoveya oparasyonên têgihê ên li mejiyan de dihên kirin. Rejimên ku DAÎŞ´ê û hwd, bikardihênin, di vê çerçoveyê de çerçoveya bikarhanîna olê pêşî di vê çerçoveyê de bi wan qatilan re diafirênin û piştre li ser wê re êdî karên xwe yên komkujiyê û hwd didina domandin. Her wusa, di serî de bo ku piştre komkuji kirin, di wê çerçoveyê de werina ser ziman û weke kirina ´tundrew´an were ser ziman û hwd, wê dikin. Yanî, rastîya xwe ya kujarî di bin wê de divêşêrên. Gotina ´tundrewîya´ olê bixwe jî, çawa di vê çerçoveyê de bi awayekî sînsî dihê bikarhanîn, mirov biawayekî vekirî kifş dike. Mirov, dikarê vê mantiqê hêrîsa li muzaxanaya li bodo´yê ya Tunusê, weke mantiqê ku di komkujiya kurdan de ku pêşî ji şengalê ji kurdên êzîdî destpêkirin werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê çawa kirinên weke kirinên ku hemberî hin kesên ku li dijî mirovên dij-ol in´ û hwd ku bidina nîşandin. Yanî, dîsa ya ku dihê dîtin ew a ku di xwezin ku wê întîbaya tûndrewiyê di mejiyê mirovan de bidina çêkiirn. Li ser wê re jî, xwe bidina jîyandin. Çavê mirovan bidna tirsandin. Her wusa, ku cihane îslamê li hemberê wan dernekeve û hwd. Di vê çerçoveyê de bo kirina komkujiyan pêwîstî bi li xwekirina gotina´tundrewîyê´weke kirasekî li xwe dibînin.Heta ku ew qatil, gotina ´tundrewiyê´ weke kiras li xwe nekin, wê nikaribin, wê komkujiyê bikin. Yanî, ev jî, weke rêbazek kirina komkujiyê û her wusa ya rejimên herêmê a çavtirsandinê ya.

Li vir, divê ku mirov hinekî din vegerihê li ser wê gotina kurdan a ku bo cihana îslamê digotin ku ”çima li ber komkujiyên ku dihên serê kurdan bêdeng in´” Her wusa li vir, di dewama fahmkirina vê rastîya bi gotina ´tundrewiyê´ ya ku dihê bikarhanîn weke maske re wê aliyekî wê were dîtin. Di vê çerçoveyê de ev gotina kurdan, wê bihêle ku aliyekî din ê vê nêzîkatîya rejimên herêmê were dîtin û fahmkirin. Ji ber ku ev gotinaka ku weke pirsekê ku dihê kirin,, di hundurê xwe de gelek rastiyên ku bi wê re werina fahm kirin di hawêne. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov di serî de vê yekê baş fahm bike.

Têgîna cihana îslamê di vê çerçoveyê de divê ku mirov bike berlêpirsînê de. Em jî, wê pirsê ji wê bikin. Ji ber ku li hemberê komkujiyên ku tên serê kurdan bêdeng in. Ne, di bawerîya wan de dibêje ku ´dema ku te mirovek kuşt weke ku tu mirovatiyê hemûyî bikujê weke

hevdû ya.´ Dema ku rastî ev bê, wê çaxê, bêdengî nabê gûnahek, sûcek û derketina ji olê bixwe jî? Belê, dibe. Lê li vir, dema ku mirov ji aliyê olê ve lê dinerê, mirov vê rastiyê dibînê û fahm dike. Lê ji wê zêdetirî, di dema ku mirov ji aliyê nêzîkatîya politikî a rejiman a nîjadperest ve ku li mijarê dihizirin, her wusa mirov rastî rewşeka din ya teybet tê. Têgîna ´yekîtîyê´ ya olî, hinekî jî di vê çerçoveyê de weke ku wê têgîna nîjadrestî ya ku tenê li xwe dihizirê, bi wê re weke ku hevdû şîr didin. Rewşek bi vî rengî bi wê re dihê dîtin li berçav.

Em bi komkujiya helebçê re her wusa vê rewşê dibînin. Di nava sînorê Îraqê de çawa ku di nêzîkatîyekê de nîjadperestî hatîya kirin bi maskeya olê de û dihê jîyîn, mirov wê bi wê bi rastîyê re wê baş kifş bike. Nêzîkatîya rêveberî ya desthilatdarî ku di temenê xwe de nîjadperestîyek hişk dihawêne, wê ol weke kirasê wê bê bijartin û were li wê kirin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku wê di vê çerçoveyê de di nava nêzîkatîya desthilatdarî de nîjadperestî û bawerî, bihevdû re were zewicendin. Ew gerdûnîya bi navê olê jî, wê tenê weke gotin û maske ji wê rewşê re bimêne. Wekî din jî, wê ti kar û erka wê zêdetir nemêne. Her wusa, wê sînorê berfirehbûna desthilatdariyê û hizirkirna wê bide dîyarkirin di çerçoveya sînor wê û nîjadperestîya wê de.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku komkujiya helebçê, wê weke mijaraka dîrokî, civatî û her wusa wijdanî, wê hertimî xwe bi êşa xwe re di nava wijdanê mirovatiyê de bide hiştin. Ya ku wê ti carî winda nebê jî, wê ew bê. Wê ew rastîya bi kirina komkujiya helebçê re bê. Komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov ji gelek aliyan ve li ser wê bihizirê. Her wusa, di vê ku mirov hem ji aliyê olî û bikarhanîna wê ve lê bihizirê. Divê ku mirov ji aliyê desthilatdarî û nîjadperestîya wê ya ku ew di temenê xwe de bikardihêne lê bihizirê. Divê ku mirov ji aliyê wijdanê mirov, nirxên mirovatiyê û rastîya rastteqînî ya mirovatiyê ya bi wijdan re jî li wê bihizirê. Her mirovê ketî farqe mirovatiya xwe de komkujiya helebçê, wê bê hinek ji wijdanê wan ê rast. Divê ku mirov di vê çerçoveyê de rastîya komkujiya helebçê baş fahm bike. Nêzîkatîya li helebçê û li komkujiya helebçê, wê nêzîkatîya mirovî ya biwijdanî û hwd jî bide dîyarkirin. Divê çerçoveyê de divê ku mirov biteybetî binxat bike û werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de komkujiya helebçê, weke komkujiyaka ku divê ku mirov li wê bi teybetî bihizirê û wê werêne ser ziman. Komkujiya helebçê, divê ku mirov tenê weke komkujiyekê lê ne hizirê. Divê ku mirov bi kirina komkujiyê re

weke pêvajoyekê li wê bihizirê. Her wusa, di hundurê wê ppêvajoya komkujiyê de jî, gelek komkujiyên ku em dema ku bahse navê komkujiya helebçê dikin ku bahse wan dikin in jç hena.

Her wusa, di vê çerçoveyê de dema ku mirov li komkujiya helebçê dihizirê, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku mirov rengê kirina sîyesetê a li rojhilat jê bi gelek awayên wê re kifş dike. Sîyeseta serdestbûnê û hwd, ku bi wê gelek xalk bi hebûna xwe re hatina kirin weke korbanê wê, di roja me de jî, weke qirêjîyekê li herêmê hebûna xwe dide domandin. Di ancama sîyeseta wê desthilatdarîyê de ev komkuji û gelek komkujiyên din hatina kirin. Di pêvajoya mudahaleya li Îraqê û li sûrî de bi milyonan kurd û ji xalkên din jîyane xwe ji dest dana. Her wusa, divê ku mirov di vê çerçoveyê de van komkujiyan hemûyan bi hevdû re hilde li dest û werêne ser ziman.

Komkujiyên kurdan, di xatekê de li dûv hevdû hatina kirin. Bi teybetî ji şerê cihanê ê yekemin û pê de, ew pêvajoya komkujiyên kurdan sal bi sal zêdetir bixwûnî domîya û heta ku hetîya li roja me. Di roja me de jî, bi heman rengî bi xwûn didomê. Pêvajoya komkujiyên kurdan, di çerçoveya ji dîrokê birina civate kurd de dihên kirin Her wusa,, civat, ku çendî di nava xwe de li ser partîyan re bûya qat, bi heman rengî rejimên herêmê jî bi sînorê di nava wê û civate kurd kişandina, bi wê re rengekî din ê bi dîmenî ê qatkirinê kişandina. Di vê çerçoveyê de, her beşa kurdistanê û civate kurd, ku di nava wî sînorê de maya, ew rejima ku li ser wê bidesthilatdar a, wê çawa wê civate kurd bike weke xwe û ji rastîya wê û nirxên wê dîrokê bike û wê her wusa bi rêbazên bişavtinê û hwd ku wê ji dîrokê bibe li wê dihizirê. Îran, di bin navê ”îranîtîyê” de wê dike. Tirkiya di bin navê ”tirkiyatîyê” de wê dike. Sûrî, di bin navê ”sûrîyatiyê” de wê dike. Îraq jî, di bin navê ”îraqîtîyê” de wê dike. Divê çerçoveyê de navê civate kurd bi ziman û nirxên wê re qadaxa kirin. Pêvajoyên jenosîdê cih bi cih bi bernemeyên bişavtinê û cih bi cih jî bi komkujiyên fizîkî ên weke komkujiya zilanê, komkujiya agirî, komkujiya botanê, komkujiya dersimê, komkujiya mihabadê, komkujiya şengalê, komkujiya helebçê, komkujiya kobanê, komkujiya qamişlo, komkujiya amûdê û hwd re didina domandin. Di vê çerçoveyê de rêbazên bişavtinê û cih bicih jî rêbaza komkujiyê ya bi fizîkî li hemberî civate kurdan hatina bikarhanîn ji aliyê her çar rejimên îran, tirkiya, îraq û sûrî ve. ..

Komkujiya helebçê, ji ber çi di nava van komkujiyan bi giringî derdikeve li holê. Giringîya wê ew a ku di şopa wê xate komkujiyê ya bi armmanca jenosîdkirna civate kurd de ew hatîya kirin. Her wusa,

teybetîyên ku em di kirina komkujiyên din de dibînin bi wê re dibînin. Bi wê re jî, li gorî demê rêbazê komkujiyên kurdan çawa dihên pêşxistin, mirov wê re jî wê kifş dike. Bi çekên kimyewî ên ku rejima Saddam ku ji welatên rojava ên weke Emerika, Îspanya, Almanya, Hollanda, Îngilistan, Japonya û hwd ku standina ve hatîya kirin. Yanî, di vê çerçoveyê de çerçoveya giştî a komkujiya helebçê, mirov bi têkiliyên rejimê ên bi qada navnetewî re kifş dike. Her wusa, piştî ku ev komkuji, hatîya kirin jî ji ber hebûna van welatên rojavayê û hinek welatên din ku têkiliya wan bi rejima baasê a saddam re hebû, ev komkuji, di çerçoveya rastîya wê de ne hatîya hanîn li ser ziman. Vajî wê, rastîya bi zihniyeta di temenê kirina wê komkujiyê de ku hebûya, weke ku bi zanebûnî hatibê pişt gûhkirin, ne hatîya hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de bi awayekî vekirî sernûxûmandinek hatîya kirin. Piştre, dema ku biryara mudahaleya li rejima baasê ji aliyê Emerika ve hatîya dayîn, hingî komkuji hatîya xistin rojevê de. Lê ew xistina rojevê de jî, di çerçoveya çêkiirna temenê wê mudahaleyê de bûya. Ji wê ne buhurî ya. Her wusa, ji ber ku tenê bo çêkirina temenê mudahaleyê were çêkirin hatîya xistin li rojevê de, êdî ew zihniyet û felsefeya ku bi wê komkuji hatîya kirin, ew ne hatîya ser ziman û ankû ji nedîtî ve hatîya dîtin. Ev jî, piştre bûya sedema domandina komkujiyên nû ên ku wê bên serê civate kurd di wê xate ku di wê de komkujiya helebçê hatibû kirin. Piştî komkujiya helebçê, wê tenê li başûrê kurdistanê bi dehan komkuji werina serê civate kurd. Ev komkuji, wê bi piçûkayî û mazinayîya xwe ve werina kirin heta wê dema derxistina DAÎŞ´ê ku êdî bi wê re wan komkujiyên ku dihênina serê kurdan bidina domandin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov pêvajoyê û rastîya pêvajoya komkujiya helebçê bi awayekî rast di çerçoveya rastîya wê de fahm bike û werêne ser ziman. Dema ku piştî roja 16´adara 1988´an ku weke roja dager(sembol) komkujiya helebçêyê ku piştî wê re di di 19´ê tabaxa 2014´an li şengalê û 15 êlûna 2014´an li kobanê pêvajoyak nû ya komkujiya kurdan were dayîn destpêkirin, kî dikarê li ser wê re bibêje ku bi rastî û li gorî rastîya wê pêvajoya komkujiya helebçê rast hatîya hanîn li ser ziman? Di vê çerçoveyê de li vir, hewceyî bi wê heya ku di çerçoveya têgîna ji helebçê heta şengalê û kobanê komkujiyên kurd, divê ku mirov lê bihizirê û wê werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov fahmkirinekê çê bike.

,

**Ji helebçe heta Kobanê û şengalê; bênavber pêvajoya komkujiyên kurdan ku li dûv hevdû didomîyan.**

Dema ku mirov li helebçe dihizirê, her wusa têgîna jenosîda civate kurd bi pêşketina wê ya bi dîrokê re dihê berbîra me. Komkujiya helebçe, komkujiyaka ku bi armanca jenosîda kurd civate kurd hatîya kirin a. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov di vê çerçoveyê de wê werêne ser ziman. Zihniyeta ku bi wê komkujiyên weke komkujiya helebçê(**16´ê adara 1988´an**), ´enfalê´ û hwd hatina kirin, bi heman zihniyetê hêrîşî rojava, kobanê(hêrîşên li kobanê di **15´ê êlona 2014**´an de bişitt destpê dike) û şengalê(hêrîşên li şengalê pêvajo bi pêvajo ji **19´ê tabaxa 2014**´an de destpê dikin) bûya bi DAÎŞ´ê, Em li vir, nikarin, wan ji hevdû dûr bibînin bi zihniyetî. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku miirov werêne ser ziman ku pêvajoya komkujiyên jenosîda kurd ên weke komkujiya helebçe û enfalê û hwd, hê jî bi safî û zelalî ne hatina zelal û safîkirin. Divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ev pêvajo, ji ber ku bi awayekî baş ne hatina şafî û zelal kirin, î ro em kurd bi civatî pêvajoyên komkujiyan ên weke komkujiyên li rojava û kobanê û şengalê dijîn. Di komkujiyên helebçe de jî bi hezaran keç û jinên kurd hatina ravandin û hatina birina welatên din ên araban û hwd. Her wusa, ev keç û jinên kurd li wan deran hatina firotin. Ev pêvajoya ku li şengalê û hwd, bi DAÎŞ hat hanîn serê civate kurd, weke dûbarekirina pêvajoyên komkujiyê ên di pêvajoyên komkujiya helebçe û enfalê de na.

Di vê çerçoveyê de dema ku mirov li wan dihizirê, her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku komkujiya helebçê, hê bi başî ne hatîya fahmkirin Hêzên li piştî komkujiyê bi zihniyeta wan re ne hatîya danîn li holê û ne hatina dîyarkirin. Aliyê komkujiya helepçê ê tirkiya ku di nav de ya û aliyê komkujiya helebçê û îran di nav de, ji xwe hîç bahse wan jî ne hatîyakirin. Di vê çerçoveyê de, di aslê xwe de dema ku mirov li pêvajoyên komkujiyên li rojava û kobanê û şengalê dinerê, mirov hinekî din di zihniyeta ku bi wê komkujiya helebçê hatîya kirin, hevnasînê dike. Ev zihniyeta ku di çerçoveya ´koalîsyonekê´ de li dijî kurdan şer dike û komkujiyan bi vî rengî dihêne serê kurdan. Komkujiyên weke komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi xate dîrokê re werêne heta serdema ku di wê de komkuji li rojava û kobanê û şengalê hatina hanîn li serê kurdan. Gotinek, di nava kurdan de heya ku hertimî dihê gotin. Dibêjin ku rojekê zilemek mirişka wî winda dibe lê negerihê. Roja din, bizinekê winda dike, ku dike ku li bizina xwe bigerihê, bavê wî jê re dibêje ku li mirişka xwe bigerihê. Roja sêyemin, mehek wî winda dike, dîsa dema ku ew diçê lê bigerihê bavê wî dibêejiyê de ku li mirişka xwe bigerihê. Roja çaremin ku çêlek û hasp bi hwd re

winda dibin ku dîsa zilam dike ku lê bigerihê, bavê wî dibeêjiyê de li mirîşka xwe bigerihê. Di dawîyê de kur ji bavê xwe re dibêje ku ´yabê, çêle û hasp windabûna di hê pey miriîşkê ketî´. Hingê bavê kur dibêje ji kur re ku ´dema ku pêşî mirîşka te windabû ku ti li wê gerîya ba û ew dîtiba, te yê î ro , bizin, meh, çêlek û hasp jî li dûv hevdû winda nekiriba.´ Bi vê minaqê re bav dixwezê ku ji kur bibêje ku di destpêkê de bi lêgerîna li mirişkê û dîtina wê re te yê bergira xwe bigirta û piştre te yê bizin, meh, çêlek û hasp jî winda nekiriba.

Heman rewş, mirov dikarê di çerçoveya komkujiyên kurdan de werênina ser ziman. Her wusa, em dikarin van komkujiyan bi dîroka wan re bibina serdemên berî şerê cihanê ê dûyemin. Dema ku komkujiya Dersimê hat kirin, li wê zêde ne hat lê pirsîn, piştre b dehan komkujiyên din heman rejima ku ew komkuji hanî serê kurdan, dîsa hanî serê kurdan. BI heman rengî mirov dikarê bahse komkujiya helebçê jî bike. Di dema ku komkujiya helebçêe ku hatî kirin de ku ew zihniyeta ku di temenê wê de bi yên ku ew kirina re bi hemû aliyên wê re hatiba derxistin li holê û hatiba eşkera kirin, î ro me yê dibê ku zêde bahse komkujiyên weke komkujiyên rojava, kobanê û şengalê nekiriba. Ev bi hevdû ve girêdayî na. Zihniyeta ku van komkujiyan dide kirin li ser serê civate kurd, hemann zihniyeta. Zihniyeta ku komkujiyên Helebçê kir, her wusa, divê ku mirov bi wê zihniyetê re zihniyeta ku li rojava, kobanê û şengalê ewqas komkujî kirina bi hevdû re weke yek zihniyet werêne ser ziman.

Î ro, di roja me de, em heman pêvajoyê dijîn. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê, baş werêne ser ziman ku komkujiyên Helebçê bi komkujiyên din ên weke komkujiya zilanê û Dersimê re, baş kiryarên wan hatiban derxistin li holê û hatiban eşkerakirin û hatiban teşîrkirin, di vê çerçoveyê de wê î ro, temenê ku li ser wê komkujiya kobanê û şengalê hatîkirin jî wê biheta teşîrkiirn. Yên ku ev komkuji li dûv hevdû kirina jî, divê ku mirov weke hevdû werêne ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku heman zihniyeta qirêj, namerdanê û pîs a ku komkujiyên weke komkujiya zilanê, komkujiya dersimê, komkujiya helebçê, komkujiyên li rojava ên kobanê û şengalê dide kirin a. Em nikarin van ji hevdû cuda werênina ser ziman. Her wusa divê ku em di dewama hevdû de wan werênina wer ziman.

Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de, em dikarin ji vê rewşê tiştekî weke fêr û ders derxin û werênina ser ziman. Di serî de bi têgînî, mirov dikarê bibêje ku ji wek epêvajoya jenosîda kurd, ji komkujiyên zilanê û heta komkujiyên dersimê û ji komkujiyên dersimê heta komkujiyên

helebçê û ji komkujiyên helebçê heta komkujiyên li rojava ên li kobanê û şengalê û hwd, weke pêvajoyek jenosîda kurd werêne ser ziman. Divê çerçoveyê de me dikarin bibêjin ku heta roja me jî, pêvajoya jenosîda kurd, hê jî didomê. Ev pêvajoya jenosîda kurd, piştî komkujiya helebçê, bi komkujiyên li rojava ên kobanê û şengalê û hwd re xwe dide domandin. Li bakûrê kurdistanê bi oparasyonên qirkirina sîyesî ênn rejima tirk re xwe dide domandin. Li rojhilatê kurdistanê bi dervekirina ciwanên kurd ên ji aliyê rejima îranê ve ku dihêkirin bi wan dihê dayîn domandin. Ev kirin û kiryar hemû, kirin û kiryarên ku em divê ku di çerçoveya pêvajoya jenosîda kurd de ku werênina ser ziman a. Di vê çerçoveyê de pêvajoya jenosîda kurd li başûrê kurdistanê, li rojhilatê kurdistanê, li rojavayê kurdistanê û li bakûrê kurdistanê xwe dide domandin. Di çerçoveya vê pêvajoya jenosîdkirina civate kurd de, ji aliyê rejima îranê, rejima tirk, rejima baasê a esas û rejima baasê îraqê ve ku zimanê kurdî hatî qadaxakirin, divê ku weke dûkument û aliyekî din ê temenê domandina jenosîda kurd mirov dikarê werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de, divê ku miirov bi heman reng û awayên wê re û her wusa bi hemû kirin û kiryarên ku wê re pêvajoya jenosîda kurd werênina ser ziman.

Ji komkujiya helebçêe û heta komkujiyên li rojava ên kobanê û şengalê û hwd, ev pêvajoya jenosîdê a li ser serê civate kurd ku dihê meşandin, divê ku mirov weke pêvejoyek teybet werêne ser ziman. Teybetîya vê pêvajoyê ew a ku ev pêvajo hê didomê ya. Di roja me, de di dema ku ez vê nivîsê dinivîsênim de ev pêvajoya jenosîd, hê didomê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê werêne ser ziman. Di aslê xwe di çerçoveya vê pêvajoya dawî a bi komkujiyên kurdan ên li rojava û li kobanê û şengalê re, mirov dikarê bibêje ku pêvajoya komkujiyên bi helebçê re jî hê didomê. Em nikarin bibêjin ku ppêvajoya komkujiyên helebçê, piştî salên 1988 û 1990 û hwd, dawî lê hetîya. Vajî, wê ev pêvajoya komkuji û jenosîda kurd didomî. Li başûrê kurdistanê, piştî komkujiyên helebçê re avabûna rêveberîyek kurdî, tenê bû weke rêbazeka sernûxûmandinê bo hêzên li pişt komkujiyê ku xwe di bin wê de biveşêrênin. Di vê çerçoveyê de û ji vê aliyê ve jî, divê ku mirov li avakirina rêveberîya kurd ya li başûrê kurdistanê bibînê.

Komkujiyên Helebçê, di dema ku hatibûbûna kirin de rejima demê ya Saddam Huseyin, bi rejima tirkiya re jî di nava danûstandinên li ser kirina komkujiyê de jî bû. Yanî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibêje ku heya rejima tirk ji wê komkujiyê û kirina wê hebû. Heta ku,

piştî oparasyona li Îraqê a duyemin ku bû, wezirê karê dervê ê demê ê tirkiya Abdulah Gul, derketibû berçapemeniyê û bahse wê danûstandina li serkirina komkujiyên helebçê ku bi wan re hatibûbûna kirin kiribû. Di wê çerçoveyê de bû û weke çerçoveye levkirinekê bû ku di dema ku komkujiyê destpêkiribû, rejima tirk sînor girtibûn û ne dihişt ku ti kurd ji sînor derbas bibin. Heta ku ji rayagiştî a cihanê deng derketibû û piştre li ser bertekna netewyên yekbûyî, mecbûr mabû ku sînor vebike. ya ku bi wê sînor nabûbû vekirin, ne mirovatî bû, ew bertekên ku li dijî wê hatibûbûna dayîn bûn.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku komkujiya helebçê, weke komkujiyeka ku dema wê pirr baş hatibû bi plankirin bû. Di wê dema ku hema bêja şerê di nava îran û îraqê de ku dawî ê hatibû, lê ku hê ne hatibû ragihandin ku şer bidawî bûya, di wê demê de di nava rejima îraqê ya demê y Saddam, ya îranê û ya tirkiya de li ser komkujiyaka bi vî rengî levkirin hatibûkirin ku wê weke "komkujiyaka ku di ancama şerê di nava îran û îraqê de hatî kirin´" wê bidan nîşandin. JI ber vê yekê bû, ku di wê dema dawiya şerê di nava îran û îraqê de ew komkuji hatina rasthanîn li wê demê. Di wê çerçoveyê de, weke komkujiyên ku di ancama şerê îran û îraqê de ku hatibûbûna kirin bûn. Di hundurê wan heftsalên ku di wan de ew şerê îran û îraqê di nava wan de didomîya, bi heman zihniyetê di awayekî levkirî a wan hêzên k bi hevdû re şer dikirin de, hem îranê ji aliyê kurd ji kurdan dikuşt û hem jî îraqê bi heman rengî ji aliyê kurd ji kurdan dikuşt. Divê çerçoveyê de, dema ku î ro, krinolojiyek di derbarê hemû mirovên ku ji herdû aliyan di hundurê heftsalan de ku hatîna kuştin de ku were derxistin, wê were ditin ku pirranîya mirovên ku hatina kuştin hemû kurd in. Lê ew komkuji hemû hemû weke rewşên şerê nava du dewletan de hatina piştgûhkiirn û ser wan komkujiyan bi vî rengî hatina girtin.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku komkujiya helebçê, hinekî jî van rastîyan hemûyan ve di temenê xwe de hê vêşarî dihêle. Hê yek jî ji van aliyan ne hatîya derxistin li holê. Hemû komkujiyên wan demên berî komkujiya helebçê, weke komkujiyên di nava şerê du dewletan de ku hatîya kirin hatina dayîn nîşandin. Lê zihniyeta ku di temenê vê yekê de, hinekî jî dema ku mirov li wê dikolê û dike ku wê fahm bike, mirov dibînê ku rastî pirr cûdatira. Her wusa, rastîya komkujiyên demên berî dema komkujiya helebçe bi vî rengî ser wan hatîya nûxûmandin di nava rûpelên dîrokê de. Komkujiyên helebçê, hinekî jî, rengê wê yê cuda hebû. Ew jî, ew bû ku çekên kimyewî

hatibûbûna bikarhanîn. Her wusa, di cihaneka ku pirranîyan dewletan xwediyê çekên kimyewî na, hinekî jî bo ku ser vê rewşê were sernûxûmandin, ev hat hildan li rojevê. Ji aliyekî din ve jî, weke temenê mudahaleya li îraqê hat hildan li rojavê. Wekî din, ji aliyê kirina li hemberê kurdann û jenosîda kurdan ve weke xwe ma.

Ku di çerçoveya jenosîda kurd de hatiba hildan, wê hingî, nîşanak biçûya tirkiya jî, îranê jî û sûrîya demê ku weke hevkarekî rojava jî bû. Lê di wê demê de, bia wayekî politikî, tenê komkujiya helebê, weke beşek ji jenosîda kurd, hat hildan li dest û li ser wê hat sekin in. Komkujiyên din ên ku hatina hanîn li ser serê civate kurd, yek jî ji wan ne hatîya hildan li rojavê di vê çerçoveyê de. Tenê, hildana komkujiya helebçê li dest, di aslê xwe de bû weke sernûxûmandinekê ji hemû komkujiyên ku rejimên din kirina jî Her wusa, piştî komkujiya helebçê û hildana wê ya li dest, weke ku êdî pirsgirêka kurd çareser bûyî û êdî ti komkuji nemana ku werina hildan li dest hat tevgerîn. her wusa, komkujiyên weke komkujiyên zilanê û dersimê ku di wan de bi sed hezaran kurd hatina qatilkirin, ji xwe bahse wan jî ne hat kirin.

Di aslê xwe de di vê çerçoveyê de hildan komkujiya helebçe li dest, mirov dikarê ji komkujiyên ku piştre li bakûrê kurdistanê ku rejima tirk hanîna serê kurdan, li rojhiatê kurdistanê ku îranê hanîna serê kurdan, li başûrê kurdistanê ku rejima îraqê hanîna serê kurdan û li rojavayê kurdistanê ku bi komkujiyên weke ên kobanê û şengalê re ku hê didomê ku hanîna serê kurdan, ji van mirov dikarê fahm bike ku ev tenê weke mijaraka politik hatîya hildan li dest. Her wusa, piştî komkujiya helebçeê jê li başûrê kurdistanê li herêma şengalê û herêmên din ên başûrê kurdistanê komkujiyên ku hatina hanîn li serê kurdan doman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku piştî komkujiya helebçê jî, ew komkujiyên ku hatina hanîn li serê kurdan dawî li wan ne hat hanîn. Ji ber ku ev komkuji, di çerçoveya ji dîrokê biirna kurdan de dihatina kirin. Komkujiyên tafisandina kurdan bûn. Ji ber ku komkujiyên bi vî rengî bûn, êdî domîyan. Piştî komkujiya helebçê, bi zihniyeta ku bi wê komkujiya helebçe hat kirin, komkujiyên nû hatina hanîn serê kurdan. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ev kirina komkujiyan, hê jî didomê. Ji ber ku aliyê komkujiyên weke komkujiya helebçê ên bi weke tirkiya û îranê ne hat derxistin li holê, êdî piştre jî, ev herdû rejim bi hevdû re li jî kurdan plan û programên komkujiyên ên weke bi destê DAÎŞ´ê û hwd bi hevdû re bi rêxistin kirin û li ser serê kurdan meşandin. Her wusa, vê pêvajoya ku di wê de DAÎŞ

hatîya derxistin li holê, divê ku mirov di vê çerçoveyê de weke pêvajoyaka ku di dema pêvajoya komkujiya helebçê de divê ku mirov hilde li dest û werêne ser ziman. Yanî, di vê çerçoveyê de pêvajoyaka domandina jenosîda kurd a bi demê re ya.

Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku pêvajoya jenosîda kurd a dawî ku em dijîn bi hêrîşên DAÎŞ´ê re, ji aliyê zihniyet û destpêkê ve, em dikarin destpêka wê bibina heta dema komkujiya helebçê. Em dikarin di vê çerçoveyê de weke ku çawa ku komkujiyên li rojava ên li kobanê û şengalê di dewama komkujiya helebçê de ku divê ku mirov werêne ser ziman ku fahm bike, bi heman rengî, ji aliyê hêzên ku ev komkuji kirina jî, em divê ku ji destpêka komkujiya helebçê hildina li dest û werênina ser ziman. Yên ku komkujiya helebçê bi hevkarî bi hevdû re kirin, ew ne hatina hanîn derxistin li holê. JI ber ku ne hatina hanîn derxistin li holê, êdî piştre ewên ku komkujiya helebçe bi hevkarîya hevdû kirin, piştre jî dawî li kirinên xwe li dijî kurdan ne hanîn û piştre komkujiyên weke li şengalê û li rojava bi kobanê hwd re ew dana domandin. Divê çerçoveyê de divê ku mirov di dewama hevdû de hilde li dest. Divê çerçoveyê de di dema komkujiyên li başûrê kobanê ên dawî û li şengalê û li rojavayê kurdistanê li kobanê û hwd, de divê ku mirov bibêje ku komkujiya helebçê 88 didomê. Komkujiya helebçê 88´ ji roja ku xwe ya di wê de bû, yanî ji sala 1988´an û heta roja me yanî sale 2015´an, û hwd, re di çerçoveyê de didomê. Her wusa, di vê çerçoveyê de em dikarin bibêjin ku ji sala 1988´an û heta roja me yanî 2015´an, ev 27 salên ku buhurîna, em dikarin weke salên ku di wan de komkujiyan helebçe bi rengê xwe yê ku hatîkirin û bi zihniyeta ku wê dike re didomê. Hê jî ew didomê. Komkujiya helebçê 88´ ev 27 salin ku didomê. Divê çerçoveyê de em divê ku vê pêvajoyê di vê çerçoveyê de werênina ser ziman.

Pêvajoya komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de weke pêvajoyaka jenosîda kurd ku heta roja me didomê, divê ku em di çerçoveya têgîna ´ji helebçê û heta kobanê û şengalê´ hilde li dest. Divê çerçoveyê de pêvajoya jenosîda kurd, ya dawî, ku ji komkujiya helebçê û heta roja me didomê, mirov dikarê werêne ser ziman. Komkujiya helebçê, dîroka wê di vê çerçoveyê de, piştî bûya wê û ber pêşarojê de ku heta roja me ku didomê, divê ku mirov wê hilde li dest. Her wusa, di vê çerçoveyê de, em divê ku di dewama komkujiya helebçê de komkujiyên li başûr û şengalê û li rojava û kobanê hilde li dest. Divê çerçoveyê de divê ku mirov wan werêne ser ziman. Dema ku em em van komkujiyên li başûr û şengalê û

li rojava û kobanê, tenê bi serê xwe ji pêvajoya komkujiyên ku hatina serê kurdan cuda hildina li dest, hingî mirov wê nikaribê wateyê bidiyê de û wê fahm bike û wê bi awayekî rast werêne ser ziman. Her wusa, divê ku mirov di dewama hevdû de wan hilde li dest û werêne ser ziman. Heta roja me, di vê çerçoveyê de ji komkujiya helebçe û bi vir de, bi taqandina bombayan û hwd re, pêşî temenê komkujiyên ku wê piştre bêkirin amede kirin û piştre li ser wê temenê re ev komkuji êdî kirin Yanî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Di pêvajoya mdahaleya li îraqê a Emerika de, gelekan digot ku ew bombayên ku li îraqê ditaqin, ji ber ku emerika keti wirde dibin. Lê ev bi tememî ne rast bû. Dema ku mirov rewşê bi tememî bi vî rengî werêne ser ziman, wê weke ku rewş bi rastî û baş ne hatibê xwandinê wê bimêne. Divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman.

Her wusa, di wê demê de jî, hemû bombayênn ku taqîna pirranîyan, li herêmên kurdan li kurdan hatina taqandin. Ên li li baxdadê hatina taqandin û weke ´şerê desthilatdarîyê´ hatina dayîn nîşandin jî, tenê ji aliyekî ve vê têgînê dihênina ser ziman. Lê ji gelek aliyên din ve jî, rastîya pêvajoyên hêrîşên li kurdan bi xwe re dihênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de, di dewama wan de hêrîş bênavber li kurdan hatina kirin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov pêvajoyê di serî de rast bixwêne û werêne ser ziman. Li vir, ya ku dihê ditin, ji meşandina hinek politikayên li dij kurd re ew rewşa ketina emerika a li îraqê de weke maske hatîya bikarhanîn. Mirov, vê yekê ji pêvajoya hêrîşên li kurdan û her wusa şerê dewletên herêmê ê bi kurdan re bi wê re fahm dike. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov pêvajoyê bi awayekî rast bixwêne û werêne ser ziman. Heta roja me,  ew pêvajo didomê. Dema ku em wê kirina ketina emerika weke maske ji hin politikayên dij-kurd re fahm nekin, ma emê çawa fahm bikin ku ew pêvajoya taqîna bombayan li îraqê û hwd, bi carekê vegerîya hêrîşên komkujiyê û jenosîdê ê li dijî civate kurd li başûrê kurdistanê û şengalê û li rojavayê kurdistanê li kobanê û hwd.?

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov pêvajoyê baş bixwêne û werêne ser ziman. Her wusa, di bin kîjan maskeyê de kîjan politika hatîya meşandin, divê ku mirov di serî de bi dahûrkirina sîyeset dewletên herêmê re fahm bike. Dema ku mirov li sîyeseta dewletên herêmê dinerê û hewl dide ku wê fahm bike, di vê çerçoveyê de biawayekî vekirî mirov rastî pêvajoyekê tê. Di vê çerçoveyê de miov dikarê hebûna tirkiya di nava wan bombayên ku li îraqê di taqin de fahm bike. Her wusa bi wê re ya îranê jî. Çend ku tirkiya ´hevkarê rojava(ewropa=emerika)´ dihat

hanîn ser ziman jî, di çerçoveya politikaya xwe dij-kurd de li îraqê, ew jî weke hêzeka ku bomba di taqandin hebû. Pirranîyan bombayên ku li herêmên kurdan û musilê tên taqandin di wan de ew bi îranê re heya. Her wusa, di nava hêza **ÎSAF**"´ de çûyîna hêzên tirk li Afganîstanê jî, di vê çerçoveyê de ji aliyê tirkiya ve hatîya bikarhanîn. Hinekî, li wir, li hemberî van komên tundrew bi serneketin, divê ku mirov bi helwestên welatên weke tirkiya û hwd re werêne ser ziman. Ji ber ku îraqê û hwd li ser wan komên tundrew politikayên xwe dimeşandin. Piştre jî, weke ku hat ditin bi DAÎŞ´ê û hwd re dihê ditin. Di politikayên li ser ahengê(dengeyê) û hwd di vê çerçoveyê de dimeşênin. ..

Di çerçoveya kiirna komkujiyên weke komkujiya helebçê û hwd de, di vê çerçoveyê de pêvajoyên ku hatina meşandin li hemberî kurdan, ew pêvajo, heta roja me jî bi komkujiyên ku di wan de dihênina serê kurdan re didom in. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku hêzên ku politika meşandin û bi wan politika komkujiya helebçê hatîya kirin, hê jî, ne hatîna derxistin li holê. JI ber ku ew ne hatina derxistin li holê, êdî heta roja me evqas komkuji li başûr, bakûr û rojava û hwd bi komkujiyên wele kobanê û şengalê re dihên serê kurdan. Bi dewamî kirina komkujiyan li ser serê kurdan heta roja me, di vê çerçoveyê de divê ku mirov hinekî bi dernexistina li holê û vêşarî mayîna wan hêzên ku bi hevdû re li piştî komkujiyê na re, divê ku bûyîna komkujiyên nû li ser serê civate kurd werêne ser ziman.

Li kurdistanê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku komkujiyên weke komkujiya zilanê, komkujiya dersimê, komkujiya helebçê, û piştre di dewama wan de komkujiyên li li başûr û şengalê û li rojava û kobanê ku dihên serê kurdan, divê ku mirov werêne ser ziman. Ev komkuji, hemû bi hevdû re di ahengekê bi plan û program hatina kirin û hatina hanîn li ser serê kurdan. Komkujiyên li başûr û şengalê û li rojava û kobanê, piştî civîna duyemin a konfaranse cenevê û hevdîtina rayadarên îranî û yên tirk bi serdana T. Ardogan a li Îranê re temenê wan hat avêtin. Piştî vê re, gav bi gav DAÎŞ hat mazinkirin û hat ajotin li ser serê kurdan. Komkujiyên ku î ro dihên serê kurdan, divê ku mirov weke komkujiyên wê çerçoveya hevdîtinên rayadarên tirk û îranî ên di dema serdana T. Ardogan a li Îranê û hwd werênina ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de ew pêvajoya ku birêz ocalan bo çareserkirina pirsgirêka kurd li li bakûrê kurdistanê bi rejima tirk re dabû bû destpêkirin, xwestibûn ku di vê çerçoveyê de bi planaka hêrîşkirina li kurdan, vegerênina pêvajoyeka weke ya şikandina Tamilîyan ji aliyê dewleta Srî-

lanka û hwd ve. Di vê çerçoveyê de êdî piştre pêvajo hûnandin û pêşxistin. Di vê çerçoveyê de êdî di çerçoveya domandina komkujiya helebçê de ev hanîn li holê û pêşxistin. Piştre hêrîş li kurdan destpêkirin.

Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ev zihniyeta ku temenê van hêrîşên li başûr û şengalê û li rojava û kobanê diafirêne, zihniyeta ku bi wê temenê komkujiya helebçê hatîya avêtin û pêşxistin a. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov pêvajoyê li dûv hevdû werêne ser ziman. Yekî ku li pêvajoyê binerê û pêvajoyê baş bixwêne, wê bibêje ku bibêje, ´ji pêvajoya komkujiyên helebçe û heta yên li roja me ku li başûr û şengalê û li rojava û kobanê ku tenê ji mejiyekî derketina û temenê mirovek wan bi stretejikî dizayn dike û dide kirin. Weke ku hemû ji mejiyekî derketibin, dihên ditin. Di vê çerçoveyê de weke ku ji heman mejiyê derketina, komkujiyên zilan û dersimê jî bi rengê xwe re dihên ditin. Her wusa, komkujiyên roja me ên kobanê û şengalê di vê çerçoveyê de weke ku ji heman mejiyê derketina. Dema ku mirov rewşê dike ku bixwêne û fahm bike, mirov wê vê yekê bi awayekî vekirî bibînê.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku komkujiya helebçê û piştre kirina komkujiyên li başûr û şengalê û li rojava û kobanê, û hwd, bi dervekirinên li rojhilatê kurdistanê ku rejima îranê dike û oprasyonên qirkirna sîyesî ên li bakûrê kurdistanê ku rejima tirk dike re divê ku mirov wan werêne ser ziman. Divê çerçoveyê de hevdû temem dikin. Her wusa bi zihniyetê hevdû temem dikin. Dema ku mirov bi çerçerçoveyî li van rewşan hemûyan dihizirê, mirov çerçoveya jenosîda kurd jî bi wê re kifş dike. Çerçoveya van kirin û komkujiyan hemû bi hevdû re, divê çerçoveya jenosîda kurd li dijî civate kurd.

Pêvajoya komkujiya helebçê, weke pêvajoyeka ku hê ne hatîya rohnîkirin, di dewama van komkujiyên ku piştî wê dihêna serê civate kurd de divê ku mirov werêne ser ziman. Çend ku bi xûrîxandina rejima baasê a îraqê û bidervekirina Saddam û Elî kimyewî re weke ku berpirsîyar werina bi dervekirin bûbe jî, ew tenê aliyekî komkujiyên kurd ê ku dihên hanîn serê civate diafirênin. Lê aliyên din ên ku bi wan komkuji dihên hanîn serê civate kurd û di dewama wê de na, û îran û tirkiya dide domandin û hwd, ew di rewşîyê de na. Ev aliyên pêvajoyên komkujiyên ku dihên serê kurdan hê di reşîyê de na. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku hê jî aqûbeta keç û jinên kurd ku di dema komkujiyên helebçê de ku hatina ravandin û firotina welatên arab û hwd, ne zelal û ne dîyar a. Ev alîyên komkujiya

helebçê a kurd, bi hemû çerçoveya xwe re hê di reşîyê de na. Dema ku ev alî hemû hê di reşîyê de bin û hê di dewam wê komkujiyê de hê komkujiyên ji wê maztir weke li kobanê û şengalê werina serê civate kurd, kî dikarê bibêje ku komkujiya helebçê hatîya zelalkirin û safîkirin? Ne ti kesek. Ti kesek nikarê bêje ku komkujiya helebçê tenê bi serê xwe jî ne hatîya zelal kirin.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov li ser rastîya komkujiya helebçê bi hizirê. Her wusa, komkujiya helebçê, bi kirina wê ya heta roja me re bi kobanê û şengalê û hwd re didomê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê di dewama komkujiya helebçê de bahse komkujiyên li başûr û şengalê, li rojava û kobanê û dervekirinên rejima îranê û oparasyonên qirkirina sîyesî ên rejima tirk bi oparasyonên wan ên leşkerî ên li dijî kurdan û li ser serê kurdan re divê ku mirov werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibêje ku komkujiya helebçê hê didomê. Hê pêvajoya komkujiya helebçê, bi zihniyet û hemû aliyên xwe re di kirinê û jîyanê de li ser serê kurdan didomê.

Pêvajoya helebçê, weke pêvajoyaka ku em divê ku mirov di çerçoveyekê de werêne ser ziman a. Her wusa, aliyên wê yên ku pirr zêde di reşîyê de mana hena. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku piştî komkujiya helebçê re, bi teybetî rejimên ku pirsgirêka wan ya kurd heya, di wê çerçoveyê de pêwîstî bi wê didîtin ku weke ku li giştîya îraqê û li herêmên kurdan bi taqandina bombayan re pêvajoyê bidomênin. Ji ber ku ew deronîya ku piştî komkujiyê li ser wan afirî bû bo ku wê bişikênin û pêvajoyê bidina domandin. Her wusa, di vê çerçoveyê de bo ku pêvajoya komkujiyê jî ji rêzê bidina nîşandin, hewldanaka bi vî rengî dana nîşandin. Gotinên rayadarên tirk, "her roj li îraqê mirov tên kuştin" ên di wê demê de weke ku bi wê re têgîneka hevbeş ya van hêzên ku bi hevdû re li dijî kurdan di nava tevgerê de bûn. Heman zihniyet, piştî ku hêrîş li kobanê zêde û piştre jî, hta rojevê, Çûyina T. Ardogan a li Firansa û li wir li berçapameniya gotina wî ya bi rengê "çî ya, hertimî win dibêjin kobanê û kobanê" hinekî jî di vê çerçoveyê de di dewama wê zihniyetê de divê ku mirov werêne ser ziman. Çend ku aliyê vê gotinê ê bi politikayên demê re hebe jî, aliyekî wê yê bi vî rengî jî hebû. ..

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku di dema komkujiya helebçê de, gelek komkujiyên ku hatina kirin û ji xwe bahse wan jî nayê kirin, hena. Minaq, komkujiyên ku heman rejimê di heman demê de hanîn serê kurdên şebekî û feylî hwd, wilqasî di vê çerçoveyê de di

rojevê de ne hatina ditin. Çend ku ev komkuji, di çerçoveya wê komkujiyê de hatina kirin jî, mirov nabînê ku ew hatina hildan li rojevê û li ser wan hatîya axiftin. Bi heman rengî komkujiyên hatina serê kurdên êzîdî jî divê ku mirov weke pêvajoyeka di dewama vê komkujiya helebçê de werêne ser ziman. Her wusa, li vir, ku bi gotinekê jî dibê, divê ku mirov bahse komkujiyên weke ên 14 tabaxa 2007´an ku hatina hanîn serê kurdên êzîdî jî bike. Ev, bi serê xwe pêvajoyek vê komkujiyê û pêvajoya kmkujiyê na ku mirov divê ku bi teybetî li ser bisekinê. PIştî komkujiya helebçê re kirina van komkujiya bi mazinahî û piçûkayîya wan re, armanca wan ew a ku piştî komkujiya helebçê û hwd re, wê deroniyê komkujiyê bidina domandin. Di vê çerçoveyê de dema ku ew komkujiyên bi mazinahî û piçûkayîya wan re ne kiriban, ma wê çawa piştre temenê van komkujiyên mazin ên li başûr û şengalê û li rojava kobanê bi afirandan? Her wusa, di vê çerçoveyê de jî, divê ku mirov wê vê yekê di çerçoveya politikayaka komkujiyê re hilde li dest û werêne ser ziman.

Politikayên komkujiya helebçê, ku piştî wê re di vê çerçoveyê de hatina meşandin, di vê xate kirina komkujiyê de êdî piştre temenê van komkujiyên piştre afirand. Her wusa, aliyekî taqandina bombayên li îraqê bi destê rejimê bixwe bê, û bidestê rayadarên tirk û îranî û hwd bê, hinekî jî di vê çerçoveyê de divê ku mirov hewl bide ku fahm bike. Î ro, bi hêrîşên DAÎŞ´ê û hwd re, ew asta hêrîşên bi vî rengî ên bi taqandina bombayan li îraqê û hwd, ku weke komên ´"terorîst" dihatina bi navkirin, di vê çerçoveyê de aliyekî wan ê di temenê domandina politikayên komkujiyê ên li ser serê civate kurd jî hebû. Di aslê xwe de dema ku mirov ji aliyê deronîya sîyesetê ve lê binerê, mirov dikarê zêdetir jî, di çerçoveya dijberîya li dijî kurdan bibînê. Piştre bi carekê re ew rewşa li îraqê kirina dijberî kurdan de û bi wê re afirandina DAÎŞ´ê û ajotina bi ser kurdan de, di vê çerçoveyê de bi rewşek bi politikatî divê ku mirov werêne ser ziman. Ji van aliyan ve û gelek aliyên din ve li ser zihniyetê û kirinên politik û hwd, mirov dikarê têkiliyekê di vê çerçoveyê de bi wê rewşê re ku piştî komkujiya helebçê li îraqê afirî, bi politikayên roja me ên di temenê komkujiyên kurdan de na, bi wan fahm bike. Li vir, di serî de, divê ku mirov ji gelek aliyan ve, van aliyan hilde li dest. Politikayên rejima tirk û ên rejima îranê, di vê çerçoveyê de, wê çerçoveyekê bi politikayên wan ên dij-kurd re bidina me.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov pêvajoya komkujiya helebçê, weke pêvajoyaka ku di çerçoveyê de bi zihniyetî û politikî ku heta roja

me didomê hilde li dest û werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de politikayên ku dihên pêşxistin, di çerçoveya domandina wê de xwe didina dîyarkirin. Her wusa, politikayên rejimên îran û tirkiya ên bi dervekirin û oparasyonên qirkiirna sîyesî û hwd re ku pêş dixin, bi politikaya jenosîda kurd ya ku bi destê DAÎŞ´ê didina meşandin re di ahengekê de ya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê ahengê jî bibîne û werêne ser ziman. Ev politika, di vê çerçoveyê de di çerçoveya domandina wê pêvajoya komkujiyên helebçê de jî têgînekê bi kirinên ku dihên kirin û politikayên ku dihên meşandin re mirov dikarê bibînê û werêne ser ziman. Her wusa, poliikayên domandina wê pêvajoyê, ji pêvajoya ku di wê de komkujiya helebçê bû û piştre heta ku dem tê sala 2014´an ku di wê de hêrîş li başûr û şengalê û li rojava û kobanê zêdetir dibin, wê di ahengekê de di vê çerçoveyê de xwe bidina dîyarkirin û domandin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî binxat bike û werêne ser ziman ku dema ku mirov li çerçoveya domandina van politikayan ji dema ku di wê de komkujiya helebçê bû û heta dema ku di wê de ku li başûr û şengalê û li rojava û kobanê ew komkujî û hwd bûn û hwd, ku mirov di berçav de derbas dike, mirov baştir fahm dike ku ji be çi ne hatîya xwestin ku bi tememî rastîya komkujiya helebçê were zelal kirin û safî kirin. Her wusa, divê ku mirov vê yekê di dewama wê de bibêje ku bo domandina van komkujiyên ji komkujiya helebê heta vê pêvajoya ku di wê de li başûr û şengalê û li rojava û kobanê ku komkuji dihên kirin, ev dihê kirin. Em li vir, êdî di dewama wê ve gotinekê bo pêşarojê werênina ser ziman ku bo ku karibin komkujiyên xwe ji vê demê û pê de jî, ber bi pêşarojê ve bibin, wê nehêlin ku rastîya politikaya wan ya bi li başûr û şengalê û li rojava û kobanê ku dihê ditin re were fahmkirin û ditin. Di vê çerçoveyê de wê bixwezin ku mejiyan tevlîhevbikin. Û ankû, weke ku rejima tirk dike, wê ji aliyekî alikariyê bide DAÎŞ´ê û piştre bi rengekî ê dirû wê bibêje "têkiliya me bi wê re tûna ya." Ev, weke politikayakê û rengê wê dihê bijartin û di kirinê de dihê meşandin. Çawa ku ne hiştin ku rastîya komkujiya helebçê û hêzên ku ew bi hevkarî kirina derkeve li holê bû temenê domandina wê politikaya komkujiyê ya heta li başûr û şengalê û li rojava û kobanê ku hêrîş bikin û komkujiyên nû werênina ser ziman, bi heman rengî ji nûha pêde jî li ser heman rêbazê re dikin bimeşîn. Çendî ku kirinên wan ne wina zelalkirin û safî kirin û ew hêzên ku wê komkujiyê dikin, ên weke îran û tirkiya û hwd ku ´li pişt perdeyê vêşarî´ bimênin, wê komkujiyên nû werênina serê civate kurd û gelên

herêmê. Ders û fêra ku ji komkujiya helebçê di vê çerçoveyê de ku pêşî were derxistin, divê ku ew bê ku rastîya wan bi awayekî ku were teşîrkirin bi politikayên wan re were eşkera kirin bo ku di rojên pêş de komkujiyên bi vî rengî ên nû newina serê civate kurd û xalkên din ên li herêmê.

Rastîya li pişt perdeyê ya komkujiya helebçê, hê ji sadî 90 wê vêşarî ma ya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ji ber ku vêşarî maya, êdî komkujiyên din li dûv wê dihên kirin li ser serê civate kurd û hwd. Weke ancama wê vêşarî hiştinê jî, divê ku mirov bi domandina van politikayên komkujiyê ên ku ji dema ku di wê de komkujiya helebçê ku bû û piştre ku li başûr û şengalê û li rojava û kobanê bi komkujiyên nû re dihê domandin, mirov fahm bike. Ev, di çerçoveyê de divê ku mirov wê hilde li dest û fahm bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de pêvajoya komkujiya helebçê, divê ku mirov bi komkujiyên ên berî wê ên weke komkujiya zilanê û komkujiya dersimê û hwd re, pirr zêde hilde li dest û zelal bike bo ku pêşîya komkujiyên nû were girtin. Ev jî, weke vabalekî li ser milê her mirovê ku piçekî bi wijdan a.

Pêvajoya komkujiyên li ser serê civate kurd bi komkujiya hebeçê re destpê nekir. Her wusa, pêvajoya komkujiyên ku dihên ser civate kurd jî, bi komkujiya helebçê re dawî lê ne hat. Piştre jî, hat domandin. Domandina wê jî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov hûr û kûr hilde li dest û şîrove bike, fahm bike û werêne ser ziman. Pêvajoya komkujiyên ku dihên serê civate kurd, piştî komkujiya helebçê bi 26 salan re li başûr û şengalê û li rojava û kobanê domîya heta salê 2014´an. Piştre jî, heta sale me ya ku em di wê de ya 2015´an jî didomê. Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku bi vê pêvajoya komkujiya a li başûr û şengalê û li rojava û kobanê û hwd re, ku heta roja me didomê jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de politikayên domandina komkujiyê hûr û kûr hilde li dest û werêne ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de ji komkujiya helebçê heta li başûr û şengalê û li rojava û kobanê û hwd domandina kirina komkujiyan, di çerçoveyekê de divê ku mirov werêne ser ziman. Vê pêvajoyê jî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov weke pêvajoya di dewama komkujiya helebçê de werêne ser ziman. Çendî ku pêvajoya komkujiya dersimê di dewamêya komkujiyên Zilanê û hwd de hat kirin, bi heman rengî, bi gelek komkujiyên din re komkujîya helebçê jî di dewamîya komkujiya zilanê û komkujiya dersimê de hatîya kirin. Her wusa di vê çerçoveyê de jî divê ku mirov bibêje ku komkujiyên li başûr û şengalê û li rojava û kobanê û hwd ku

heta roja me dihên kirin bi DAÎŞ´ê û hwd jî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov di dewamîya komkujiya helebçê de werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê werêne ser ziman ku ji dema komkujiya helebçê û heta roja me li başûr û şengalê û rojava û kobanê, pêvajoya komkujiyên kurdan bênavber didomê. ..

,

**Çerçoveya herêmî a hîmî ya komkujiya Helebçê**.

Dema ku mirov bahse çerçoveya wê ya komkujiyê bike, divê ku çerçoveya herêmî a hîmî ya komkujiya herêmê bi rejimên pirsgirêka wan ya kurd heya re werênina ser ziman. Lê ev tenê, dîsa weke aliyekî dimêne. Ji aliyê pergale giştî a navnetewî ku li gorî wê dîzaynek hatîya dayîn li herêmê jî, di vê çerçoveyê de jî, aliyekî bi pirsgirêkî ê pirsgirêka kurd derdikeve li holê. Di vê çerçoveyê ahenge jeo-sîyesî û jeo-ardnîgarî û hwd, di vê çerçoveyê de pêwîstî bi şîroveyekê bi xwe re di vê çerçoveyê de didina dîtin. Emê wilqasî zêde nekevina nava şîroveyek bi vî rengî ya sîyesî û ardnîgarî û hwd de. Li vir, bi çend gotinan jî bê, divê ku mirov li ser wê bisekinê.

Bi teybetî, piştî şerê cihanê ê yekemin bi perymana Sykoc-picot û piştre bi peymana Lozanê û piştî wê re jî bi paxta sadabadê û hwd, wê pergalek li herêmî were avakirin. Yên ku ev pergal avakirin di çerçoveyek metingerî de Ingilistan û Firansa bûn. Piştre di şerê cihanê ê duyemin û pê de, ewropa ku ji şerê nazîyan xûrîxî derketî, wê pişta xwe bide emerika. Ev jî, wê emerika pêşî weke hêzek avaker û piştre jî weke hêzek serdest wê bide dîyarkirin. Ew pergale ku Ingilistan û Firansa avakirî, wê emerika dewr bigrê. Piştre jî, weke fektoreke din avabûna yekîtîya sovyet û hwd jî, wê rewşê di çerçoveya li berhevdû sekinînê de bike pozisyonekê de. Di vê rewşê de, welatê ku hat qatkirin û herî zêde zirer ji vê rewşê dît jî wê kurdistan welatê kurdan bê. Ev rewş, wê weke rewşek ”mayinda” piştre xwe hebûna xwe bide domandin. Li rojhilat, welatên ku kurdistan û civate kurd di nava wan de hatî qatkirin ên weke îran, îraq, sûrî û tirkiya, wê rewşa şerê sar ê di nava rojava û yekîtîya sovyet sûd wergirin û wê bikin ku hebûna xwe biwî re bidina domandin. Di wan deman de, komkujiyên weke komkujiya zilanê(ji sala 1927´´an û heta sale 1930`î ev komkuji domîya), komkujiya dersimê(1937) û hwd wê bibin. Lê ev komkuji, wê yek jî ji wan nekeve rojevê de. Di van komkujiyên kurdistanîyan de wê bi sed hezaran kurd werina qatil kirin. Her wusa, piştre jî, ew pêvajoya komkujiyan domîya li ser serê civate kurd. Lê li hemberî wê ti deng derneketin. Ti hêzên rojava û herêmî û

hwd, deng li hemberê wê rewşa komkujiyê û kirina komkujiyê deng dernexistin. Her kesek, weke ku ti tişt ji xwe nebûyî, tev digerîya. Heta roja me jî, ev komkujiyên kurdan ku di wan de bi sed hezaran kurd hatina qatillkirin û gelek herêm bi gundî û bajarê ji naqşayê hatina birin, wê ti kesek di derbarê wan de ne xwediyê ti zanînê jî bê. Her wusa, navaroka van komkujiyan çawa bûna, ew weke mijaraka din jî ji xwe re dimêne. Lê di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibêje ku kurd, weke bi serê xwe di nava êş û komkujiyên ku dihên serê wan de dimênin. Heya ti kesekî ji wan nîn a.

Lê kurdan, hertimî li hemberê rewşên komkujiyê li berxwe dana. Dem bi dem hertimî dema ku rejimên ku civate kurd di nava wan de hatiya qatkirin ku bidest komkujiyan dikirin, kurdan li şûna ku xwe ji rejimekê li ya din bigrin, xwe disipartina çîyayan. Çîya, ji kurdan re di vê çerçoveyê de bûna weke parastgeh, sitergeh û cihên ku xwe di wan de ji komkujiyan xilas bikin in. Ev weke kevneşopîyekê wê di nava kurda de pêş bikeve. Di dema ku komare kurd a mihabadê(1943) hat avakirin û piştre ku ne bi demek dirêj re ji aliyê rjeima îranê ve xûrîxandin, wê di ancama wê de bi hezaran komkuji werina serê kurdistanîyan. Kurdistanîyên ku li berxweda, wê derkevina çiyayan. Di vê demê de mela Mistefa Berzanî ku di komare kurd a mihabadê de weke serokê wezirê parastinê û artişê jî bû, wê piştre tevgereka kurdistanî bide destpêkirin. Her wusa, piştre tekoşîna azadîya kurdistanê wê bide destpêkirin. Piştî ku komare kurd a mihabadê hat rûxandin, wî jî bi mirovên ku li dora xwe çûna çîyayên kurdistanê û dest bi tekoşîna çekdarî li hemberê rejimên herêmê ku kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin. Mele Mistefa Berzanî, piştre wê ji başûrê kurdistanê destpê bike. Wê di salên piştre de jî, wê PDK´ê temenê wê biavêje. Piştî wî re êdî wê ew tekoşîn were domandin. Tekoşîna azadîya kurdistanê, piştî komare kurd a mihabade re gihiştibû gîyaneka kurdistanî. Komare kurd a mihabadê, çend demeka weke 11 mehan jî li ser lingan mabû jî, lê ew dem têrê kiribû ki gîyaneka kurdistanî biafirêne. Piştre li herçav beşên kurdistanê wê rêxistinên kurdistanê ava biibin. Her wusa, rêxistinên weke Xoybûn ku ji dema komare kurd a araratê ve ku avabû hebû. Piştre, li ser wê kevneşopîyê wê li bakûrê kurdistanê, tekoşîna azadîya kurdistanê û civate kurd, weke ku çawa ku beşên din ên kurdistanê bi mele Mistefa Berzanî re destpêkir, wê li bakûrê kurdistanê jî bi ´partîya karkekên kurdistanê´ PKK´ê re destpê bike.

Piştre jî, wê civate kurd rabê serpîyan, şîyarîya ku hin bi hin di nava civate kurd de çê dibû, rejimên ku kurdistan û civate kurd di nava wan de hatî qatkirin jî aciz dikir. Bo vê yekê, wan jî, êdî bo ku wê şîyarîyê bi tamirênin, bidest komkujiyan dikirin. Mirovê ku dengê xwe derdxist, yan ji aliyê hêzên rejiman ve dihat qatilkirin û yan jî dihat girtin û dî heta dawiya jîyane xwe di zindanan de dima. Ev, piştre bûbû weke rewşek asayî ya di nava jîyane kurdistanîyan de.

Lê ev bergirên ku rejimên herêmê ên ku kurdistan û civate kurd di nava wan de hatî qatkirin ku pêşxistin, têrê nedikirin ku pêşîya tevgerî, pêşketin, şîyarî û her wusa tekoşîna azadîya kurdistanê ku kurd êdî dikin ku bidin bigirê. Bo vê yekê, divê ku mirov bibêje ku wê pêvajoyek nû di vê çerçoveyê de piştî komare kurd a mihabadê de wê di nava kurdan de, di mejiyê kurdan de û her wusa di jîyane kurdan de bide destpêkirin. Komare kurd a mibahadê, fêr û cerbeke netewî a kurdistanî û kurdî bû. Di vê çerçoveyê de pirr zêde di mejiyê kurdan de cih û war girt. Fêrên ji komare kurd a mihabadê, wê temenê wê şîyarîya destpêkê a di demê de bê. Her wusa piştre jî, wê kurd, li ser wê re êdî hin bi hin di nava xwe de xwe birêxistin bikin û rêxistinên xwe yên bo tekoşîna sîyesî û çekdarî bidina avakirin. Hêzên tekoşîna çekdarî ên ku mele mistefa Berzanî bi komare Mihabadê re pêxistibû ´pêşmerge´ pêşxist. Pêşmergê, bi gotinî tê wateya yê ku pêşî biçê mirinê ya. Piştre jî, wê li bakûrê kurdistanê, di pêşengîya tevgera azadîya kurd PKK´ê de tekoşîna ´gerîlla´ bêdayîn destpêkirin li hemberê artişa tirk li bakûrê kurdistanê. Ev pêvajo, her wusa, wê di demek pirr kin de di nava kurdan de deng vedê û wê mazin bibe. Bi girsebûna van tevgerên çekdarî, wê di demek pirr kort de bê. Her kurdê ku dengê wan bihîst û hiskir, di cih de bazî li nava wan. Hêsta kurdî ya ku pêşketibû, di temenê vê rastîyê de bû.

Ev pêvajo, çendî ji aliyê kurdan ve pêş diketin jî, ji aliyê rejimên herêmê ve jî hin bi hin bi rengna din xwe didan dîyarkirin. Minaq, rejimên herêmê, bo ku pêşketina pêşketina gel bikin, wê bidest komkujiyên di nava gel de bikin. Komkujiyên pêşî ku dikin, ên çavtirsandinê na. Komkujiyên piştre ên girseyî ên weke komkujiya helebçê û hwd, komkujiyên ku bi tememî ew civate ku şîyarbûyî ku were ji hevdû belavkirin û tûnakirin bûn. Di vê çerçoveyê de ev komkuji, wê her wusa, bi rengekî teybet xwe bidina dîyarkirin.

Li bakûrê kurdistanê, rejima tirk ku li demê belavkirî, wê di hundurê deh salên destpêkê ên ji sala 1984´an û pê de, wê ser 60 hezarî kurdan bikujê. Wilqasî jî, wê bigrê û biavêje zindanan. Ev tenê ên ku dihatina

zanîn. Her wusa, bi deh hezaran kuştin ku bi navê ”kiryar ne dîyar” hatina kirin. Her wusa, teybetîya van kuştinan jî, ew bû ku rayadarên dewletê ferman didan hêzên xwe ku wan jî diçû kurd dikuştin û bi awayekî bêdeng xwe ji navarokê didan windakirin. Êdî ew mirovê kurd ê ku dihat kuştin, weke ku ji aliyê hinek nayên zanîn ve dihatina kuştin diman. Ji ber vê yekê, ji wan re dihat gotin ”kuştinên kiryar ne dîyar.” Lê di aslê xwe de kiryar dîyar bûn. Kiryar, hêzn dewletê bûn. Dewletê(rejima tirk), ew bi plan dikir. Mirovên weke rewşenbîr, nivîskar, rojnemavan, ên pêşengên civatê û hwd, ku çend mirovên zane ên di nava civate kurd de hebûn, bi vî rengî hatibûbûna qatilkirin. Mirovên kurd ên bi rengê ′kuştinên kiryar ne dîyar” ku dihatina kuştin, mirovên kurdên bi vî rengî ên zane û pêşeng bûn. Konsepta rejimê a di temenê van kuştinan de ew bû ku bi wê digot ku ”şivan bikuja, kerî bêserî bihêle” bû. Bi vê mantiqê, ne tenê li bakûrê kurdistanê her wusa li başûrê kurdistanê û rojhilat û rojavayê kurdistanê jî, êdî wê rayadar û hêzên rejiman bidest kuştina kurdan bikin. Piştî ku Îraqê rejima Saddam dît ku wê ev rêbaz jî têra pêşîya girtina kurdan nekê û pê de, êdî bidest komkujiyên bi girrseyî kir. Her wusa, êdî wê pêvajoyên komkujiyên girseyî ên ku êdî ber bi komkujiya helebçê ve didin hanîn, wê destpê bikin.

Komkujiya Helebçê, wê bandûra wê pirr zêde hebe. Her wusa, li vir, divê ku mirov ji aliyê bandûra wê jî, gotinekê bibêjin. Di dema ku komkuji, hat kirin û piştre de wê di nava kurdan de deng vedê. Wê weke barqkeke ku li mejiyê kurd bivedê dibê. Bandûra komkujiyê wê hem kurdan, di mejiyê wan de hinekî şîyar bike û hem jî, wê di mejiyê de weke bîrîneka ku heta piştre jî ku wê xwe bide jîyandin bû.

Em dema ku bahse komkujiya helebçê bikin, divê ku em di vê çerçoveyê de bibêjin ku di vê dema ku di wê de êdî hin bi hin kurd dihatina xwe, wê ev komkuji, bê weke destpêke demeka nû di nava kurdan de. Her wusa, biqasî li başûrê kurdistanê, wê li beşên din ên kurdistanê jî wê bandûra wê bibê. Di dema ku komkujiya helebçê bû de, di destpêkê de wusa zêde di çapameniya cihanê de cih negirt. Heta ku hin çapameniyên ku dihanîn ser ziman, ew jî wê ne bi tememî werê hanîn li ser ziman. Yekîtîya sovyet, di dema ku nûçeyên komkujiya dihatina ser ziman, digot ku ”propaganda ya rojava ya.” Di vê çerçoveyê de bertek şanî dida.

Piştî avabûn û xûrîxîna komare kurd a mihabadê, em dikarin weke pêvajoyek piştre ya dîrokî di mejiyê civate kurd cih girt komkujiya helebçê, werênina ser ziman. Rejima baasê, bi vê komkujiyê re wusa

hizirkiribû ku wê bi tememî kurd werina ji holê rakirin bû. Her wusa, di vê çerçoveyê de wusa hizirkiribû ku wê ancamak baş bi dest bixista. Dema ku di wê de komkuji hatî kirin jî, ew jî bi awayekî pirr baş hatibû bijartin. Dema ku bo ku di wê de komkujiya helebçê bikin, ew dema ku hê rewşa şerê îran û îraqê, hebûna xwe diparast bû. Wusa hatibû, hasabkirin ku wê komkujiyê, weke komkujiyeka wî şerî bidina nîşandin bû. Di vê çerçoveyê de jî, hizirkirin û kifşkirin di meji de dihatina kirin. Heta ku divê ku mirov werêne ser ziman, di dema ku komkuji bû û piştre, gelek gotinên bi vî rengî jî hatina ser ziman. Çapameniya baasîyan di destpêkê de di vê çerçoveyê de hinek nûçe jî hata ku çêkirina. Lê piştî ku dîmenên komkujiyê di tv´yên cihanê de û piştre di tv´yên Îranê ên weke ´îrîb´ û hwd de weşîyan, weke ku rewşeka din êdî afirî bû. Êdî piştre, weke ku li ser sûc de werin girtin li wan hatibû. Wê çawa ew rewş ser wê bihata girtin, ketina nava hewldana wê de. Her wusa, ew rêbaza bi rengê ”pêşî komkujiyê bike û piştre înkar bike” ku di hemû komkujiyên kurdan re hatibûbûn bikarhanîn û rejima tirk, ew pirr zêde bikardihanî, di wê de jî, rejima baasê, serî li wê dabû bû. Heta ku digotin ku ”ev propaganda na.” Di vê çerçoveyê de dihanîn ser ziman. Yanî, red dikirin.

Di hemû komkujiyên kurdan re ´redkirin´ weke rêbazakê hatîya bikarhanîn. Her wusa, bi wê re jî, weke rêbazaka wê înkarkirinê jî, hertimî çi komkuji kirina, hewldana ku ti belge û dokument li holê di derbarê wê de nebin. Di vê çerçoveyê de pirr zêde bi xesasîyetekê tevgerîya na.

Li Îraqê, piştî komkujiyê bi demê re komkujiya helebçê, hat xistin rojevê de. Ew jî, wê bi hênceta temenê şerê kendavê ê yekemin ku were çêkirin bê. Di vê çerçoveyê de wê ew were kirin rojevê de. Çend ku di vê çerçoveyê de jî bû, hinekî di çapameniya cihanê de vê komkujiya kurdan di rojevê de cihgirt. Di aslê xwe de, komkujiya helebçê, di nava hemû komkujiyên kurdan de, yekane komkujiya kurdan bû ku care pêşî wusa hatibû xistin rojevê de û di çapameniyê de li ser wê dihat axiftin bû. Ya ku hinekî jî, ji aliyê kurdan ve giringîya wê radixist li berçav ev bû. Berî komkujiya helebçê komkujiyên weke komkujiya zilanê û komkujiya dersimê hatibûbûna serê kurdan. Komkujiya mehabadê hatibû serê kurdan. Her yek ji van komkujiyan, di wan de deh qatî komkujiya helebçê, di wan de kurd hatibûbûn qatilkirin. Lê ew ne hatibûbûna rojevê. Ew, ne ketibûbûna rojevê û li ser wan ne hatibû axiftin. Lê li ser komkujiya helebçê, hatibû axiftin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku weke ku çawa ku di komkujiya helebçê de çekên

kimyewî hatibûbûna bikarhanîn, di komkujiyên kurdan ên berî wê ên weke komkujiya dersimê û hwd de jî, gaz hatibû bikarhanîn. Dema ku bahse komkujiya dersimê dihatkirin, dihat gotin ku ”mirov tişî li şikeftan dikirin û devê wan digirtin û gaz di berdana hundurê wan şikeftan û ew mirov hemû weke haşaratan dihatina kuştin.” Gotina ”haşaratan” bi teybetî dihat bikarhanîn. Di vê çerçoveyê de, dema ku bi vî rengî bahse komkujiya dersimê dihatkirin, bi awayekî bixwezayî dihat ´îtîraf kirin´ ku li dersimê di komkujiyên wê de gaz dihat bikarhanîn. Ev pêvajoya dersimê û di komkujiyên wê de ku gaz dihat bikarhanîn, ti carî ne hat ser ziman. Lê komkujiya helebçê hat ser ziman. Gelek sedemên demî, sîyesî û her wusa sedemên ku bi wan şirketên ku çekên kimyewî firotibûbûna rejima baasê û hwd, di çerçoveya wan de bahse wê dihatkirin. Bi nîqaşên ku hatina kirin jî, ew bi tememî ji navê hatina dûrkirin.

Weke komkujiya kurdan ya pêşî ku wusa ´weke komkujiyekê´ ku hatî serê kurdan hat ser ziman. Lê di hanîna ser ziman de jî, tenê di çerçoveya sînorê îraqê de bi sînor mayîn bû. Bi wê re jî, çend ku di dema hanîna ser ziman a komkujiya helebçê de hemû rastî ne dihatina hanîn li ser ziman jî, lê dîsa weke aliyekî giring divê ku mirov binxat bike ku care pêşî wusa zêde komkujiyek ku hatibû serê kurdan ketibû rojevê de. Çend ku di çerçoveya hin berjewendiyna demî ên politik de jî bû, ew nîqaş bû bû. Di aslê xwe de ya rejimên herêmê pirr zêde aciz kiribû jî ev bû. Rejimên herêmê ên weke tirkiya ne dixwest ku ev komkujiya kurdan bikeve rojevê de. Di destpêkê de û piştre jî, rayadarên tirk, ne dihiştin ku di derbarê vê komkujiya kurdan de ti nivîsandin were kirin Ên ku di wê de bi nîvçûyî jî bê ku dikirin, hinek kurd bûn.

Ji ber ku dema ku dema bahse komkujiya helebçê dihatkirin, wan hinekî jî xwe di nava wan nîqaşan de didît. Çend ku bahse rejima baasê û komkujiya ku wê kirî a helebçê dihatkirin jî, îran û tirkiya, weke ku ji laşê xwe ve dixwerîyan. Wusa li wan dihat. Her wusa, dem bi dem, ji wan nîqaşan acizîya xwe hanîna ser ziman. Ji xwe, nîqaşên ku dihatina kirin jî, bi awayekî pirr bi heyîdar û baldarî, dihatinakirin. Her wusa, gotin, nêvî dihatina birrîn û dihatina ser ziman. Ji rejima tirk ku pirsgirêka wê ya kurd hebû, andamê NATO bû. Ya ku li berçav dihat girtin jî ev bû.

Di vê çerçoveyê de nêqaş, di sînorekê û çerçoveyekê de meşîyan û bûn. Lê çend ku di wan nîqaşan de hewl dihat dayîn ku navê îran û tirkiya newê ser ziman jî, lê ew pirr aciz bûn. Wan jî, xwe weke ku ´li ser

sûc werina girtin´ hîs dikirin. Di wê çerçoveyê de tevdigerîyan. Lê tenê li ber wê rewşê bêdeng diman.

Di mudahaleya duyemin a li kendavê û bi şerê kendavê ê duyemin re ku hêzên emerika ketina îraqê û Saddam girtin û ew hat derizandin û biderxistin bi ´ali kimyewî´ re, li hemberê wê berteka tirkiya bûbû. Tirkiya ji wê bidervekirinê, nexweşîya xwe hanîbû ser ziman. Her wusa, heta ku tirkiya rayadarên ew bertek biawayekî fermî jî dabûbûn nîşandin.

Piştre jî, di vê çerçoveyê de tevgerîya bûn. Li îraqê, pêvajoya piştî bi dervekirina Saddam, wê sal bi sal bi xwûn herê. Hinekî jî, divê ku mirov di çerçoveya wan taqînên bombayan de werêne ser ziman ku bi wan nîqaşan re ew deroniya ku di mejiyan de bi komkujiya helebçê re afirîbû, wê bê xwestin ku bandûra wê bitaqîna wan bombayên li îraqê û li herêmên başûrê kurdistanê ku dihatina taqandin re were buhurandin. Hinekî jî, aliyekî wan taqandinan di vê çerçoveyê de heya ku divê ku mirov werêne ser ziman. Ji ber ku pirsgirêka kurd hê ne hatibû çareser kirin û rejimên herêmê hê bi kurdan re şer dikirin. Di nava wî şerî de kurd dihatina qatilkirin Ji aliyekî din ve jî, ew kurdên ku dihatina qatilkirin, komkujiyeka wan hatibû nîqaşkirin, her komkujiya ku dihatkirin wê ew nîqaş bibîr bixista. Bo vê yekê, dayîmkiirna taqandina bombayan bo kirina ji rêzê ya wê rewşê û her wusa kirina komkujiyan û hwd, wê weke armanc bê bi wan taqînan re.

Di vê çerçoveyê de dema ku em bahse komkujiya helebçê bikin, divê ku em bi wê re pêvajoyekê şîrove bikin û werênina ser ziman. Di aslê xwe de bi komkujiy helebçê û rewşa wê ya ku bi wê re afirî, wê serdemekê di kirina komkujiyan li ser serê kurdan de jî bi xwe re bigrê û wê yekê vekê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi teybetî bahe komkujiya helebçê bike. Di vê çerçoveyê de komkujiya helebçê, rengekî pirsgirêka kurd jî, bi xwe re dabû bû li rû. Ya ku pirr zêde ji wê acizî dibû jî di aslê xwe de ew bû. Piştî şerê kendavê ê yekem, ku hêzên emerika mudahale li Îraqê kirin û xate ”hevrast a 36” çêkirin û bi wê re herêmên kurdan ji firîna firok û belafirên rejima baasê û hwd re girtin, ev wê weke aliyekî din ê vê rewşê bê.

Di aslê xwe de li vir di vê çerçoveyê de mirov divê ku hinekî din li ser wê taqandina bombayan bisekinê. Ji ber ku aliyekî wê yê ku li vir divê ku mirov li ser wê bisekinê heya. Piştî avakirina ´hevrasta 36´´ê, wê ew herêma kurdistanê a başûr, weke ku bigihijê ewlakariyekî. Cihan, hemû jî, di wê demê de çavên wan li ser wê heerêm bû. Her wusa, dem bi dem jî têkiliyên xwe bi wê re didanîn. Tirkiya û hwd, weke rejimeka ku

xwe ”aîdî” wê cihane rojava dihanî ser ziman. Di vê çerçoveyê de ew dijberîya ku wê dixwest ku hemberî wê rêveberîya kurd a li başûr bide nîşandin, ne dikarê bide nîşandin. Bo vê yekê jî, ew karê ku wê ne dikarî bike, li ser wan komên tundrew ên olî û her wusa wan komikên ku d nava îraqê de bomba di taqandin re dikir. Her wusa bib wan taqîna bombayan re weke ku valahîyek ji wan re dihat dagirtin. Her wusa ji vê aliyê ve jî, divê ku mirov li ser wan taqînan bisekinê. Piştî avakirina rêveberîya kurd a li başûrê kurdistanê, êdî ji tirkiya jî dihat xwestin ku têkiliyên xwe bi rêveberîya a başûr xwe baş bike. Lê ya ku wê ne xwest ku bike jî, ev bû. Lê ne dikarî ku rojava û emerika jî hilde hemberê xwe. Bo vê yekê, êdî rêyên ne fermî ên weke bi komikên ku bi navê sûnnîyan ku li îraqê bomba di taqandin, rwşeka nû pêşxistin. Hertimî ew taqandina bombayan bi navê ”sûnnîyên” li îraqê hat ser ziman. Lê li vir, çendî ew rast bû û ankû ne rast jî bû, ew jî weke mijarake di bin perdeyê de ma. Hê jî, ew di bin perdeyê de ya.

Li ser wê re jî gelek gotin jî hatina gotin. Piştre, mirovên ku weke serokên sûnnî na, li ser wan re lîstikên sîyesî di nava sîyeseta îraqê de hatina leyistin. Her wus mirovên weke ´tariq haşîmî” ku dihat gotin ku wî komikên çekdar avakirina û bombayan ditaqêne, di vê çerçoveyê de weke rewşeka ku piştre wê bi destê îran û tirkiya bêxistin temenê pêşxistina DAÎŞ´ê bi xwe de jî.

Ev pêvajoya taqandina bombayan a li îraqê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku gelek hêzên ku hê jî xwe vêşarî dihêlin di navê de hebûn. Her wusa, destê îranê jî û tirkiya jî di nava wê de bû. Yanî, weke ku li pişt perdeyê ´koalisyonek´ hebû ku ew bomba didan taqandin. Rewşa îraqê, yê bialoz dikir jî ev dordor bûn.

Hertimî, ji ber çi rewşa îraqê dihat bialozkirin? Ji ber ku di nava sîyeseta îraqê de îran û tirkiya hebû. Her wusa di nava sînorê îraqê de kurd jî bûbû bûna xwediyê rêveberîya xwe ya herêmê ya başûrê kurdistanê. Ya ku weke rewşek ne li gorî rengê hizirkiirna rejimên herêmê bû ev bû. Bo vê yekê, ew rewşa ku ne li gorî mejiyê wan û rengê hizirkirina wan, ji wan re bûbû armanc. Wê çawa ew ji holê rakiriban, li rê û rêbazên wê digerîyan. Her wusa, Nîqaşên tirkiya, ku bi navê xwe û îranê bi emerika û hwd dikir ku ´pêşmerga divê ku bê bêçekkirin´ wê bi sernekevin. Ev di dedestpêka şerê kendavê de jî û piştre di şerê duyemin ê kendavê de jî bû. Tirkiya, ji ber ku ew nekarî bikira, êdî li herêmên başûrê kurdistanê ên weke çoçamalê û hwd, ew hêzên ku xwe yên leşkerî li wir hişt, bi armanca ´sehêtkirina´ kurdên başûr.

Pêvajoya bi komkujiya helebçê û piştre bib nîqaşên li ser wê re ku bûbû û piştre ku bi mudahaleyên li îraqê re rewş û rengna din standibû jî, bûbû bû weke rewş û rengekî ku êdî sîyeseta herêmê dîzayn dike. Her wusa di vê çerçoveyê de hin bi hin kurd, derdiketina dika dîrokê, weke hêzekê. Rejima îran û tirkiya ku heta wê rojê kurd di bin komkujiyan de girtina û ne hiştina ku kurd bêhnê bitênin, piştî ku bi wê rengê li herêmê drketina derketina li pêş, wê êdî hasabê herkesekê ku li rojhilat bike ku ji nû ve di berçav de werê derbas kirin. Piştî salên 1990´î û pê de wê rewşa pirsgirêka kurd, êdî bê temenê mudahaleyên li herêmê. Rejimên herêmê ku ne dixwestin ku pirsgirêka kurd çareser bikin, wê êdî pêl bi pêl, rastî mudahaleyên li ser pirsgirêka kurd re werin. Pêşî li îraqê û piştre jî li sûrî. Her wusa, di vê çerçoveyê de rejimên weke rejima tirkiya û rejima îranê, bi tememî xwe di çerçoveya dijminatî û dijberîya statûya kurdan de bi pozisyon kirina, di vê çerçoveyê de wê herêmê bikina qada şer ku hertimî xwûn ji wê diharikê. Pêşî li îraqê taqandina bombayan, piştre derxistin û pêşxistina DAÎŞ´ê  û hwd, wê weke rewşna di vê çerçoveyê de ku di dewama hevdû de dihên pêşxistin bin. Hemû rewş jî, bi armanca pêşîya pêşketina statûya kurdan ku pêş dikeve bigrin bê. Piştî ku kurdan li rojavayê kurdistanê temenê statûyekê bidest xist û pê de, êdî bi dest şerê bi kurdan re kirin. Pirsgirêka kurd, bû wee pirsgirêkeka ku di giştîya herêmê de êdî xwe dide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de jî rejimên herêmê jî ku di giştîya herêmê de bi kurdan re şer dike DAÎŞ pêşxistin.

Komkujiya helebçê, bi xwe re pêvajoyek nû hanîbû. Ew jî ew bû ku êdî wê rejimên herêmê weke ku Saddam kir û bi çekên kimyewî û hwd hêrîşî kurdan kir û xwest ku komkujiyên mazin werêne serê kurdan. Lê li şûna wê, wê çawa li cihê wê ku komkujiyên mazin werêne serê kurdan, DAÎŞ, hat pêşxistin. Yanî, DAÎŞ, ew karê ku rejimên herêmê dixwestin ku bi kurdan bike, ew dike. Di vê çerçoveyê de weke rêxistinaka kontra ya ”teşeron” a. Ev rêxistin, weke rêxistinaka ku wê pêşîya pêşketina kurdan û statûya wan bigirê hatîya bi erk kirin. Di vê çerçoveyê de karekî wê yê ku rejimên herêmê dane pêşîya wê heya. Li rojavayê kurdistanê, hêrîşî kurdan dike. Li başûrê kurdistanê hêrîşî kurdan dike. Her wusa, li gelek deverên din jî, hêrîşî kurdan dike.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku komkujiya helebçê, wê di vê çerçoveyê de weke destpêka pêvajoyekê bê. Komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de bi xwe re weke ku pêvejoyek nû hanî.

Pêvajoya pêşketina kurdan a li herêmê, di vê çerçoveyê de dem bi dem pêş dikeve. Lê li hemberê wê di vê çerçoveyê de şerê rejimên herêmê jî didomê. Her wusa, DAÎŞ´ê divê ku miriov divê çerçoveyê de weke rastîya rejimên herêmê ên ku pirsgirêka wan ya kurd heyî divê ku mirov werêne ser ziman.

Pirsgirêka kurd, ji gelek aliyan ve hatiya afirandin. Aliyê herî mazin bi ser olê re ya. Em dema ku li rastîya komkujiya helebçê dihizirin, em vê aliyê li ser olê re bi awayekî vekirî pirr zêde mazin dibînin. Her wusa, di nava olê de, rejimên herêmê xwe kirina desthilatdar û li ser wê desthilatdarîyê re diçina bi ser kurdan de. Her wusa, diçina bi ser xalkên din de jî. Komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov hinekî din jî li ser olê re divê ku wê dahûr bike. Ji ber ku pêwîstî bi wê heya. Me li jor, li ser gotin û bi navkirinê re ku çawa rewşa ernûxûmandinê dihê xistin bi komkujiyên ku dihênin serê civate kurd, me hanîbû ser ziman. Li vir, ev rewş bi rengekî din jî xwe dide dîyarkirin. Her wusa, mirovekî birastîya rastî, dîrok û têgîna keseyetîya mirovê rojhilat bizanibê, wê van rastîyan zêdetir baş fahm bike. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werên ser ziman ku ol, wê di çerçoveyek pergalî a pirr ´komplîke´ de wê were bi rêxistin kirin. Her wusa, weke ku çawa dikarin êdî bi wê rewşa pergalî olê bikina di temenê kirina komkujiyan weke ku bi komkujiya helebçê re mirov dibînê, her wusa bi heman rengê dikina çerçoveya ser nûxûmandinê jî.Ev vê yekê bi awayekî vekirî dibînin. Her wusa rejimên herêmê di vê çerçoveyê de vê yekê jî pirr baş dikin. Hem rewşa xwe û hem jî kirinên xwe bi gotinên olê re dihênina ser ziman. Ev jî, dibê sedema ku bê lêpirsîn û sûal ku were herêkirin. Bi wê re ku çendî ew nêzîkatî û têgîna wan şaş û xelat jî bê, ku ji aliyê mejiyê mirov ve ê newê lê pirsîn. Têgîna bawerî û olî, hertimî pêşîya lêpirsînê digirê. Li rojhilat, ev yek, biawayekî vekirî hertimî bi dîrokê re hatîya kirin. Di vê çerçoveyê de dema ku komkujiyek weke ya komkujiya helebçê hat kirin û navê ´anfalê´ lê hat kirin, wê êdî mejiyê di mirovê olda ê ji herêmê wê li wê kirina komkujiyê lêpirsînê di mejiyê xwe de neke.

Ev rewşa olî, weke ku me hinekî li jor jî hanî ser ziman, di kirina komkujiya helebçê de û her wusa di komkujiyên din ên li herêmê de jî hatîya kirin. Her wusa, têgîna bawerîyê, di vê çerçoveyê de hatîya bikarhanîn. Heta vê roja me jî, dema ku oldarek, bahse komkujiya helebçê dike, bi dilwaswas û dûreparêzî nêzîk dibin. Bi dûraparêzî nêzîbûna wan, divê ku mirov di vê çerçoveyê de hilde li dest û werêne ser ziman. Her wusa, dûraparêzî nêzîkbûn, ji ber ku gotinên olê di

çerçoveya kirina wê de hatina bikarhanîn. Êdî mejiyê mirov, di wê çerçoveyê de dihizirê ku dema ku li ser wê gotinê bibêje weke ku li ser olê bixwe gotinê dibêje di xwe de hîs dike. Êdî dema ku rewş dibê ev, bi wê re bêdengîyê dibijêrê. Yan jî, dikarê kirina wê komkujiyê ”rast” bibînê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku mijara olî, di fahmkirina, mejiyê rejimên herêmê pirr zêde bikardihêne. Di vê çerçoveyê de heta ku mirov dikarê bibêje ku xwediyê kevneşopîyekê jî ya. Dema ku em vê kevneşopîyê lê bikolîn,ew rewşa olî ya ku di destê wan de ku ew bikardihênin weke´perdeyekê´ji kirinên xwe re ku mirov binê wê bikolê û hewl bide ku fahm bike, mirov wê rastî bi dehan komkujiyên ku kirina û di bin wê de di vêşêrên werê.

,

**Komkujîya Helebçê, kurd û kurdistan û bandûra komkujiya helebçê**

Di serî de divê ku mirov werêne ser ziman, ya herî zor hanîna ser ziman bandûra komkujiya helebçê ya. Bandûra helebçê, pirr mazin xwediyê deroniyekê ya. Gelê kurd, di bin wê deroniya giran de ew êşa komkujiya helebçê jîya. Li vir, divê ku mirov deroniya komkujiyê baş fahm bikin. Ya herî zore jî, ew a ku fahmkirina bahse komkujiya bi deronîya wê ya.

Her wusa dema ku ev kurd bê û mijara kurd û civate kurd bê, wê ew bahskirina li komkujiya helebçê, wê hê zortir bê. Ji ber ku dema ku em dîroka civate kurd dihildina li dest, em dîroka komkujiyên ku dihên serê civate kurd, berî komkujiya helebçê û piştî komkujiya helebçê jî ew heya. Di vê çerçoveyê de dema ku em bahse wê bandûrê û deroniyê bikin, divê ku em dîroka komkujiyan a berî û piştî komkujiya helebçê ku heya jî bibîr bikin ku wê bandûra wê jî di nava wê bandûra komkujiya helebçê de xwe bide dîyarkirin.

Di vê çerçoveyê de ew deroniya giran ya komkujiyê ya li ser serê civate kurd bi deroniyeka komkujiyê ya bi dîrokê re dijî. Ji komkujiya zilanê û komkujiya Dersimê ku di wan de bi sed-hezaran kurd hatina qatilkirin, wê piştre li ser wê re komkujiyên rojhilatê kurdistanê ên ku tên serê civate kurd wê bên jîyîn. Komkujiyên rojhilatê kurdistanê ên piştî xûrîxandina komare kurd a mihabadê ku ji aliyê rejima îranê ve dihên hanîn serê civate kurd, wê di wan de jî bi hezaran kurd werina qatil kirin. Ev jî, wê bi serê xwe deroniyekê biafirêne. Piştre wê bi destpêkirina tekoşîna azadîya kurdistanê re ew deronî werê şikandin. Her wusa, pêvajoya tekoşîna azadîyê ya li başûrê kurdistanê ku bi mele mistefa

Berzanî re û li bakûrê kurdistanê bi Abdullah Ocalan re, wê ji aliyekî ve bina bersivek jî ji wan komkujiyên ku dihên hanîn serê civate kurd. Piştî destpêkirina van tekoşînên azadiyê, wê hinekî jî bê, pêşîya komkujiyên mazin ên bi girseyî were girtin.

Gelê kurd, ji dema piştî şerê cihanê ê duyemin û piştre heta salên 1988´an, wê di nava pêvajoyaka bi vî rengî wê bijî. Ev pêvajo, wê kurdan weke ku ji nû ve biafirêne wê bike. Kurd, di vê demê de weke ku werina xwe wê li wan were. Her wusa, wê di hundurê vê demê de wê gelek pêşketin di nava kurdan de rû bidin. Bandûra tekoşînên azadiyê ên li cihanê bi rengê ´tekoşînên azadiya netewan´ û hwd, wê li pêşketinên di nava kurdan de jî wê hebe. Her wusa, li bakûrê kurdistanê jî, wê ciwanên kurd ên ku hinekî bi xwandinê û hwd bûna xwediyê têgînekê wê bikevina nava tevgerîyekê de. Her wusa, wê tevgerîyek di nava wan de çê bibe. Li başûrê kurdistanê ji salên 1970 û heta 1975´an û hwd, wê pêşketinên mazin bibin. Şoreşaka kurdistanê wê were kirin. Lê ew hemû jî, ji ber hê bêhêzbûna kurdan wê bi tememî bi sernekevin. Yan kû, bi serdikevin jî, hêza parastina wê serkevtinê û domandin û hanîna wê ya li pêşarojê nebê. Ev jî, bi bandûra komkujiyan re xwe tamirandina kurdan re xwe dide dîyarkirin. Weke ku kurd, di nava xeweka kûr de na, di rewşekê de na. Her wusa, di vê demê de wê pêvajoyak pirr giring di vê çerçoveyê de bi tekoşîna azadiyên kurdistanî re destpê bike.

Tevgerên azadiya kurdistanê ku di wê demê de destpê dikin jî, ji ber nezanî xwe û hwd, pêşde naçin. Ji ber ku di fahmkirina dîrok û rastîya civate kurd û li gorî tevgerînê de kêm in. Di fahmkirina serdemê û zanîn û asta wê de kêm in. Bi kevneşopîya komare kurd a Mibahadê li başûrê kurdistanê tevgera mela Mistefa Berzanî û li bakûrê kurdistanê tevgera azadîyê a PKK´ê wê weke dû tevgerên ku wê hin bi hin xwe pêş bikevin û karibin pêşde herin bin. Çerçoveya têgîna komare Mihabadê, wê çerçoveya têgîna tevgera Mela mistefa Berzanî bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de weke ku komare kurd a Mihabad, dimejiyê tekoşarên kurd de dibê weke rêşanîdan(manifesto)yaka nivîskî a şenber jî. Bandûra wê, di vê çerçoveyê de û ji wê maztir jî wê xwe bide dîyarkirin. Fêrên ji vê pêşketina bi komare kurd a Mihabadê re wê pirr zêde bin di mejiyê mirovê kurd de. Her wusa, rejimên herêmê jî vê yekê dibînin. Di aslê xwe de, wê çawa pêşîya wê bigrin, li rêyên wê digerin. Berî salên 1980´î û hwd, wê piçûk, mazin li başûrê kurdistanê rejima baasê, li rojhilatê kurdistanê rejima îranê, li rojavayê kurdistanê rejima baasê a sûrî û li bakûrê kurdistanê rejima tirk, wê komkujiyan bikin. Lê ev komkuji, wê

ancama ku wan dixwest, vajî wê bandûr di mejiyê kurdan de da çêkirin. Ew komkuji, bi armanca çavtirsandina civate kurd dihatina kirin. Lê piştî ku ew kmkuji hatina kirin û pê de, kurdan ji xwe dipirsin ku ka ji ber çi ew komkuji dihên kirin. Bi wê re jî, hin bi hin ew komkuji, çend ku êşeka mazin ya ku hatî hanîn serê civate kurd jî bin, wê di vê çerçoveyê de bandûrekê li mejiyê kurdan bike ku rabina ser xwe û li hebûna xwe xwedî derkevin.

Di vê navberê de ji salên 1980´î û pê de, şerê di nava îran û îraqê de ku bû, wê ser heft salan re bidomê. Di vê şerî de, wê herdû alî jî, pirr zêde kurdan bikujin. Ew şerê, bi awayekî di jîyanê de weke ku dihat xwestin ku bê dayîn domandin. Ji ber ku di nava wê rewşa şer de hem li başşûrê kurdistanê û hem jî li rojhilatê kurdistanê ku pêşîya tevgerna kurdî û kurdistanê ê azadiyê bigrin. Çend ku îran û îraq, di wê de bi hevdû re di şer de jî bûn, weke ku bi hevdû re di ahengekê de li hemberê kurdan di nava tevdigerîyan.

Dema ku em hewl bidin ku kronolojiyekê mirovên hatî kuştî karibin bo wê şerê di nava îraq û îranê ê heftsala de ku derxin, emê bi wê re bibînin ku pirranîya wan mirovên ku hatina kuştin, yan ji başûrê kurdistanê û yan jî ji rojhilatê kurdistanê na. Bi vê yekê, bi wê şerê, felîteyên li ser lingan ên kurdistanî ên civatî di nava wê şerê de hatina tafisandin. Di vê çerçoveyê de, di aslê xwe de ew şerê di nava îran û îraqê de weke şerekê ku di fîilîyetê de ku li hemberê kurdan bû pêşket. Ancamên wê pirr zêde li rojhilatê kurdistanê û başûrê kurdistanê civate kurd dîtin û kişandin.

Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku komkujiya helebçê jî, di wê di nava rewşek bi vî rengî de wê werin bi ber wê û kirina wê ve. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê bi şerê di nava herdû îran û îraqê de ku heya, wê bikina temenê kirina komkujiyên ku li hemberê civate kurd bikin. Weke ku çawa ew pêvajoya taqandina bombayên li Îraqê, bi DAÎŞ´ê wergerandin li pêvajoyaka şer ya li hemberê civate kurd li her çar beşên kurdistanê.

Di vê çerçoveyê de, di aslê xwe de pêwîstî bi wê heya ku ew pêvajoya şerê di nava îran û îraqê de divê ku were lêpirsîn. Hê gelek rastiyên bi vî rengî ku di bin rastîya wê şerê îran û îraqê de vêşarî mana. Her wusa, herî hindik, pêvajo çawa dem bi dem bi komkujiyan li ser serê civate kurd hat hanîn li dema ku di wê de komkujiya helebçê û ´enfalê´ hat kirin, di nava rastîya wê rastîya di bin wî şerê di nava îran û îraqê de vêşarî ya.

Em di vê çerçoveyê de divê ku pêvajoyê bi hevdû re hildina li dest. Her wusa, di salê ku wê komkujiya kurdan li helebçê û bajarên din ên başûrê kurdistanê destpê bike de, ji aliyê serokê îranê ê olî Humeynî ve ”fetwa”´ya serê civate kurd dayîn û bakirina şer li hemberê civate kurd li rojhilatê kurdistanê, mirov nikarê bi rasthatinake û çend bûyarên ku di wê de rûdana re werênina ser ziman. Ji wê zêdetirî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi teybetî, wê rewşa ”fetwa”´ya humeynî jî, di çerçoveya pêvajoya komkujiyên helebçê û ´anfalê´ de ku li başûrê kurdistanê destpêkirina de werênina ser ziman. Bi wê ´fetwa´´ya humeynî, wê meleyên rejimê û oldarên wê, êdî wê bidest ´propagandaya reşkirinê´ a li hemberê kurdan bike. Bi wê propagandayê, wê bi sedan kurd di wê demê pêşî li rojhilatê kurdistanê bên qatil kirin. Di destpêka şoreşa Humeynî de, Humeynî, bo ku alikariyê ji kurdan bigrê li rojhilatê kurdistanê, peyamên ku ji kurdan re dişand, di wan de bahse radestkirna maf û azadîya kurdistanîyan ên civatî dikir. Her wusa, kurd jî, bi wê bawerîyê tênin. Li ser vê rewşê, kurd, ji hinek aliyan ve wê alikariyê jî bidina bûyîna şoreşa li îranê jî. Piştî ku şoreş bû û humeynî hat îranê û pê de, wê weke ku êdî ew sozên ku wî di nava peyamên xwe de didana kurdan jibîrkirin Hin bi hin dem bi ser ve diçû, kurdan êdî bidest hewldana bibîrkirina wan sozên ku humeynî ku bi peyamên xwe dabû bûn dikir.. Kurdan, di gotina rayadarên rejimê ku ´humeynî, soz daya me ku wê mafên kurdan nas bike.´ Lê huymeynî, dixwest ku hinekî pêşî demê bi ser wê rewşê re bide buhurandin. Ji dema ku şoreş bû û pê de, çend sal wê buuhurin. Lê wê deng ji huyemnî dernekeve. Humeynî, wê bixwezê ku bêdeng bê. Li ser wê bêdengîya wî, ku kurdan êdî bi civatî bahse maf û azadîya xwe kir, êdî piştre humeynî, bo ku wan bertekên civatî bitafisêne, wê ”fetwa”´ya serê civate kurd bide. Li ser wê ´fetwa´ya wî, wê bi sadan kurd werina qatilkirin. Oldar û meleyên Rejimê wê bidest propagandaya li dijî civate kurd û navê kurd bikin. Di vê çerçoveyê de wê pêvajoyaka ´reşkirina navê kurd´ wê ji aliyê reyadarên îranê ve li ser wê fetwa´ya humeynî û propagandayên oldar û meleyên rejimê re wê bê kirin.

Em li vir divê ku vê yekê werênina ser ziman, di aslê xwe de, pêvajoya dijberîya li hemberê kurdan ya ku rejima baasê li başûrê kurdistanê bi oparaayonên ´anfalê´ û piştre bi komkujiyên helebçê re dabûbû destpê kirin, wê li aliyê rojhilatê kurdistanê bi rejima îranê a îslamî re jî di vê çerçoveyê de bi rengekî hebe. Her wusa di vê çerçoveyê de rewşek, hem ji aliyê rejima îranê ve li rojhilatê kurdistanê û ji aliyê

rejima baasê li başûrê kurdistanê wê bê destpêkirin. Ev pêvajo, weke ku bi hevdû re hatibûbûna destpêkirin. Gotina ´anfalê´ ku rejima Saddam li oparasyonên qirkirina kurdan a jenosîd dikir, wê li rojhilatê kurdistanê bi ´fetwa´ya humeynî a serê kurdan re xwe bide dîyarkirin. Her wusa, dema ku em rastîya vê gotina ´anfalê´ ya rejima baasê, ´fetwa´ya humeynî a serê kurdan li rojhilatê kurdistanê´, baş fahm nekê, mirov wê aliyekî giring ê şerê di nava îran û îraqê ê heftsalan fahm nekê. Ew şerê di nava îran û îraqê ê heftsala, weke ku ji herdû aliyan re bû temenê çêkiirna dizaynekê li hemberê civate kurd bi destê rejiman. Di aslê xwe de ew şer, pirr destê humeynî ve rehet kiribû. Humeynî, di dema ku soz dabûbû kurdan û piştî rejimê ku kurdan êdî bahse hanîna wan sozan li cih ji aliyê îranê dikir, wî şerî rûda.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku di vê çerçoveyê de em divê ku vê şerê di nava îran û îraqê de ji gelek aliyan ve hildina li dest. Em nikarin bi hênceteka weke ya bidest xistina ´şatû-l arab´ û hewldana ´kendavê´ re werênina ser ziman. Ji wê zêdetir, armanc bi vî şerî re hebû. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê şerê îran û îraqê, demeka dirêj, weke şerekî ”hevdû paritandinê” wê bidomê. Lê di aslê xwe de wan li şûna ku hevdû bi paritênin, wan kurd paritandin. Her wusa, ancamên wî şerî di nava heftsalan de wê li ser civate kurd xwe bide dîyarkirin.

Piştî ku şer ber bi dawiyê ve hat, îranê jî dixwest ku pêşîya xwestekên kurdan ênmaf û azadiyê bigirê renê, serî li çeka herî bi bandûra da û ol bikarhanî û ´fetwa´ya serê kurdan ji aliyê humeynî ve hat dayîn. Di wê çerçoveyê de li herêmê hêrîş li kurdan bûn. Bi heman rengî bi awayekê hemwaxt rejima baasê a îraqê, wê li hemberê kurdan oparasyonên ´enfalê´ li hemberê civate kurd bide dest pê kirin. Têgîna ´anfal kirin´a rejima baasê, û her wusa ´fetwa´ya serê kurdan a humeynî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de bihevdû re li wan bihizirê. Çend ku weke nakokîyên herdû rejiman bi hevdû re hebûn û hertimî nava wan nexweş jî bû, lê ku mijar dibû kurd bi hevdû re bûn. Her wusa ji rewşên hemwaxt ên weke ”têgîna ´anfal kirin´a rejima baasê, û her wusa bi ´fetwa´ya serê kurdan a humeynî kirina îranê” divê ku mirov di vê çerçoveyê de bi hevdû re hilde li dest. Pêvajoya bi ber kirina komkujiyên helebçê ve ku diçê, wê ev rewş û gotin, temenê wê bi afirênin. Her wusa, divê ku mirov li vir, hinekî din jî, li ser gotina ´anfalê´ re werêne ser ziman. Di wê de mê de jî, oldarên ku gotina ´anfalê´ di bihîstin, digotin ku ”şerê rejimê ê li hemberê çend ”bêola”n a. Di vê çerçoveyê de bahse wê dikirin. Gotina ´anfalê´,

întîbaya pêşî ya ku di serê wan de diafirand, ev bû. Bi vê yekê re, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku tenê bihîstina gotina ´anfalê´ jî bo wan sedema ne nîşandin û bêbertek mayîna wan bû li hemberê wê komkujiya ku dihat serê civate kurd bi armanca jenosîdê. Di vê çerçoveyê de ji ber ku ev rewşên bi gotinê re giring in, divê ku mirov baş dahûr bike û werêne ser ziman. Her wusa, rejima baasê, navê ´anfalê´ bikardihanî û komkujiyên jenosîdê li ser serê civate kurd dikir. Îranê jî, ´fetwa´ya serê kurdan dida. Li vir, ez divê ku vê yekê bi teybetî binxat bikim û bibêjim ku di dîrokê de du rêxistinan´fetwa´ya serê kurdan daya. Yek, serokê rejima îranê ê pêşî humeynî ya. Ya din jî, piştî wê fetwa´ya wî ya serê kurdan bi 26 salan re wê bi DAÎŞ´ê re xwe bide nîşandin. Her wusa, Ji ber vê yekê, dema ku em di vê çerçoveyê de li ser gotinên qatilên DAÎŞ´î dimeşê, di vê çerçoveyê de dîrok bi demê re mirov bi ber îranê ve didêt.  Em di vê çerçoveyê de divê ku di vê çerçoveyê de van rewşan baş lêbikolîn û fahm bikin. Humeynî, li şûna ku wê sozên ku di peyamên xwe de ku dane kurdan bihanîya li cih, piştre ´fetwa´ya serê kurdan dide.

Em divê ku van rewşan baş fahm bikin. Lê em dema ku hewl didin ku fahm bikin jî, nîşanak dighijina rejimên ku pirsgirêka wan ya kurd heya. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov rastîya komkujiya helebçê, dike ku fahm bike, mirov bi wê re gelek rastiyên dîrokî jî fahm dike.

Her wusa, di vê çerçoveyê de me hinekî li jor hanî ser ziman ku çawa bi gotinên olî çerçoveya komkujiyên kurdan çê dikin. Em divê ku vê rewşê baş bixwênin. Ev rewş, wê hertimî derkevina ber me. Di dema ´fetwa´ya humeynî a serê kurdan de, di dema oparasyonên rejima baasê bi gotina ´anfalê´ û her wusa piştre bi qatilên DAÎŞ´ê re bi heman rengî ´dayîna ´fetwa´ya serê kurdan û hwd re derdikeve li ber me. Ev rewş, hemû, hem ji me dixwezê ku mirov olê carek din hilde li dest bo rast fahmkirina wê û her wusa van rewşên ku li ser olê re ku bo çerçoveya komkujiyên kurdan biafirênin ew rewşên olî çawa dihên bikarhanîn, divê ku mirov li ser wan bihizirê. LI bakûrê kurdistanê, rejima tirk, wê li ser rêxistinên qaşo li ser olê re bi rêxistinkirina ên weke bi navê ´hizbillah´ ku kurd bi navê ´hizbil-kontra´ bi nav dikin re wê heman rewş xwe bide dîyarkirin. Ew rewşa bi vê çeteya kontra ya li bakûrê kurdistanê ku rejima tirk avakirî û kurd ji wê dibêjin ´hizbil-kontra´, bi armanca ku wê çawa li ser wê re têgînekê û dijberîyekê li ser olê re li dijî kurditiyê û navê kurd biafirênin. Armanca sereka ya vê rêxistinê û avakiirna wê ev a. Ev jî bo bikarhanîna olê li dijî civate kurd, ji wan re pêwîsta. Heta ku

dijberîyekê li ser olê re li dijî civate kurd û kurditiyê ne afirênin, wê nikaribin, komên çete û qatil ên weke DAÎŞ´ê û hwd pêş bixin ku li hemberê kurdan bidiina şer kirin. Hinekî jî, DAÎŞ û hwd, ancama vê politikayê ya. Divê ku mirov di vê çerçoveyê de wê hilde li dest.

Ev têgîna bi rejimên herêmê ên ku pirsgirêka wan ya kurd heya re ku dixwezin ku li ser olê re dijberîyekê li dijî ´civate kurd´ û navê ´kurd´ biafirênin, her wusa, li îranê bi ´fetwa´ya humeynî re wê di çerçoveya dijminatîya kurd a li ser olê re werê pêşxistin. Li îraqê rejima baasê bi rewşên weke oparasyonên jenosîdê ku navê ´anfalê´ û hwd li wann dike û her wusa li bakûrê kurdistanê rejima tirk li ser rêxistinên weke ên hizbil-kontra û û hwd re ku li ser olê re dihên pêşxistin re wê bibe. Armanca, vê dijberîya kurd a li ser olê re ew a ku bi navê civate kurd û bo parastina wê ku ti rêxistin û ankû tevgerên olî dernekevin weke di dema Şêx Seîd û hwd de bû.

Di vê çerçoveyê de dema ku em bahse komkujiya helebçê bikin, divê ku em van politikayên rejimên herêmê ên pirsgirêka wan ya kurd heya ku li ser olê re pêşxistina jî hewl bide ku fahm bike. Ev biserê xwe weke mijaraka ku divê ku mirov wê hilde li dest bo ku fahm bike. Li herêmê, di vê çerçoveyê de pergale olî, çawa weke pergaleka jenosîdkirina civatên herêmê ji aliyê rejimên herêmê ve dihê bikarhanîn, mirov wê bi rastîya civate kurd û komkujiyên ku weke komkujiya zilanê, komkujiya dersimê, komkujiya helebçê, piştre jî komkujiya şengalê û komkujiya kobanê û hwd re bibînin. Ev, weke aliyna giring ê ku divê ku mirov bi teybetî li ser wan bisekinê na. Ev alîyên politikî, bi îbretî, weke aliyna divê ku werina xwandina weke ders û fêrên dibistanan de bo fahmkirina rastîya dîrokê jî.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov rastîya komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de bi gelek aliyan re wê hilde li dest li dest. Di aslê xwe de komkujiya helebçê, û ankû pêvajoya komkujiyên helebçê, wê gelek rastîyên bi vî rengî ên rejimên herêmê jî raxê li berçav. Bo vê yekê ya, ku pirr zêde naxwezin ku ew rastîya komkujiya helebçê, ji komkujiyekê û kirina wê û pê de zêdetir were fahmkirin. Dema ku zêdetir hat dîtin û fahmkirin, wê ev aliyên wan jî bi wê re werina dîtin. Her wusa, ji ber çi naxwezin ku werê dîtin? Ji ber ku hebûna xwe li ser politikayên bi vî rengî didina domandin. Piştre, ji ber ku bi desthilatdarî, didina olê di vê çerçoveyê de. Pişta xwe nadina xalkan. Hebûna xalkan, weke têgînekê di nava têgîn û felsefeya wan de tûna ya. Bo vê yekê ya, ku pirr bi hesanî dikarin komkujiyên mazin werênina serê civatan û ji rêzê weke

komkujiyekê bidina nîşandin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku komkujiya helebeçê, pirr giringa ku mirov wê fahm bike ya. Wê komkujiya helebçê, gelek rastiyên têgînî ên desthilatdarîyên herêmê bi rastîya wan re bide dayîn nîşandin. Komkujiya helebçê, her wusa, di vê çerçoveyê de dide nîşandin ku çend ku rejimên herêmê xwe pirr ”oldar” didina nîşandin jî, ti eleqeya wan bi politikayên wan re bifelsefeya wê re tûna ya.

Bi vê aliyê re divê ku mirov hinekî li ser keseyetîyê re bahse vê bandûr û deroniya komkujiyê bike. Her wusa, ev jî, wê weke aliyekî giring ê vê mijarê bê ku divê ku mirov wê hilde li dest bê. **Bandûra** komkujiya helebçê ji aliyê wê yê deronî ve pirr zêde li ser civate kurd heya. Her wusa, dema ku em ji aliyê deronî ve li wê komkujiyê û ancamên wê dihizirin, em dikarin gelek tiştan bibînin û werênina ser ziman. Rastîya civate ku ratî komkujiyê hatî, di mejiyê mirovê kurd de bicih bûya. Her wusa di vê çerçoveyê de jî xwediyê deroniyekê ya ku hem bi wê ji rastîya xwe diravê û hem jî xwe di her kirin û rewşê bêrewş û hal hîs dike. Zû hêrsbûn û piştre bi xamgîn bûn û hwd, wê weke rengna deronî ên bi tevgerî ku mirov divê ku li ser wê bisekinê. JI van aliyan ve, weke keseyetîyek nexweş mirov dikarê bahse wê bike.

Lê ji wê zêdetirî, li vir, divê ku ez bi teybetî binxat bikim û werênima ser ziman ku têgîna ´komkujiyê´ weke fektorekê di mejî de di temenê ji rastîya xwe ravîna mirovê kurd de jî ya. Gelek caran, weke ancamaka vê rewşê ew bixwe jî ne di farqe wê rewşa xwe de ya. Her wusa, minaq, li tirkiya ku rejima tirk, herî zêde zimanê kurdî qadaxa dike, ku mirovê kurd di bin wê qadaxayê de herî zêde xwe li zimanê tirkî digirê û bi wê dike ku pêşketina xwe çê bike, hinekî di temenê wê de ku weke leyistikeka mejiyê wî yê piçûk ku bi wî dike ya. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov mijarê dihilde li dest, her wusa mirov vê rastiyê dibînê ku mirovê kurd, pirr zêde ji rastîya xwe diravê. Her wusa ew hêsta bi wî re ku bi zimanê serdestê xwe ê ku ew kuştî ku weke wî xwe bike û wê wî mazin bike di serî wî de weke hîsekê heya. Lê ew bixwe jî ne di farqe vê rastiyê de ya. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de di mejiyê xwe de ew deroniya ku ew di wê de ya, dixwezê ku bi vî rengî ji wê xilas bibe. Weke "model", bi deroniya xwe wê serdestê xwe ji xwe re weke model bijêrê û weke wî bi zimanê wî bijî. Ev, rastîya ku weke ancama deroni ya ji wê têgîna komkujiyê ya diserê wî de ya.

Di vê çerçoveyê de ´xwe weke serdestê xwe ditin´ û ankû ´ew weke model´ ji xwe re girtin, bi awayekî vekirî û hesanî, ji vê rengê keseyetîya

bi pirsgirêk re dibê weke "rêyeka xilasiyê". Ankû ew di mejiyê xwe de wusa hîs dike. Dema ku weke wî serdestê xwe dijî û zimanê wî dixwêne û dinivîsêne, dike ku weke wî xwe hîs bike. Lê çendî ku weke wî dijî jî, her dema ku di mejiyê xwe de ku bahse ´kurdîtîya´ xwe kir ûû ankû bi awayekî ku ji xwe re îtîraf jî nekê ku ji xwe re di mejiyê xwe de hanî ser ziman, wê ser wê rewşa xwe şibandina serdestê xwe û ankû ew weke model girtina di xwe de, di wê rewşê wê bê temenê wê hêsta xwe "kêm" hîskirinê. Her wusa di vê çerçoveyê de ev keseyet, êdî wê hin bi hin di nava xwe biqirifê û weke ku bişikihê wê lê werê. Yanî, ev hêst û ankû hîs, weke derbeyekê li wê ´modela´ ku ew di mejiyê xwe de ji xwe re digirê ya jî.

Li vir, ya ku mirov dibînê ku bi keseyetîyî, keseyetîya mirovê ku, weke ku li rêyekê xwe xilaskirinê bi deroni diigerihê. Lê di dîtina wê rêyê de, li rastîya civate hizirîn û bi dîrok û çand û zimanê wê re xwe ditin û pêşxistin û ankû xwandin û axiftin, di nava artartnetifên di serê wî de tûna ya. Her wusa, ji xwe, ev dev jê berda ku weke artartnatifekê bin. Her wusa, ew weke tiştna ku ew bi rastîya xwe ji wan diravê ya. Di vê çerçoveyê de civate ku rastî komkujiyê hatî pirsgirêka keseyetîyê ji aliyê deroni û van aliyên ku me hanîn ser ziman re bi gelek aliyên din re dikarê xwe bide dîyarkirin û bide nîşandin. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku rejimên herêmê ku civate kurd di nava xwe de qatkirina, di her demên weke cejna de kirina bûyarekê û anku komkujiyekê ku di temenê çêbûna xamgînîyekê di mejiyê vê keseyetîyê de bê. Her wusa, ev jî, weke rewşeka ku hertimî êdî ev keseyet ku bi wê rewşa xwe ya xirab re ku di nava xwe de bijî. Ev keseyet, êdî bi vî rengî ji her tiştî re vekirî ya ku bike û ankû werêne serê xwe bixwe.

Li kurdistanê, em dema ku di vê çerçoveyê de dihizirin, em dibînin ku ne tenê li îraqê di dema rejima baasê û hwd de, li tirkiya û îranê, wê hertimî di rojên weke cejna de wê komkujiyekê û ankû rewşeka weke wê ya ku bibe temenê xamgînîyê wê bikin. Li ser wê re, êşîya şahîya ku mirovê kurd di mejiyê xwe de bijî digrin. Her wusa, mirovê ku civate ku rastî komkujiyê hatîya di vê çerçoveyê de jî, weke pêşîya pêşketina wî ya di nava civate wî de dihê girtin. Lê bi wê re pêşîya jîyane wî ya di nava jîyane yê serdest de ku li gorî wê bijî û ankû bi zimanê wî bijî jî divekin. Ev rengên nbi komkujiyê û ankû ku em dikarin weke rengekî komkujiya deronî werênina ser ziman dihê pêşxistin li ser mejiyê mirovê kurd re. Mirovê serdest, vê rewşê, di çerçoveya deropêçkiirneka deronî de dike Her wusa, di vê çerçoveyê de êdî ew rewşa xwe ya civatî ku van

jîyankirinan ku ev keseyet xwe bi wê wastahî, û bêzar dibînê, piştî ku ket nava jîyane serdestê xwe de wê hingî bike ku bi wê êdî wê hêsta ´xwe xilaskirî´ bijî. Di vê çerçoveyê de êdî ew dihizirê û dike ku jîyanekê ava bike û piştre jî, wê jîyanê bijî. Piştre jî, ew bixwe êdî dil û can di wê çerçoveyê de jîyane xwe dide domandin. Ji ber ku dema ku li şûn xwe divegerihê û li wê civate xwe dinerê, wan jîyankirinên xwe yên ku di mejiyê xwe de jîyankirin û hwd dibînê. Êdî heta ku naxwezê ku li wan bihizirê.

Em dema ku di vê çerçoveyê de bi bandûra komkujiyên weke ên helebçê re li vê rewşê dihizirê, hingî, mirov rewşê baştir fahm dike. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku keseyetîyên civatên ku rastî komkujiyê hatina bêhtirî di nava hêstîyarîyekê de na. Hildan mijar û rewşan li dest jî, di vê çerçoveyê de hertimî bi hêstiyarî ya. Hertimî hildan komkujiya helebçê ji aliyê wê yê êş û hêstîyarî ve, têkiliyeka wê ya bi vê rengê rewşê ê bi pêşketina civate kurd ve girêdayî jî heya. Ji ber ku ew aliyê hêstiyarî û biêş, xîtabî, wê rewşa wî ya di mejiyê wî de dike.

Em dema ku bahse dîroka komkujiyên ku hatina serê kurdan dikin, em tenê bi kirin û her wusa rewş û dema wan re dihildina li dest. Lê ji aliyê keseyet û van aliyên deronî û hwd ve, heta roja me ti lêkolîn û hwd, li ser wan û civate kurd ne hatina kirin. Ji xwe, mirovê kurd, bi awayekî vekirî ji rastîya civatîya diravê û di mejiyê xwe de naxwezê ku wan aliyan bike. Heta roja me, ne kirina ti karî di vî warî de, divê ku mirov di vê çerçoveyê de biawayekî vekirî pirr zêde bi vê rewşa keseyetîya civate kurd ya ku xwe "aîdî" têgîna civate ku rastî komkujiyê hatî dibînê, werêne ser ziman. Ji ber vê yekê ya ku ev keseyet, di nava civate xwe de jî, li şûna ku ew divê ku pergale xwe ya perwerde ava bike û ankû di gelek warên din ên weke ên rewşenbîrî de xwe pêş bixe bi zimanê civate, li bendê ya ku yek were ji serdestî wî ji wî re bibêje ku va zimanê te êdî ne qadaxa ya û dê êdî xwe bi wê werêne ser ziman. Heta ku li bendê ya ku dibistan jî ji wî were werina vekirin. Û di wan dibistanan de heta ku pirtûkên bi zimanê wî ku ew di wan de perwerde bibînê jî, bi awayekî amedekirî û hwd ku hebin û hwd.

Di aslê xwe de ev keseyet, ku hemû tişt di vî warî de werê danîn li pêşîya wî jî, wê nikaribê pêşketinaka rast di nava civate xwe de bide çêkirin. Pêşî divê ku vê deroniyê ji ser xwe biavêje û wê kifş bike ku di vê ku ew li wan nirxên xwe bi kifşkirina wan di mejiyê xwe de li wan xwedî derkeve û wan pêş bixe. Di vê çerçoveyê de êdî wê karibê pêş bikeve. Di roja me de, gelek mirovên ku ji xwe re dibêjin ez nivîskarê

kurd im´ jî, bi zimanê tirkî dinivîsênin. Di jîyane xwe de carekê jî li helbestekê ji dengbêjekê ne hisandina û pirtûkek bi kurdî ne xwandina. Ji hisandina bi kurdî û xwandina pirtûkên bi kurdî, di mejîyê wan de weke hîsekê di çerçoveya "kêmbûnekê" de xwe dide dîyarkirin. Çend ku gelek ji wan dibêjin ku zimanê kurdî qadaxaya û bahsê dikin jî, lê di rastîyê de ti kesekî zimanê wan ji devê wan dernexistiya ku bi wê biaxifin û werênina ser ziman. Tenê ên ku nakin ew in. Yên din, bi gotinê dihênina ser ziman, hemû hêncetên ku ew dimejiyê xwe de ji wê xwe re ya bialoz û nexweş re ku dihênina ser ziman in. Di nava me kurdên botanê de gotinek heya weke gotinên pêşîyan ên xalkê. Em kurd, dibêjin ku "mirî dimirê, lê heta ku serê wî li heft hejan nekevê bi xwe nizanê.´. Her wusa rewşa van jî, di mejiyê wan de û bi keseyetîya wan re bi vî rengî ya.

Me ji komkujiya helebeçê destpê kiribû. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibêje ku deroniya komkujiyê ku li ser keseyetîyê afirîya, di roja me de li pêşîya pêşketina civatî bixwe jî di vê çerçoveyê de weke astangaka mazin a. Her wusa, komkuji, bandûra wê bideroniya wê re pirr giran a. Mirovê kurd, bi komkujiya zilanê re re bê, bi komkujiya dersimê re bê, bi komkujiya helebçê re bê, bi komkujiya şengalê re bê, bi komkujiya kobanê û hwd re bê, di vê çerçoveyê de bi dîroka komkujiyên ku hatina serê civate kurd re ev deronî pirr zêde afirî ya û heya. Çend ku bi tekoşîna salên dawî ên kurdistanî ên azadî û netewî ev deronî hinekî hatina dîtin û buhurandin jî, lê ji binî ve bi awayekî sernûxûmandî ji gele aliyan ve dihê jîyîn û pêşîya pêşketina civatî bi xwe jî ev digirê. Her wusa di nava deroniyeka bi vî rengî, rejimên herêmê hertimî xwestina ku olê li şûna wê bidina bicihkirin weke ”rêyaka xilasbûnê” û bi wê re ancamê li gorî xwe ji vê deroniyê bistênin.

,

**Bi dîroka komkujiyên ku hatina serê civate kurd re, Komkujiya Helebçê û pirsgirêka kurd**

Li vir, divê ku mirov di dewama mijarê de bi hebûna pirsgirêka kurd li herêmê hatî afirandin re em bahse komkujiya helebçê bikin. Di aslê xwe de ev alî, weke aliyekî giring ê dîrokî û bingihîn ê vê mijarê ya. Di vê çerçoveyê de divê ku mijarê bi dîroka komkujiyên ku hatina serê civate kurd re komkujiya helebçê, di çerçoveya pirsgirêka kurd de jî hildina li dest. Di aslê xwe de di vê çerçoveyê de mijar pirr berfireh û kûr a. Gelek tiştên ku ji aliyê civate kurd, herêmê û rejimên herêmê û sîyeseta navnetewî jî hena ku mirov divê ku bibêje û werêne ser ziman in.

Ev aliyê mijarê ê komkujiya helebçê, heta roja me, dema ku bahse wê hatîya kirin, kêm hatîya hanîn li ser ziman. Heta ku hîç ne hatîya hanîn ser ziman. Ti dahûrîyên rast û xort di vê warê de bi komkujiya helebê, dîroka komkujiyên ku hatina serê civate kurd û pirsgirêka kurd bi hevdû re ne hatina kirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman ku bi dîroka komkujiyên ku hatina serê civate kurd re komkujiya helebçê û hemû komkujiyên din ên k u hatina hanîn li serê civate kurd, di çerçoveya hebûna pirsgirêka kurd de hatina hanîn li serê kurdan. Ji ber vê yekê, bi awayekî rast li ser têgîna pirsgirêka kurd sekin in, di vê çerçoveya vê mijarê de weke mijar û bebateka pirr giring dibê. Dema ku em rastîya pirsgirêka kurd ku li herêmê hatî afirandin baş fahm nekin, emê bi awayekî rast, ne dîroka komkujiyên ku hatina hanîn li ser civate kurd fahm bikin û ne jî emê bi rastî hebûn û bûyîna komkujiya helebçê bi awayekî baş fahm bikin. Aliyekî pirr giring vê komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de bi gotina ´pirsgirêka kurd´ re divê ku miirov werêne ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê rastîya wê fahm bike.

Bi dîrokê re pisgirêka kurd, weke pirsgirêkeka herêmî ya dîrokî ya. Li herêmê, temenê gelek pirsgirêkên ku hatina afirandina jî. Her wusa, di temenê di xatekê de domandina dîroka komkujiyan li ser serê civate kurd û civatên din jî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Li vir, em dema ku li komkujiya helebçê, dihizirin, em dibînin ku gelek dordor, dibêjin ku komkujiya helebçê, hatîya rojev û êdî weke ku mijare ´çareser´ bûyî diaxifin. Lê divê ku mirov di vê çerçoveya komkujiya helebçê de werêne ser ziman ku komkujiya helebçê bi hemû komkujiyên din ên berî wê û piştî w ku bûna, weke ancam in. Weke ancama pirsgirêka kurd û afirandina wê na. Her wusa, di vê çerçoveyê de êdî pirr giring dibê ku mirov fahm bike ku bi kîjan argûmanan wê komkujiyê temenê bi wê rêxistin dikin û dihênin ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov dûbare werêne ser ziman ku ji ber ku pirsgirêka kurd li herême ne hatîya çareser kirin, piştî komkujiya helebçê re bûyîna komkujiyên ku dihêne serê civate kurd dawî li wan ne hatîya. Komkujiya şengalê û komkujiya kobanê û li başûrê kurdistanê, li rojavayê kurdistanê, li rojhilatê kurdistanê û li bakûrê kurdistanê, piçûk mazin komkujiyên din ku bûna û dibin, divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de ji kirina komkujiyên şengalê û komkujiya kobanê ku heta di roja newroza 2015´an de çeteyên

DAÎŞ´ê li herêmên rojavayê kurdistanê bombayan ditaqênin û 17 kurdistanîyên sivîl ku newrozê pîroz dikin ku qatil kirina wan, hemû jî bi rastîya afirandina pirsgirêka kurd ve girêdayî na. Çend ku kirasê olî li wan komkujiya dihê kirin jî, di temen de bi pirsgirêka kurd ve girêdayî na. Ev rewş jî, ji aliyekî din ve, bikarhanîna olê weke maske li ser komkujiyan û kirina re ku çawa dihê kirin dide nîşandin. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi dîroka komkujiyên ku hatina û hê dihên serê civate kurd li kurdistanê, bi wan re werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de sedemên ku di temenê kirina komkujiya helebçê de di serê rayadarên rejima baasê de hebûn, di serê çeteyên DAÎŞ´î û rejimên li pişt perdeyê ku DAÎŞ´ê didin şer kirin de jî heya. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê divê ku mirov mijarê di çerçoveya têgîna ´pirsgirêka kurd´ de hilde li dest û werêne ser ziman.

Pirsgirêka kurd, dema ku em li dîroka wê û dîroka afirandina wê ya hemdem dinerin, her wusa ji şerê cihanê ê yekemin ve, dem bi dem wê komkujiyên mazin werina hanîn li serê civate kurd. Komkujiya agirî, komujiya botanê, komkujiya zilanê, komkujiya dersimê û hwd, heta ku dem tê dema ku di wê de komkujiyên helebçê dihên kirin û hwd, di vê çerçoveyê de bi pirsgirêka kurd re divê ku mirov werêne ser ziman.

Pirsgirêka kurd, di sedsala 21ê de jî didomê. Her wusa, li rojhilat bi giştî û herêmê bi rejiman û hwd, pergalên ku hatina afirandin, li ser tûna hasibandina kurdan hatina avakirin û pêşxistin. Îraqê, di çerçoveya zihniyetek arab de hatîya pêşxistin. Yên ku li dijî wê derdikeve û ne arab a, wê were kuştin, weke ku li helebçê bû. LI îran, hertiştî li gorî farisîtîyê birêxistin dike, dema ku kurdan civate maf û azadiya xwe kir, wê di temenê dijberîyê de mirovên weke humeynî wê ´fetwa´ya wan bidin û qatil biikin. Li tirkiya, hertişt, li gorî tirkitiyê û nîjadperestîya wê hatîya şîrovekiirn û ser ziman. Yekî ku ne tirk bê û weke ku kurd bê ku doza maf û azadîya xwe bike, wê rastî komkujiyan were. Were girtin û bê avêtin li zindanan û hwd. Heman rewş, wê bi heman rengî li Sûrî jî xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de ew zewicandina ku rejiman bi hebûna xwe re bi olê re kirina ku bidina çêkirin û ankû ku çêkirin, li ser wê re dijberîyê li cudahiyên din ên xalkî û bawerî diafirênin û bi wê re wan tûna dikin.

Di vê çerçoveyê de dema ku em kurd dibêjin ”pirsgirêka kurd, pirsgirêka maf û azadiyê ya´, em di vê çerçoveyê de van rastîyan hemûyan di berçav de derbas dikin û di wê de dihênin ser ziman. Her

wusa di vê çerçoveyê de em bahse rastîya pirsgirêka kurd dikin. Li vir, divê ku mirov dûbare werêne ser ziman, em î ro di sale **2015**´an de dijîn. Lê hê civatek weke civate kurd ku ser 40 milyonî re ya, di nava pergaliyên rejimî ên herêmê de ku hatina avakirin de hatina dorpêçkirin û zimanê wan hatîya qadaxa kirin. Her wusa di vê çerçoveyê de heta vê demê jî zimanê kurdî qadaxa ya û kurd nikarin bi zimanê xwe perwerde bibînin û pêşketina xwe bi ber pêşaroja xwe de bidina afirandin û çêkirin.

Ev rastî, hemû weke rastîyna ku em bi gotina pirsgirêka kurd a di temenê kirina komkujiya helebçê de ya weke ku di temenê hemû komkujiyên din de ya, werênina ser ziman. Komkujiya hebebçê, di vê çerçoveyê de mirov bi rastîya pirsgirêka kurd re rû bi rû dide hiştin. Her wusa, komkujiya helebeçê, weke hemû komkujiyên din ku hatina hanîn li serê civate kurd, di çerçoveya ji dîrokê birina civate kurd de hatina kirin. Komkujiya helebçê, weke komkujiyeka ku hatîya serê kurdan a. Lê ev komkuji, ji ber kurdan gotin ´em kurd in´ ew komkuji hatina hanîn li serê wan. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ji ber ku ew kurd bûn ew komkuji jînkirin. Yanî, ev komkuji, weke komkujiyên ku hebûna kurdan bi nîjadî armanc digirê na. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov rastîya wê werêne ser ziman. Komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de weke rastîya biêş ya kurdan û ji ber kurdîtîya wan ku hatîya serê wan a.

Komkujiya helebçê, ji aliyê têgîna pirsgirêka kurd ve dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa mirov çerçoveya têgîna rastîya wê baştir fahm dike. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku komkujiya helebçê, weke rastîyeka vê rastîya bi hêrîşî a li hebûna kurd û civate kurd a. Me li jor bi çend gotinan jî bahse wê kir ku di dema komkujiya helebçê de gelek mêr û jin hatina qatil kirin. Lê bi hezaran keçzaro jî ku piçûk hatina berhev kirin û hatina birina li welatên din ên arab û hwd û li wan hatina firotin. Ev rastî, di vê çerçoveyê de rengê komkujiya helebçê, di çerçoveya têgîna civatî û weke komkujiyaka ku hatî hanîn li serê civatê baştir radixe li berçav. Komkujiyên mazin ku di di wan de bi sed hezaran kurd hatina qatil kirin ên weke komkujiya zilanê, komkujiya dersimê û hwd, ku heta ku dihê û digihijê komkujiya helebçê, wê di vê çerçoveyê de bi vî rengî rewşek were dîtin. Di komkujiya Dersimê de jî, wê jin û mêrên mazin bihatan kuştin û keçzaroyên piçûk wê bên herhevkirin û wê bina birin li bajarên rojava ên tirkiya û bên dayîn windakirin.. Aqûbeta wan keçzaroyên kurd, heta roja me jî nayê zanîn. Her wusa, di vê çerçoveyê de bi heman rengî di komkujiya helebçê de jî hatîya kirin.

Komkujiya helebçê, dema ku mirov li rewş û herêma ku ew di wê de bûya, mirov dikarê bi wê rengê pergalîya herêmî a giştî re jî werêne ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi komkujiya helebçê re û her wusa bi pergalîya giştî a li herêmê ku hatî avakirin re şîroveyna li ser wê re bike. Ev weke aliyekî komkujiyê di çerçoveya têgîna pirsgirêka kurd de werêne ser ziman. Hemû komkujiyên ku dihêna serê civate kurd, divê ku miiov di çerçoveya pirsgirêka kurd a ku hatî afirandin de bixwêne û werêne ser ziman. Weke ancama wê na. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman.

Li vir, weke ku me hinekî li jor jî hanî ser ziman, komkujiya helebçê û pirsgirêka kurd weke du rastîyên ku divê ku mirov wan bi hevdû ve girêdayî werêne ser ziman in. Yek, bêî ya din, rast nayê fahmkirin. Tenê bo fahmkirinaka rast jî bê, divê ku mirov wan bi hevdû re hilde li dest. Li vir, divê ku mirov dûbare vê yekê jî werêne ser ziman ku ji ber ku pirsgirêka kurd heta roja me hatîya dayîn domandin, êdî ew xate komkujiyan di wê de komkuji dibin bi wê re hatîya heta roja me. Piştî komkujiya helebçê re di roja me de di sale 2015´an de em li ser komkujiyên ku hatina serê civate kurd ên weke ´komkujiya şengalê´ û ´komujiya kobanê´ û hwd, bi gelek komkujiyên din ên piçûk û mazin re li ser wan diaxifin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov hemûyan di çerçoveyekê de werêne ser ziman.

Her wusa li vir, divê ku mirov bi têgîn û çerçoveya gotina pirsgirêka kurd de di nava vê çerçoveya xate bi komkujiyê ya pirsgirêka kurd de li rojhilatê kurdistanê bidervekirinên ku rejima îranê dike jî weke serekekî din ê teybet werêne ser ziman. Her wusa, ew jî, di çerçoveya rastîya pirsgirêka kurd de dihên kirin. Çend ku hêncetên weke ”li dijî navê xwûdê rabûya´ ku ji wan bi dervekirinan re dibînin jî, lê ew hêncet, weke ku me li jor bi rengê bi navkirinê re hanî ser ziman, tenê bi armanca ser rastîyê nûxûmandinê dihên kirin. Lingekî din ê di çerçoveya têgîna jenosîda kurd û komkujiya helebçê de divê ku mirov bi wan dervekirinên rejima îranê re werêne ser ziman.

Di dewama wê de divê ku mirov wê de divê ku mirov werêne ser ziman ku kiryarên rejima tirk ên bi qadaxaya li ser zimanê kurdî û ankû tişîkirina zindanan ji kurdan û hwd jî, di vê çerçoveyê de bi wê zihniyetê divê ku mirov werêne ser ziman. Ev kirin û kiryar hemû, wê di çerçoveya hebûna gotina pirsgirêka kurd a ku li herêmê hatî afirandin de wê werina kirin. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Piştî pêvajoyên ´anfalê´ û komkujiyên herêmê, di roja me de di vê çerçoveyê

de em bahse komkujiyên li şengalê û komkujiyên li kobanê û rojavayê kurdistanê dikin. Her wusa, divê çerçoveyê de ev kirin dihên kirin. Hebûna civate kurd, bê statû hatîya hiştin. Bêstatû hiştina wê, di çerçova û bi armanca ji dîrokê birina wê de dihê kirin. Her wusa di vê çerçoveyê de rêbazên ku di çerçoveya vê ji dîrokê birina civate kurd de rêbaza komkujiyê ên weke bi komkujiya zilanê, komkujiya dersimê komkujiya helebçê, komujiya şengalê û komkujiya kobanê û hwd re dihê kirin. Ev rengek û rêbazake ku bi şikandina fizîkî dihê kirin a. Lê bi aliyê din jî, weke ku me li jor hanî er ziman li ser reng û rewşên bişavtinê weke qadaxaya li ser zimanê kurdî ku me li jor bahse wê kir re dihê kirin. Ev jî, her wusa di çerçoveyê de bi hevdû re di ahengekê dihênkirin û bi rê ve birin.

Çerçoveya têgîna komkujiya helebçê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke çerçoveyeka ku di van waran hemûyan de dikarê rêşanîdanakê ji me re bi têgînî bide kirin a. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi pirsgirêka kurd û gotina pirsgirêka kurd re werênina ser ziman. Gotinên rayadarên tirk ên weke T. Ardogan ku dihênin ser ziman ên bi rengê ”pirsgirêka kurd tûna ya” û ankû ”dema ku win ne fikirin wê nebê.” û hwd, weke rengekî zihniyetî ê van komkujiyan jî mirov dikarê werêne ser ziman. Komkujiyên weke komkujiya helebçê û her wusa komkujiyên ku rejima tirk bi fizîkî kirina, dibina weke reng û aliyê fizîkî ên van gotinên weke ên T. Ardogan û hwd jî. Di vê çerçoveyê de jî divê ku mirov werêne ser ziman ku zihniyeta komkujiyê û ankû ya jenosîdê bi van gotinên bi vî rengî re dihê dîtin û hanîn li ser ziman.

Ji xwe komkujiya helebê, û hemû komkujiyên din ên ku hatina hanîn li serê civate kurd, di vê çerçoveyê de bi ziniyetekê hatina hanîn li serê civate kurd.. Î ro, dema ku em li kîjan komkujiyê bihizirin û wê lêbikolîn û hewl bidin ku wê bi zihniyeta ku ew kirîya re ku fahm bikin, emê rastî zihniyetaka bi vî rengî ya ku wê kirîya werin. Her wusa, zihniyeta rejima Saddam di vê çerçoveyê de bû. Lê rejima Saddam, zihniyeta bi gotinên T. Ardogan ên weke bi rengê ”pirsgirêka kurd tûna ya” û ankû ”dema ku win ne fikirin wê nebê.” û hwd, li helebçê bi komkujiyên ku kirina û navê re piretîze kiribû. Misilmanîya T. Ardogan jî, weke Saddam huseyîn ku ppêşî komkuji dikir û piştre diçû bi xwûna kuran dida nivîsandin a. Her wusa di vê çerçoveyê de ti farq di rastîyê de ji hevdû tûna ya.

Li vir, dema ku em rastîya komkujiya helebçê, bi rastîya pirsgirêka kurd re werênina ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de weke komkujiyekeka ku hatî kirin werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de

weke komkujiyeka ku hatî serê civate kurd werênina ser ziman. Di dema ku ev komkuji bû de jî, ketina wê ya rojevê de tenê bi kirinên rejima baasê a Saddam û navaroka komkujiyê re hat ser ziman. Komkujiya helebçê, tenê bi êşa wê re hatîya hanîn li ser ziman. Bi rengekî din ku mirov bibêje hertimî li ser êşa wê re sîyeset hatîya kirin û gotin hatîya gotin. Kêm gotin, di çerçoveya zihniyeta ku di temenê wê kirina wê de di çerçoveya pirsgirêka kurd de ku bi wê re heya hatîya ser ziman. Lê di aslê xwe de aliyê vê komkujiyê ê herî zêde ku mirov divê ku wê werêne ser ziman jî ev a. Ji ber ku ev alî, di temenê hemû komkujiyên berî komkujiyên ku hatina serê civate kurd de bû. Ji ber ku di serdemên berî bûyîna komkujiya helebçê de zêde li ser wê zihniyetê di çerçoveya pirsgirêka kurd û çareserkirina wê de hatîya hanîn li ser ziman, êdî wê zihniyetê xwe domandiya û piştre komkujiyên weke komkujiya helebçê daya kirin. Her wusa heman rengî di hanîna ser ziman a komkujiya helebçê de jî bûya. Tenê hanîna vê komkujiya mazin bi rengê wê yê êşê re û her wusa zêde li ser çerçoveya ziniyeta ku ew kirî bi pirsgirêka kurd re li ser wê ne hatîya sekinin. Ew, zêde ne hatîya ser ziman. Ji xwe ji ber ku ev nebûya, piştî komkujiya helebçê, bi 26 û ankû 27 salan piştre di salên weke 2015´an û hwd de me bahse komkujiyên weke komkujiya şengalê û komujiya kobanê û hwd dikin.

Li vir, di serî de divê ku mirov komkujiya helebçê, ji aliyê zihniyeta ku ew kirî ve mirov divê ku wê werêne ser ziman. Ji ber ku ya ku î ro di roja me de jî pirr giring dibê ev a. Ya ku heta roja me, bi çerçoveya pirsgirêka kurd re heta roja me, ew xate komkujiyê ku li ser serê civate kurd ku daya domandin jî ev a. Ji ber vê yekê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov komkujiya helebçê, bi kirinên wê zihniyetê ên ku di dema komkujiya helebçê de bi komkujiya helebçê re kirîya û piştre jî di xate komkujiyên helebçê de ku ew komkuji dane domandin û hwd, divê ku mirov li ser wan jî bisekinê. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de dema ku em di dewama komkujiya helebçê de komkujiyên ku piştre hatina hanîn li serê civate kurd ên weke komkujiya şengalê û komkujiya kobanê û hwd, divê ku mirov di dewama komkujiya helebçê de hilde li dest û werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bibêje ku pêvajoya komkujiyên helebçê, heta roja me, didomê. Yankû, mirov dikarê bêje ku xwe daya domandin. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov van rastîyan nebînê û neyêne ser ziman, mirov wê nikaribê bibaşî rastîya komkujiya helebçê jî fahm bike û werêne ser ziman.

Di çerçoveya têgîna pirsgirêka kurd de bûyîna komkujiya helebçê, bûya. Piştre jî, dîsa di wê xate de komkujiyên mazin ên li başûrê kurdistanê û şengalê û li rojavayê kurdistanê û kobanê û hwd jî bûna. Di vê çerçoveyê de di xatekê de wê xate komkujiyê li ser serê civate kurd xwe daye domandin. Ew xate komkujiyê, rejimên herêmê ên weke îran û tirkiya û hwd, bi rengên din ên weke wan ku xwediyê pirsgirêka kurd in, ew dana domandin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov rastîyê bi başî di çerçoveya wê ya rast de werêne ser ziman. Divê ku mirov rastîya komkujiya helebçê, bi rastî werêne ser ziman. Komkujiya helebçê, bo kurdan û ji aliyê kurdan ve ku mirov lê binerê, divê ku mirov bi hebûna wan re werêne ser ziman. Lê dema ku em komkujiya helebçê, ji aliyê rejimên herêmê ên weke tirkiya îran, sûrî û îraqê û hwd ve werêne ser ziman, divê ku mirov bi rengê rêxistiniya pergaliya wan û zihniyeta wan ve werêne ser ziman. Weke ancama wê zihniyetê divê ku mirov werêne ser ziman, weke ku çawa ku di roja me de kirinên komkujiyên nû ên weke komkujiya şengalê û komkujiya kobanê û hwd, ancamên wê ên roja me na.

Komkujiya **Helebçe**, bi ser ve ev 27 sal buhûr în. Lê hê jî, ew êşa wê ya ku heya, di dil de, weke duhû jîndî û zîndîya. Hê jî, ku mirov wê bibîr dike, di serî de, eşeke mazin dike dilê mirov de. Komkujiya Helebçê, hê bi êşe xwe ya di dil de û heyîna xwe re hê jîndîya. Di dilê her kurdî, weke êşeke ku dilê mirov diguvêşê ya. Her mirovê ku hinekî di derbarê wê de xwediyê têgihiştin û zanîn bê, wê êşe û elem wê hîs dike ji dil. Çendî ku li ser ve bi dehan sal buhurtina jî, hê weke ku duhû bûya, ew êşe wê di dilê de mirov de bi êş heya û jîndîya. Di serî de, divêt ku ez bibêjim ku Komkujiya helebce bi wê êşe xwe ya ku dide jînkirin û jîndî re hê dijî. Lê ez vê jî bêjim ku ne tenê wê bi wê êşe xwe dijî. Komkujiya Helebçê, ew têgihiştina ku ew komkuji û jenosîd bi kurdan da jînkirin, hê li ser kar a û dijî. Bi vê yekê re, ez bibêjim ku hê di ancama wê têgihiştinê de ji binê ardê hastûyên kurdan ji binê ardê derdikevin û hê kurd tên qatilkirin. Ku hê sê roj mabûn ku em bikevine 2012´an de, komkujiya roboskî hat jînkirin. Ew komkuji, ji aliyê tirkî hatkirin. Tirkî, ew pêk hanî. Kî karê bêje ku têgihiştina ku komkujiya helepbê da kirin û ya ku komkujiya roboskî kir, jev cuda na? Ne ti kesek. Ti kesek jî, nikarê vê yekê bibêje, bi vê yekê re ez bibêjim ku helepçê, hê ew têgihiştina ku helepçê dayiî kirin, hê ew têgihiştin li ser kar a.

Li ser komkujiya Helebçê, nivîsandin, di serî de dilê mirov pirr diêşenê. Ez deme ku vê nivîsînê li ser wê di nivîsênim, wê êşe ji dil hîs

dikim ku dilê min diguvêşê. Bi vê yekê re, ez karim bêjim ku komkujiya helebçê, çendî êşe wê hê bi janî dihê jiyin.

Hêzên ku komkujiya helebçê dana kirin, ez nikarim bêjim ku hemû derketina li holê û hatina kifşkirin. Gelek ji wan hêzên herêmî hê ne hatina derxistin li holê. Bi vê yekê re di serî de, ezê di nivîsa xwe de li ser nasîna komkujiya helebçê û heyîna wan hêzan çend gotinan bibêjim. Komkujiya Helebçê, hê weke komkujiyaka mazin di qada navnetewî de ne hatiya nasîn. Ji ber vê yekê ya ku hê î ro em komkujiyên din ên weke roboskî û hwd dijîn. Bi vê yekê re, ez karim bêjim, ku karê herî zêde dikeve ser milê me kurdan de ku wê komkujiyê ji hemû aliyan ve bênina ser ziman û wê di qada navnetewî de bidina naskirin. Naskirina komkujiya Helebçê di qada navnetewî de ji du aliyan ve pirr giring a. Aliyê pêşî ew a ku wê pêşîya komkujiyên din ên ku kurd dijîn bigirê. Bi vê re, weke aliyê din ê duyemin ku em bênina ser ziman, wê pêşîya komkujiyên bi vî rengî di qandên din ên cihanê de jî bigirê. Komkujiya helebçê, bi çekên kimyewî hat kirin. Bi vê yekê re, di serî de, wê pêşîyê li komkujiyên bi vî rengî ku bi çekên kimyewî bên kirin wê bigirê. Ji van aliyan ve giringiya nasîna wê ya di qada navnetewî de heya. Bi teybetî, ez nikarim bêjim ku hêzên ku komkujiya helepçê kirina hemû jî derketina li holê. Bi teybetî, ji ber çi hê ew derneketina li holê? Hinekî, bi mijara ne çareserkirina pirsgirêka kurd ve girêdayî ya.

Di vir de, ez mijaraka ku berê hê hatibû ser ziman bênima ser ziman. Di deme ku mudahaleya duyemin ya li Îraqê bû, serokkomarê tirk Abdullah Gul ku di wê demê de Wezirtîya karê dervê dikir, got ku "heya jê hebû ku wê komkujiya helebçê bûba" Bi vê re, bi ser gotina xwe ve kir ku berî ku komkuji bibe, li ser hatiya nîqaşkirin di nava wan de. Tirkî jî, di wê demê de, hatiya niqaşkirin ku ew jî li bakûrê kurdistanê tiştna bi heman rengî bike. Li Îranê di wê demê de di çapemeniyê de temenê komkujiyaka bi wî rengî hatibû amedekirin. Humeyni bixwe berî hingî fetwe serê kurdan dabû. Bi vê yekê re, li ser hatibû nîqaşkirin. Lê ka çi bû, tenê Saddam li aliyê komkuji pêk hanî û li aliyê din yê kurdistanê ku weke ku planaka mazin hatibû ya bi wî rengî hatibû amedekirin, ne ket meriyetê de. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku di wê demê de, derketina PKK û şerê wê yê bi tirkî re di serî de pêşî li komkujiyaka bi wî rengî ya bi destê dewletê li bakûrê kurdistanê were kirin hat girtin. Ji ber vê yekê ya ku hertimî tê gotin ku "PKK, weke belaya herî mazin a ya ku derketiya" tê dîtin. Di serî de, tekoşîna azadiyê bi derketina wê re, gelek politikkayên komkujiyê yên dewletê vala derketin.

Di ser komkujiya helebçê re bi dehan sal buhurtin, lê hê ew komkuji di qada navnetewî de ne hatiya naskirin. çendî ku hemû belge û dokumentên wê komkuji di dest de jî hene. Çendî ku bi çê armancê ew komkuji hatiya kirin dihê zanîn jî, lê dîsa naskirina wê, hê ne hatiya kirin. Ku berî komkujiya roboskî ku Tirkî li bakûrê kurdistanê kir ku ew komkujiya helebçê hatiba naskirin, hebû ku emê li ser komkujiya roboskî, şengalê û kobanê ne diaxifin ban. Hebû ku ew êdî nebûba. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku ji ber vê yekê nasîna komkujiya helebçê di qada navnetewî de weke xalaka herî giring ya ku em li ser bisekin a. Di serî de, nasîna komkujiya Helebçê di qada navnetewî de, hî nebe û nebe wê komkujiyên li ser serê kurdan bide kêmkirin. Bi wê re, ez karim bêjim ku nasîna komkujiya helepçê di qada navnetewî de, wê fêde ji demokratizekirina rojhilat û têgihiştina wê re jî wê hebe. Bi vê yekê re, divêt ku mirov wê bi teybetî bêne ser ziman.

Lê bi vir ve girêdayî, ez dixwezim vê jê bêjim. Nasîna komkujiya helebçê di qada navnetewî de weke komkujiya ku bi çekên kimeywî pêkhatiya, wê di serî de, pêşîyê li bikarhanîna çekên kimyewî li dijî xalkan bigirê. Di serî de, wê fêdeyeke wê ya dîrokî di vir de wê hebe. Teknolojî û bioloji hin bi hin pêş dikeve û bandûra wê mazin dibêt. Êdî her welat, sîyeset û dîplomasiya çekên kimyewî dike, bi vê yekê re, wê di demên pêş de jî wê ev çekên kimyewî û bi karhanîna wan bikeve rojava me de. Ji ber vê yekê, di serî de, komkujiyên ku bi wê pêktên nasîna wan, wê weke astangaka dîrokî li pêşîya biharhanîna wan jî bêt. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov li ser komkujiya helebçê ji aliyê çekên ku têde hatina bikarhanîn li ser bisekinê., Bi vê yekê re, ez karim bêjim, weke ku ev mijar wê di demên pêş de hê bêhtirî giringiya xwe bide nîşandin li berçav. Li Kurdistanê, ji ber ku hê komkujiya helebçê di qada navnetewî de ne hatiya nasîn, hê tirkî weke ku li geliyê tiyarê û hwd bê, çekên kimyewî bikar dihêne. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku Li geliyê Tiyarê çekên kimyewî di salên ku buhuri de hat bikarhanîn. Bi vê yekê re ez karim bêjim ku hê ku he komkujiya helebçê di qada navnetewî de ne hatiya nasîn û emê hê pirr nûçeyên bi karhanîna çekên kimyewî weke ku li geliyê Tiyarê bû, em bibihîzîn. Bi kirin û ne nasîna van komkujiyên bi vî rengî re, mirov karê nemirovatiya di siyeset û têgihiştina wê ya di sadsale me de bêne ser ziman.

Li Kurdistanê, di deme ku min ev nivîs di nivîsand de jî, nûçeya ku diket ajansan de ew bû ku firokên şer yên tirkî ji firokgaha li Amedê bilind dibûn û bi ber bakûrê kurdistanê de difirin ku bombabaranê bikin.

Ev mijarê, di aslê xwe de, mijaraka ku mirov divê ku wê bi vê komkujiyê re bêne ser ziman a jî. Ji ber ku ji aliyê têgihiştinê ve, weke ku me li jor hanî ser ziman, digihijina hevdû. Ew têgihiştina ku komkujhiya li helepçê da kirin, di serî de, î ro wan firokan dide rakirin û bombabaranê dide kirin. Heman Zihniyet, î ro zimanê gelê kurd qadaxa kiriya. Minaq, çendî ku tenê li bakûrê kurdistanê ku bin dest û desthilatdariya tirkî de ya, nêzî 25 milyon kurd dijîn. Lê ez divêt ku bibêjim ku heta vê kêlîkê jî, tenê jî, dibistaneka wan jî nîn a ku têde zaroyên xwe perwerde bikin. Ku mirov li zihniyet ku komkujiya helebçê dakirin ku lêbigerihê, divêt ku mirov pêşî li van kirinan binerê û wê zihniyetê nas bike. Komkujiya helebçê, komkujiya wê ji ber çî bû? Ji ber ku ew kurd bûn hatina qatilkirin di wê komkujiyê de. Ma ne ji bo wê zimanî bû ku ew komkuji pêk hat? Em bersiva pirsa xwe bidin bibêjin ku bele ji ber ku wê bû. Vêca, em çawa karin wê qadaxa ya li ser zimanê kurdî ji têgihiştina wê komkujiyê dûr bênina ser ziman. Ji vî aliyê aliyê qadaxaya zimên ve ku mirov li komkujiya helebçê dinerê, mirov rastî têgihiştina û zihniyeta ku ew dakirin têt. Bi vê yekê re, ku mirov li wê qadaxaya li ser zimanê kurdî dinerê, mirov hê bêhtirî giringiya nasîna komkujiya helepçê di qada navnetewî de fahm dike û dibîne. Di serî de, divêt ku ez bibêjim ku ew komkujiya helepçê, bi demê re hê jî, bi qadaxayên zimên bin û bi komkujiyên weke ên roboskî û hwd bin, hê di domê. Ji ber vê yekê, ez nikarim bêjim ku pêvajoya komkujiya helepçê bidawî bûya.

Li Kurdistanê, di roja me de, ku em î ro di sadsale 21´ê de dijîn, hê zimanê wan qadaxa ya û têkoşîna heyîn û hebûna xwe didin. Di vê salê û sadsalê de jî, hê zaroyekî kurd, bi zimanê xwe yê dayikê, perwerde nabînê. Li bakûrê kurdistanê ku tirkî lê serdest û metinger a, li rojhilatê kurdistanê û î ran lê serdest a û li başûr rojavayê kurdistanê ku sûrê lê metinger a, zaroyekî kurd jî bi zimanê xwe nikarê perwerde bibîne. Ti mafê wan yê mirovî nîn a. Ev rewş, tenê bi serê xwe jî, nîşanak û birhana berdema pêvajoya komkujiya helepçê ya. Bi vê yekê re, ku em î ro di 2012´an de jîn, di vê salê de jî, ez karim bi awayekî bi êmin bibêjim ku pêvajoya komkujiya helebçê hê bi dawî nebûya û ji aliyê tirkî, îran û Sûrî ve tê domandin. Hê ew komkuji, bi şeklê çandî, kulturî û hwd, bi awayekî din ên civatî dihê domandin. Komkujiya çandî, hizirî û civatî, bi vê yekê re di vê demê û rojê de ez karim bêjim ku hê didomê.

Ku komkujiya helebçê didomê, li ber wê kurd divêt ku çî bikin? Di serî de sê tişt dikevina ser milê wan de. Di serî de ew çand û kultura ku di bin komkujiyê de ya lê were xwedî derketin ew were parastin. Kurd, di

serî de, divêt ku bi teybetî li zimanê xwe xwedî derkevin. Divêt ku yekbûnê di nava xwe de çê bikin. yekbûna di nava wan de, lêbelê û lêbelê karê pêşî li komkujiyên din ên weke yên helepçê û roboskî bêne. Bi vê yekê re, ez bibêjim ku karê pêşî dikeve ser milê kurdan de. Divê ku yekebûna xwe di nava xwe de çêbikin û ji bo ku komkujiyên din ên weke yên komkujiya helebçê û ya roboskî, yên piştî wan ên weke komkujiya şengalê û komkujiya kobanê bi gelek komkujiyên din re carek din nejîn û dawî li komkujiyên li ser serê wan were, divêt ku hewldanaka mazin ya naskirina komkujiya helebçê di qada navnetewî de bi dîroka komkujiyên ku hatina serê civate kurd re ku were nasîn bidina nîşandin. Divêt ku di serî de, li ser van komkujiyan bisekin in. Komkujiya helebçê, di qada navnetewî de naskirina wê, wê bi xwe re sê tiştan bi teybetî ji bo kurdan kurdan bêne. Wê pêvajoya komkujiyên li ser serê wan bide sekinandin. Wê aşîtîya nava wan de bixwe re bêne û pêşketina wan bide domandin. Wê li herêmê jî, bibe temenê aramiya nava gelan.  Bi vê yekê re, di serî de, divêt ku li ser komkujiya helebçê were sekinandin.

16´ê adara 2015/, Cizîra bota, Kurdistan, Abdusamet Yîgît

,